

**BİNGÖL** ISSN: 2147-5679  
**ÜNİVERSİTESİ** 2020/2  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**DERGİSİ** Yıl/Year: 6 Cilt/Volume: 6 Sayı/Issue: 12







**BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ**

Yıl/Year: **6** Cilt/Volume: **6** Sayı/Issue: **12**

**2020/2**

ISSN: 2147-5679

BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

BİNGÖL 2020

*BİNGÖL ÜNİVERSİTESİ YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ DERGİSİ*

**Yıl/Year:6 Cilt/Volume:6 Sayı/Issue:12**

**ISSN:** 2147-5679

**Sahibi / Owner**

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Adına  
Doç. Dr. Abdulnasır SÜT

**Editörler / Editors**

Öğr. Gör. Murat VAROL  
Öğr. Gör. Şerif GÜZEL

**Dergi Sekreteryası ve İletişim /**

**Secretary of Journal and Communication:**

Enstitü Sekreteri Sadrettin BEKİ

**Dergi Tasarım ve Uygulama / Magazine Design**

Şemal Medya Tasarım Ofisi

**Dergi Yazışma Adresi / Correspondence Address**

Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Müdürlüğü, 12100-Bingöl

**Telefon:** 0426 216 00 42

**Faks:** 0426 216 00 42

**Enstitü e-posta:** yasayandillerenst@bingol.edu.tr

**Dergi e-posta:** bingolyasayandiller@gmail.com

**Basım Yeri / Place of Publication**

Enes Basın Yayın Matbaacılık Ltd. Şti.

Maltepe Mah. Litros Yolu Sok.

Fatih Sanayi Sitesi, No: 12/210,

Zeytinburnu/İstanbul

Tel: 0 212 501 47 63

## **Yayın Kurulu ve Danışma Kurulu Editorial Board and Advisory Board**

Prof. Dr. Abdulaziz BEKİ  
Prof. Dr. Abdulaziz HATİP  
Prof. Dr. Abdullah KIRAN  
Prof. Dr. Abdullah ÖNALAN  
Prof. Dr. Edip ÇAĞMAR  
Prof. Dr. Hasan ÇİÇEK  
Prof. Dr. Hasan ÇİFTÇİ  
Prof. Dr. Hasan TANRIVERDİ  
Prof. Dr. Mehmet BARCA  
Prof. Dr. Mehmet Mahfuz SÖYLEMEZ  
Prof. Dr. Mustafa AGÂH  
Prof. Dr. Nesim DORU  
Prof. Dr. Nusrettin BOLELLİ  
Prof. Dr. Orhan BAŞARAN  
Doç. Dr. Abdulcebbar KAVAK  
Doç. Dr. Abdurrahim ALKIŞ  
Doç. Dr. Abdülhadi TİMURTAŞ  
Doç. Dr. Ercan ÇAĞLAYAN  
Doç. Dr. Hayrettin KIZIL  
Doç. Dr. İbrahim USTA  
Doç. Dr. Mehmet BİLEN  
Doç. Dr. Metin YİĞİT  
Doç. Dr. Mustafa ÖZTÜRK  
Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN  
Doç. Dr. Vecihi SÖNMEZ  
Dr. Öğr. Üyesi Ahmet KAYINTU  
Dr. Öğr. Üyesi Ayhan TEK  
Dr. Öğr. Üyesi Bedrettin BASUĞUY  
Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ  
Dr. Öğr. Üyesi Hemin OMAR AHMAD  
Dr. Öğr. Üyesi Mehmet YAZICI  
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa ASLAN  
Dr. Öğr. Üyesi Mustafa GÜNERİGÖK  
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDOĞDU  
Assist. Prof. Dr. Yadgar Rasool

- Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi yılda 2 kez yayımlanan, ulusal hakemli bilimsel bir dergidir.
- Yayımlanan yazıların her türlü hukukî ve bilimsel sorumluluğu yazarlarına aittir.
- Derginin her hakkı saklıdır. Dergide yayımlanan yazılar kaynak gösterilmeksizin kullanılamaz.

## **Bu Sayının Hakemleri**

Doç. Dr. Hayreddin KIZIL - Dicle Üniversitesi

Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN - Bingöl Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi Hemin Omar AHMAD - Bingöl Üniversitesi

Dr. Öğr. Üyesi İlyas ARSLAN – Munzur Üniversitesi

Dr. Öğ. Üyesi İsmail SÖYLEMEZ - İnönü Üniversitesi

Öğr. Gör. Ayetullah KARABEYESER – Bingöl Üniversitesi

Öğr. Gör. Mehmet ASLANOĞULLARI - Bingöl Üniversitesi

Arş. Gör. İlyas SAYIM - Muş Alparslan Üniversitesi

Lecturer Farhad Azeez Hassan-Selahaddin Üniversitesi

Dr. Naz Ehmed Saeed

Nurettin ERTEKİN

# İÇİNDEKİLER



**Editörden.....** 07

**Zazaki dı Bestoği Sadeyi**

Ayetullah KARABEYSER İsmail SÖYLEMEZ.....09-23

شيعر و رۆژنامه گهری، به نمونهی شيعره کانی (هيمن موکريانی ۱۹۸۶ - ۱۹۲۱ز)

بارزان کانبی طاهر .....25-58

**Hetê Şıkl, Muhtewa u Huneranê Edebiyan ra**

**Tehlilê Mewlidi Nebi Ê Mala Abdulqadırê Muşeki**

Mehmet ARSLAN ..... 59-74

**Metn û Danasîna Fiqhnameya Heyderî**

Muhammed İkbal DENİZ..... 75-99



## EDİTÖRDEN...



### Değerli Okurlarımız!

12. sayısıyla dergimiz değerli ve farklı çalışmalarıyla yayın sürecine bir yenisini daha eklemiştir.

**Ayetullah KARABEYESER** ve **İsmail SÖYLEMEZ**'in, *Zazaki dı Bestođi Sadeyi* adlı çalışmasında, Zazaca'daki 48 basit bağlaç ele almakta ve bu bağlaçlar; anlam, görev ve köken bakımından incelenmektedir.

### **Barzan Kanabi TAHİR**

هینمن موکریانی (شاعر هکانی بهنمونهی رۆژنامهگهریی و شاعر ز 1921- 1986) (Şiir ve Gazetecilik «Hemin Mukrîyani'nin şiir örneđiyle 1921- 1986») adlı çalışmasında şair Murîyanî'nin söz konusu dönemlerde çıkan gazetelerde yazdığı şiirlerini gün yüzüne çıkarmakta ve bunlardan 16 tanesinin daha önce hiçbir yerde yayınlanmadığını ve divanında yer alan şiirlerinden farklı olduğunu ifade etmektedir; aynı zamanda Kürt edebiyatı ve gazeteciliđi arasındaki iliřkiyi de irdelemeye çalışmıřtır.

**Mehmet ARSLAN** tarafından hazırlanan, *Hetê Şıkıl, Muhtewa u Huneranê Edebiyan ra Tehlilê Mewlidi Nebi ê Mala Abdülqadirê Muşeki* adlı çalışmada ise; Molla Abdulkadir Muşeki'nin Zazaca yazdığı *Mewlidê Nebi* isimli eser řekil, muhteva ve edebî sanatlar bakımından ele alınmaktadır.

**Muhammed İkbal DENİZ** ise, *Metn û Danasîna Fiqihnameya Heyderî* adlı çalışmada Şêx Muhemed Heyderî'nin *Fiqihname* adlı eserini ilk defa latinize ederek; dil, üslub ve içerik hakkında önemli bilgiler aktarmaktadır. Ayrıca hem yazar hakkında hem de çalışmaları hakkında kısa ve öz bilgileri de bu çalışmasında bulmak mümkündür.

Bir sonraki sayıda buluşmak dileđiyle...



# ZAZAKİ Dİ BESTOĞI SADEYİ<sup>1</sup>

## Zazaca'da Basit Bağlaçlar

Ayetullah KARABEYSER<sup>2</sup> İsmail SÖYLEMEZ<sup>3</sup>

### XULASA

Bestoği, qısımanê muhimanê zıwani ra yi. Bestoği xuser wayirê yo mena niyi. Labelê zerreyê cumle dı menaya cumle ser tesirê cê esto. Bestoği, kelimeyan, grubanê kelimeyan ge ge zi cumleyan yobinan a gırdani. Ina xebat dı Zazaki dı bestoği sadeyi hetê şekil, mena, wezife u kok ra kritik biyi. Bestoği, eseranê Zazaki ra ameyi guretiş; cumleya ki bestoğ tede viyerto a cumle bı şeklê misal xebat dı ca gureto. Xebat dı teyna eseranê yo mıntıqa ra nê, eseranê heme mıntıqayan ra bestoği ameyi guretiş. Heta mumkun bo ca diyayo varyantanê bestoğan zi.

**Kelimeyi Muhimi:** Bestoğ, Bestoço Sade, Gramer, Zazaki.

### ÖZET

Bağlaçlar, dilim önemli unsurlarındandır. Tek başına anlamı olmayan bağlaçlar, cümle içerisinde anlam ilgisi kurarak kelimeleri, kelime gruplarını, cümleleri birbirine bağlarlar. Bu çalışmada Zazaca'daki basit bağlaçlar incelenmiştir. Tespit edilen basit bağlaçlar yapı, anlam, görev ve köken açısından değerlendirilmiştir. Çalışmaya kaynaklık eden eserler Zazaca'nın konuşulduğu her bölgeden alınmıştır. Bu şekilde bağlaçların varyantlarına da çalışmada yer verilmiştir. Açıklayıcı olması açısından bağlaçlar, içinde geçtiği cümle ile birlikte çalışmada yer almıştır.

**Anahtar Sözcükler:** Bağlaç, Basit Bağlaç, Dilbilgisi, Zazaca.

- 1 Ina maqale tezê doktorayo ki bı nameyê “Zazaki dı Bestoği” ameyo hadrekerdiş ra geriyaya.
- 2 Talebeyê doktora ê Qısımê Zıwan u Edebiyatê Zazaki ê Enstituya Zıwananê Ganiyan ê Üniversiteya Bingoli, karabeyeser@gmail.com
- 3 Dr. Öğr. Üyesi, İnönü Üniversitesi Yabancı Diller Yüksekokulu, soylemezismail@hotmail.com

## ABSTRACT

Conjunctions are one of the important factors of language. The conjunctions which do not have a meaning by themselves combine the sentences, words and word groups to each other by establishing meaning relation in a sentence. In this work, simple conjunctions in Zazaki are examined. The detected conjunctions are evaluated in terms of struction, meaning, body and origin. Works that are the source of the study are taken from every region where Zazaki is spoken. In this way, variants of conjunctions are also included in the study. For explanatory purposes, conjunctions are included in the study together with the sentence in which it is included.

**Key words:** Conjunction, Simple Conjunction, Grammar, Zazaki.

## DESTPÊKERDIŞ

Melzemeyê zıwani kelime yi. Kelimeyi yeni tihet u cumle ani meydan, cumle zi menayêka tamam ifade kena. Ini kelimeyi ki cumle dı yeni tihet u yo mena ifade keni zi çend qısım i. Her qısmê ini kelimeyan wezifeyêk ano ca. Yani her kelime semedê caardışê wezifeyêk cumle dı ca gena. Ini kelimeyan ra yo zi bestoğ o. Yo cumle dı bê bestoğ dı hebi menayi niyeni ifadekerdiş. Ancax pê yo bestoğ dı menayi tidir ifade beni. Inay ra bestoği qey yo zıwani zaf muhim i.

Bestoği zê mecuni, zê xerci, kelimeyan, grubanê kelimeyan ya zi cumleyan besteni yobinan a. Ca ca qey riyezkerdişi, ca ca qey qiyasi, ca ca qey ifadekerdişê tezadi ca ca dı zi qey zıxmkerdişê ifadeyi şıxuliyeni. Bestoği dor dor nameyan, dor dor fiilan dor dor zi cumleyan besteni yobinan a. *Qısekên kı naman, kerdenan ew qıserêzanê zew wecife dı biyayen girêdanê pê, nê qısekan rê vanê girêdari* (Pamukçu, 2001:182). *Kelimeyi ki cumleyan, kelimeyan ya zi grubanê kelimeyanê ki hetê mena ra bınatayê inan dı alaqa esto besteni yobinan a pê nameyê bestoğ name beni* (Turgut, 2009:190). *Zerreyê yo cumle dı ya zi bınatayê cumleyan dı, yobinan a bestıyayışê dı ya zi dı ra zıdyeri hukuman pê bestoğan mumkun o. Wezifeyê bestoğan, kelimeyan, grubanê kelimeyan ya zi cumleyan yobinan a bestayışo* (Çiftçi, 2013: 195). *Cumleyi ki pê bestoğan yobinan a yeni bestış zi beni cumleyi beste yi. Cumleyi ki tede dı hebi ya zi dı heban ra ziyed hukumi esti u pê bestoğan bestiyeni yobinan a ini cumleyi pê nameyê cumleyi besteyi name beni* (Banguoğlu, 1990:554). *Bestoği hetê mena ra eşkeni hem weziyetanê musbetan yobinan a gırıbdı hem weziyetanê menfiyan. Elbet teyna weziyeti ya zi hukumi musbeti u menfiyi nêbestiyeni yobinan a. Zerreyê yo cumle dı weziyeti zıdı zi pê bestoğan bestiyeni yobinan a. Bestoği, kelimeyi wayirê mena nê, kelimeyi wayirê wezifeyi hesıbiyeni. Kelimeyi ki bestoği, xuser wayirê mena niyi. Ini kelimeyi, kelimeyi “bımena” nê, kelimeyi “buwezife”yi* (Korkmaz, 2017: 925).

Ina xebata dı Zazaki dı *Bestoği Sadeyi* kritik biyi. *Bestoği sadeyi yo parçe ra yeni meydan, hını parçekerdişê ni bestoğan mumkun niyo* (Şahinoğlu, 1997: 337).

Bestoği sadeyi, hetê şekil, mena, wezife u kok ra tetqiq biyi. Zazaki dı mewzuyê bestoğan ser heta eyro yo xebata hira nibiya. Ina xebat dı *bestoği sadeyi* bı teferuat kritik biyi.

Hedefê ina xebat heta mumkun bo piserontışê bestoğanê Zazaki yo. Bestoği, kıtabanê Zazaki ra arıdıyayı u cumleya ki bestoği tede viyereni bı a cumle neqilê xebat biyi. Kitabı ki ina xebat dı tera istifade biyo her mıntıqayo ki tede Zazaki qısey bena ê mıntıqayan hemın ra ameyi vicinayış. İni kitabı, zê mewlid u diwan eseranê klasikan ra, zê mesela, vıstonik u fabl kıtabanê folklori ra u zê roman u hikayeyan eseranê modernan ra ameyi meydan.

Zazaki dı çend varyanti alfabeya Latin şıxuliyeni. Heto bin ra kelimeyi zi zêpi nênusiyeni; mıntıqa ra mıntıqa, şarıstan ra şarıstan, zerreyê yo şarıstan dı qeza ra qeza nuştışê kelimeyan bedliyeno. Heto bin ra yo standardê nuştoğan zi çin o. Ge ge eyni nuştog eyni eser dı yo kelime bı şeklanê ciyayan şıxulneno. Ina xebat dı hem hetê alfabe ra hem zi hetê nuştışê kelimeyan ra mudaxeleyê nuştışı nibiyo u cumleyi ki eseran ra ameyi guretiş eser dı seni ca gureto bı o şekil ina xebat dı nusiyayı.

## BESTOĞI SADEYI

Ina xebat dı têna *bestoği sadeyi* ca geni. Semedê ina xebat Zazaki dı çoras u heşt hebi *bestoği sadeyi* tesbit biyi. İni bestoği yo bı yo hetê şekli, mena, wezife u koki ra kritik biyi u bı sistemo alfabetik ameyi rıyezkerdiş. Ewlı terifê bestoği dıyayo, dıma menaya bestoği nusiyaya u ay ra pey cayê şıxulyayışi nusiyayo. Heto bin ra kokê bestoğan zi tesbit biyo.

**1. Ancax:** In bestoğ ciya ciya menayan dı şıxuliyeno. Ca ca menaya eşkayışi u qewet peraresnayışı dı ca ca menaya ciyakerdişi dı şıxuliyeno. Bestoğê *ancaxi* bınatayê cumleyan dı yeno şıxulnayış. Bestoğê *ancaxi*, hetê koki ra Tırki yo (TDK, 2005: 97).

**Ancax:** Kam kî nê pancî biyaro rind bi ca / Mehşerê Kubra dı **ancax** o bî şa (Babij, 2018: 199).

**2. Ancı:** Bestoğê *ancı* qey ifadeyanê zıddan ya zi cumleyanê zıddan yobinana bestayış şıxuliyeno. Beno ki tezaad hetê şekli ra nê hetê mena ra bo zi. In bestoğ bınatayê cumleyan dı ca geno u zê *huncê*, *onciya*, *unca* çend şekılan dı şıxuliyeno. Bestoğê *ancı* Zazaki yo.

**Ancı:** Ez canê xo ra vıyarena **ancı** rindeka xo ra nêvıyarena. (Tekin, 2013: 73).

**Huncê:**...pa o lete wa howt nûn û yo letê nûn îz ser wena **huncê** mird nîbena. (Bor, 2015:39-40).

**Oncia:** Bao, ez mironı, **oncia** lacê Cüyidi nêgênı, vana. (Aslan, 2011: 196).

**Unca:** Tenê fekê vae ra bota şı, **unca** cera ra peyser ame verê çeveri; vae ser ro vînet. (Mirza, 2020: 46).

**3. Axiri:** In bestoğ xebera qediyayişê yo gureyi dano. Zazaki dı ca ra ca bı bedilyayişanê qıckekan yeno şıxulnayiş. Binateyê cumleyan dı şıxuliyeno u zê *axiri*, *axır*, *axirê* varyanti cê estî. Kelimeya *axiri* Erebkî ra yena (أخري) (Mutçalı, 1995: 8).

**Axiri:** Dı hirê rey nusnê, texeliya. **Axiri** zerriya xo ra çitur ke verêno ra hêni nusnê (Çiya, 2020: 108).

**Axır:** Ey va qey ti bı yewna ziwan qısey kenî. **Axır** to na rey reqemî tek bı tek vatî û pê dayî nuştene. (Lezgîn, 2015: 20).

**Axirê:** Kitabî wendêne qısey kerdêne, hevalanê xo ra çiyê musayêne qısey kerdênê. **Axirê** aşman ra tepîya keye de her kes teslîmê Aynure bîbî. (Aldatmaz, 2016: 155).

**4. Bacê:** Ino bestoğ, dı cumleyi ki binateyê cê dı mınasebetê wexti esto besteno yobinan a. Gureyê diyın, gureyê verini ra pey yeno kerdış. Bestoğ binateyê cumleyan dı yeno şıxulnayiş. Zazaki dı çend varyanti inî bestoği est i. Kelimeya *bacê*, zıwanê Erebkî ra kelimeya (باعد) ra yena (Mutçalı, 1995: 62).

**Bacê:** Hivîya yî qewmê xu ra nîbirya / **Bacê** wuştwu koti wazîfa dima (Çolig, 2012: 11).

**Badîne:** Ez çowras rûêj xwu itya d' biqedîn **badîne** ez vêjîyen şın cayna ûnîyen yo cay rakowtîş (Bor, 2015: 113).

**Bahdo:** Çend kesî kewtbin dînî u bîbin muslîmanî / **Bahdo** Ellay emir da, Ey îlan kerd cîhanî (Babij, 2009: 17).

**Bandini:** Tı ewlî şo **bandini** ez şona. (Kaymak, 2016: 17).

**5. Beno:** In bestoğ weziyetê ixtimalî dı şıxuliyeno u menaya ixtimalî ifade kenê. Bestoğê *beno* binateyê cumleyan dı şıxuliyeno. Ino bestoğ Zazaki yo.

**Beno:** Ma şı bigêr **beno** ma raşt heywonêk bê u ma xu ri bıwer. (Akban, 2020: 28).

**6. Cey:** Bestoğê *cey* qey ifade kerdışê menaya tezadî yeno şıxulnayiş u binateyê dı cumleyan dı ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Cey:** Şîr veynî **cey** mi şîma depîştî. (Yazar, 2018: 26).

**7. Coka:** In bestoğ cumleyan hetê sebeb u netice ra besteno yobinan a. Eğleb cumleya verin sebebê cumleya diyın a. Çend varyanti cê estî. Binateyê cumleyan dı ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Coka:** Mi ju hewnêde xirabin dî **coka** ez nîya bîya nerehet. (A. A. Çiçek, 2014: 30).

**Cokana:** Fikrê ey de mumkin nîyo ke amike karode rind bikero. Se kena bikero êy çim de tim xirab o. **Cokana** radyo de kî rike de bî. (Karakaş, 2016: 24).

**Cokao:** Pilu temey kerd vi, ey ra vat vi: “Nune to dima nina, tı nuna xo dima so!” **Cokao** nuna xo dima nata bota vostenê. (Mirza, 2020: 18).

**Cûka:** La emsarr gurey gureyinî ameybî Hesên Axay serî ser di, **cûka** nîşabi ebi zerri ba xo tetun bierîno. (Espar, 2004: 9).

**8. Çaxo:** In bestoğ wexti ifade keno. *Çağo* verniya dı cumleyan dı yeno şıxulnayış u cumleyi ki dima yeni inan hetê wexti ra besteno yobinan a. Sareyê cumleya verin dı yeno şıxulnayış. In bestoğ Tırki ra yeno. (TDK, 2005: 380)

**Çaxo: Çaxo** dara xurma rona ê nebî / Dest di xurmey da û her kes meywe dî (Babij, 2018: 192).

**9. Çend:** In bestoğ hem miqdar ifade keno hem zi semedê qiyasi yeno şıxulnayış. Hem sareyê cumleyan dı yeno şıxulnayış hem miyanê cumleya verin dı şıxulnayışê cê mumkun o. In bestoğ Zazaki yo.

**Çend: Çend** ti Koyê Hesarî ra nêzdî benî, qiyame hîna beno xidar û tîk (Bor, 2014: 44).

**10. Çun:** In bestoğ, qey izahi şıxulyeno. Sebebê hukumê cumleya verin cumleya diyın dı izah beno u her dı cumleyi pê bestoğê *çuni* yobinan a girıdiyeni. In bestoğ Farıski yo (چون) (Kanar, 2008: 557).

**Çun: Çun** tamam bî mu’cizatê ê nebî / Qal keran mî’racê ci to rê, se bî (Babij, 2018: 192).

**11. Dê:** In bestoğ eğleb qey izah u sebebê gureyi şıxuliyeno. Bestoğê *dê* miyancıya cumleyan dı şıxuliyeno. In bestoğ Zazaki yo.

**Dê:** Xûnimê axayî nimitkî ra qerwaşe teqîb kena **dê** a kincûn senî şuwena (Bor, 2015: 17).

**12. Derê:** In bestoğ eğleb qey izah u sebebê gureyi şıxuliyeno. Bestoğê *derê* miyancıya cumleyan dı şıxuliyeno. *Zê derê*, *diray* varyanti cê estî. In bestoğ Zazaki yo.

**Derê:** Sareyê xu kena berz vona **derê** ez bîni in çitayo? (Akban, 2020: 17).

**Diray:** Ez hey şîyero **diray** aya mêşnaya lengi ha awca da se ez yê deko bewlê mêşnûn mîyûn xû ya bero dewî. (Mîrvanî, 2012: 93).

**13. Eger:** In bestoğ, bestoğê şerti yo. Gureyê diyın bî şertê biyayışê gureyê verini yeno meydan. Cumleya verin şertê cumleyanê binan a u pê bestoğê *eger*

bestiyena cumleyanê binan a. Bestoğê *egeri* sareyê cumleyan dı yeno şıxulnayış. Zê *eger*, *egi*, *eg*, *ek*, *eka*, *eke* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Eger:** Se'îd kerda to ez ezel di **eger** / Ti vêşî biki ay, se'îdey meber (Ensarî, 2018: 122).

**Egi:** Ti îr çowras rûej musaedi, **egi** ti zerê in çowras rûejî d' nimûsê awk vûna se ez sarê ti dûn tirakerdîş (Bor, 2013: 88).

**Eg:** Eg qissê yî vila bibu dor o ver / Ma nêşkenî kîyonî xu ra bitever (Çolig, 2012: 12).

**Eka:** Ez hetûn vêşûnê ver di mereno ez xû rî şîyero hewnê paşay mana bi-derdo, **eka** mi zûna ez xû rî dades hebûn zernûnê xû gîyeno, **eka** mi nêzûna ez paşay rî dades serrî xizimkarî ra zî razî beno. (Mîrvanî, 2012: 43-44).

**Eke:** **Eke** esparî ameyî mîyanê şaristanî xo çarna banê adlîye. (Demîrel, 2014: 42).

Varyanti bestoğê *egeri* dordor menaya nışka ra pê hêsiyayişi u diyayişi ifade keni u in hal dı binateyê cumleyan dı ca geni.

**Eg:** Oniyeno lu ra **eg** lu ha yi ra wet kışta koti ya. (Akban, 2020: 27).

**Egi:** Gulalxatûn ûnîyena ci, **egi** yo bûeça barçîyeka qijkalek ha merrî ya (Bor, 2013: 20).

**Ek:** Yî sêr qazîk hawa nûn **ek** wayêr xûnî ha zerey qazîk id merde w. (Sîmserkîsij, 2018: 58).

**Eke:** Unîyeno ci **eke** di merdimi qaxitûn nusênî u erzên zerê awê ruêyî (Bor, 2015: 92).

Varyanti bestoğê *egeri* dordor zi qey ifadekerdîşê menaya wexti şıxulyeni u in hal dı zi sareyê cumleyan dı şıxulyeni.

**Eke:** **Eke** luye bêdoçik manena cêrena ra pîre ver vana. (Ballikaya, 2010: 121).

Varyanti bestoğê *egeri* dordoran zi qey ifade kerdîşê menaya qediyayişê gu-reyi şıxulyeni.

**Eke:** Şayîder xo dano we, beno şand **eke** se keno kuno zerê çeyî xo dano we, pîre kar-marê xo dana arê, şamya xo wena kuna ra. (Ballikaya, 2014: 99).

**14. Ega:** Bestoğê *ega* qey ifadekerdîşê menaya waştîşi yeno şıxulnayış u binateyê dı cumleyan dı ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Ega:** ...mi ci rê yo xalî viraştîn **ega** wu cemat id rakir û hewna wedar xwu çeng fîn (Bor, 2013: 28).

**15. Feqet:** Bestoğê *feqeti* binateyê dı cumleyan dı yeno şıxulnayış u menaya ciya kerdîşi, ilave kerdîşi ifade keno. Dordor zi menaya tezadi ifade keno. In bestoğ Erebiyo (مفقط) (Mutçalı, 1995: 669).

**Feqet:** Homay mubdîe pêro fi'landê ma / **Feqet** cuzî îxtiyarey da destê ma (Ensarî, 2018: 78).

**16. Ger:** In bestoğ, bestoğê şerti yo. Gureyê dıyın bı şertê biyayişê gureyê verini yeno meydan. Cumleya verin şertê cumleyanê binan a u pê bestoğê *ger* bestiyena cumleyanê binan a. Bestoğê *ger* sareyê cumleyan dı yeno şıxulnayış. In bestoğ Fariski yo (جر) (Kanar, 2008: 1124).

**Ger: Ger** pey malo helal hajê xu kerdo / Cenetê ala de yê rê ca ferd o (Kavari, 2004: 55).

**17. Ğeyri:** Bestoğê *ğeyri* menaya istisnayı ifade keno u binateyê dı cumleyan dı yeno şıxulnayış. Zazaki dı zê *ğeyri*, *ğêr* varyanti cê esti. In bestoğ Ereški yo (غیر) (Mutçalı, 1995: 640).

**Ğeyri:** Allê emır kerd meleku secde berd / **Ğeyri** İblisi le'ini wı teyna mend (Muşeki, 2020: 24).

**Ğêr:** Allah bes **ğêr** yi ebes qê İslumu / Zerrê şuma wa bivêş qê mezlumu (Narin, 2018: 14).

**18. Ha:** In bestoğ, bı şekilo sade peyniya cumleyan dı yeno şıxulnayış u wext filê cumle tekrar bı, binateyê filê tekrarbiyaye dı şıxuliyeno u ın qeyde menaya fiili şedineno. In bestoğ Zazaki yo.

**Ha:** Tamê xo zaf weş bî. Nîya ma werd **ha** werd. (Karakaş, 2016: 21).

**19. Hasilî:** In bestoğ binateyê cumleyan dı yeno şıxulnayış. Qey eşkerakerdış u zelalkerdışê menaya cumleya verin şıxulyeno. In bestoğ Ereški yo (حاصل) (Mutçalı, 1995: 174).

**Hasilî: Hasilî** qet nêni vatış wesfê yê / Ma bi fek tarif biker hem medhê yê (Xasi, 2008: 25).

**20. Hema:** Bestoğê *hema* zafı ra ifadeyanê zıddan, mutenaqızan besteno yobinan a. Bestoğê *hema* binateyê dı cumleyanê xuseran dı ca geno. İni her dı cumleyi zi hem hetê mena ra hem hetê vıraştışi ra cumleyi tamam i. Labelê ge ge cumleya dıyın yani cumleya ki *hema* ra pey yena bı şıklê cumleya kêmbiyayı zi şıxuliyena. İni her dı cumleyan ra yo cumle musbet bena yo zi menfi bena. Yani cumleya ki *hema* tede ameya şıxulnayış mıheqeq tede menfite esta. İcab nikeno ına menfite timotım hetê şekılı ra bo yani wesıla menfite bıgero. Ge ge zi cumle teyna hetê mena ra menfi ya. Zeg misalanê cêrinan ra zi fam beno bestoğê *hema* ifadeyan u cumleyan hetê ixtilafê mena ra, hetê sebeb u netice ra, hetê serkerdışê çiyêkê neweyi ra besteno yobinan a. Bestoğê *hema* hetê koki ra Ereški yo ( ) (ل) Mutçalı .(24 :1995, Zê *hema*, *hama*, *ama* varyanti cê esti.

**Hema:** Way tayi fom nikenana **hema** pizeyê cı ruej bı ruej beno gırd. (Akbarina, 2020: 46).

**Hama:** Dêrdê Bertali ki kitabî bi. **Hama** na suka peyniya dina de kam kitab waneno ke. (Çiya, 2020: 46).

Bestoğê *hema* cumleyi ki binateyê inan dî ca gureto ê her dî cumleyan hetê irtibatê sebeb u netice ra besteno yobinan a. Her dî cumleyi ki verni u peyniya inan dî ca geni, inan ra yo sebeb, a bin zi netice ifade kena. Cayê sebeb u netice zi bediliyeno u timotim zê pi niyo. Ge ge cumleya sebebî ewli yena ge ge zi cumleya netice ewli yena.

**Ama:** Ez pire xo rê themburê viraconî, **ama** dara kî ez gêronî cî, nêvênî. (Aslan, 2011: 189).

**Hema: Hema** papazi marê înyûn nibirno wîjdanê mîyerîk mîyerîkî rahat niverden (Bor, 2015: 109).

**21. Hela:** Bestoğê *hela* qey ifade kerdışê menaya peyniya gureyi yeno şixulnayiş. Bestoğê *hela* binateyê dî cumleyan dî ca geno. *Zê hela, hera* varyanti cê estî. Ino bestoğ, Tırki ra ameyo guretiş (TDK, 2005: 875).

**Hela:** Ma yin itiya dî verd u bionî **hela** bîra ho çî hal dî yo? (Akbanî, 2020: 51).

**Hera: Hera** şo zere xu derg kî ma veynî senevayo. (Kaymak, 2016: 17).

**22. Hem:** Bestoğê *hem* qey ifadekerdişê menaya ilavekerdişî u ziyednayişî yeno şixulnayiş u binateyê cumleyan dî ca geno. *Zazakî dî zê hem, hum* varyanti cê estî. In bestoğ *Zazakî* yo.

**Hem:** Ma tesdiq kên la ilahe illallah / **Hem** qebul kên Muhemmed Resullullah (Narin, 2018: 8).

**Him:** We **him** mumîn û mumînata hemîn / Bidi xatirê ay hebîbdê xu hemîn (Ensarî, 2018: 68).

**23. Heta:** Bestoğê *heta* qey ifadekerdişê menaya wexti yeno şixulnayiş. Ca ca viyertişê wextî, viyertişê gureyi, erey mendîşî ifade keno, labelê ca ca zi wexti ser piresayiş ya zi weriameyişê dî ya zi dî ra ziyed gureyan ifade keno. Bestoğê *heta* sare u binateyê cumleyan dî yeno şixulnayiş. *Zazakî dî zê heta, heyân, heyon, hatan, heton, hetonî, hetanî hetta, hetûn, heyâ, heyonî* varyanti mî bestoğî estî. In bestoğ *Erebki* yo (حنى) (Mutçalî, 1995: 147).

**Heta:** Ez şîbîya hewn a, **heta** ez wišta we ez hanyawa hanî yo joy enî cay kerdê pak û şamê ma zî virašta. (Licokic, 2007: 75).

**Hatan:** Wile ti **hatan** çenanê axayî nîyare mî ser o nireqisne, ez axwe nîdana to. (Ballikaya, 2010: 122).

**Hetani:** Ez kî lewê astorê to de vindeno **hetanî** ti ama. (Beytaş, 2012: 38).

**Heton:** **Heton** mêrdek şono hemalî veyneno Mehme heme hiri civalonzi beno (Kaymak, 2016: 13).

**Hetonî:** Del şî dîyarî kerrêka nêwîn îmkonî cit çinîye benû, **hetonî** ez omîya vergon ga kerdibi birîndar. (Kaya, 2018: 161).

**Hetta:** Ednan ra **hetta** Ebdullê vist u yo / Buabi Ehmedi ti bîzun yo bî yo (Muşeki, 2020: 30).

**Hetûn:** Ez **hetûn** vêşûnê ver di mereno ez xû rî şîyero hewnê paşay mana biderdo. (Mîrvanî, 2012: 43).

**Heya:** Şefeq ra **heyâ** tînc zikir sew bikî / Sewabêdo zav ti qazanc ko bikî (Ensarî, 2018: 110).

**Heyonî:** **Heyonî** ti mi ra nîvajî ina mendil çita wa ez nîdona ti. (Kaya, 2018: 109).

**24. Hêw:** Bestoğê *hêw* qey ifadekerdişê menaya peyniya gureyi yeno şixulnayış. Bestoğê *hêw* binateyê dî cumleyan dî ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Hêw:** Dê ti siba ina cinîyê cîrûnê ma dî **hêw** ti ra pers bik... (Bor, 2015: 28).

**25. Hîni:** Bestoğê *hîni* qey ifadekerdişê menaya peyniya gureyi yeno şixulnayış. Bestoğê *hîni* binateyê dî cumleyan dî ca geno. Zazaki dî zê *hîni*, *hîn*, *henî* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Hîni:** Gawon şono **hîni** veyve roneno. (Kaymak, 2016: 21).

**Hîn:** Ez zaf bibîya vêşûn mi ard tay rûn kellî na sêr nûn a ez ha wen a deqa ti kowta zeri. **Hîn** tersûn ver mi nîzûna se bikêrî mi nûn pa rûn a eşt bîn kilawê xwu (Bor, 2015: 91).

**Henî:** Ez nêzana **henî** werdekê bînî zî merdîbî yan nê (Doğuç&Doğuç, 2019: 19).

**26. İhna:** Bestoğê *ihna* qey eşkerakerdiş u zelalkerdişê mena yeno şixulnayış. Bestoğê *ihna* binateyê dî cumleyan dî yeno şixulnayış. In bestoğ Zazaki yo.

**İhna:**...cinîyek qîj xwu kuwena mîyerdê xwu wa, wû qîj xwu kuwen cinîyê xwu wa **ihna** pê qîj xwu bên şa... (Bor, 2015: 28).

**27. Ki:** Bestoğê *ki* eğleb qey eşkerakerdiş u zelalkerdişê mena yeno şixulnayış. In bestoğ dordor zi qey ifadekerdişê menaya wexti şixuliyeno u dî gureyan hetê wexti ra besteno yobinan a. Bestoğê *ki* dordoran zi qey ilavekerdişê yona gureyê neweyi yan zi yona menaya newe yeno şixulnayış. Bestoğê *ki* binateyê cumleyan dî yeno şixulnayış u zê *ke*, *kı*, *ki*, *ko*, *ku*, *ık*, *ig*, *go*, *g'*, *kî* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**G':** Homa mekir ti **g'** cey bûetûn mi bikêr (Bor, 2015: 45).

**Ge:** Min zanayne **ge** zimistanî werdekî yenê awgermikanê fekê çemî. (Doğuç & Doğuç, 2019: 19).

**Go:** A **go** yena ezman qeleşnena / A **go** yena erdu hem bedelnena (Kavari, 2004: 51).

**Ik:** Ma zun **ik** tı qadir pil, ma aciz i / Tı zengin sexi yê, ma zaf feqir i (Narin, 2018: 14).

**İg:** Şeytuni va ez qulun tu şaş kena / Ay **ig** zeif yın heq ra ez kaş kena (Muşeki, 2020: 24) .

**Ke:** Bi namê wahîrê no erd û azmin / **Ke** ma dest kerd bi no girwedo rengîn (Babij, 2018: 175).

**Ke:** Wertê na kou de dewuzu **ke** weşiya xo ramitene Silêman eve Yivrayimi ra vejıyay amey. (Mirza, 2020: 32).

**Kı:** Kaşo **kı** kewti diyar hında roj şı bı awa (Pamukçu, 2020: 52).

**Kı:** Roşeno dı rıkat nımaji xu keno qedneno di **kı** keyneki turba xu ra varıştı û hamey teber (Kaymak, 2016: 25).

**Ki:** Ez imeya **ki** ti ina estorê mi nale bikirî. (Mîrvanî, 2012: 25).

**Kî:** Taye non bide ma, tayê adir **kî** weke (M. Çiçek, 2014: 46).

**Ko:** Vera heqqî omê pîser herb Bedrî / Qesem wendi **ko** nîverdê yo tenî (Çolig, 2012: 15).

**Ku:** Ay **ku** gunah kerdo bawe wo ti şefa'et bikerî / Badê kerdışê gunahî va ez go xo rê se kerî? (Kavari, 2004: 11).

**28. La:** Bestoğê *la* qey ifadekerdişê menaya tezadi yeno şıxulnayış u bınateyê dı cumleyan dı ca geno. Ge ge zi qey ifadekerdişê mereqi, hivi, şaş biyayışi şıxul-yeno. In bestoğ Zazaki yo.

**La:** Bi Qur'anî ay bînî mensûxî / **La** hukmê ê wendiş mubeddel niyî (Ensarî, 2018: 62).

**29. Labelê:** Bestoğê *labelê* qey ifadekerdişê menaya tezadi yeno şıxulnayış u bınateyê dı cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *labelê*, *labırê*, *labreye* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Labelê:** **Labelê** ma zanî rehma bê hîsab / To hete esta û ma bî dilkebab (Xasi, 2008: 17).

**Labırê:** İnsanê Hesperani hend telef nêbiyo, **labırê** tengey anta. (Pamukçu, 2020: 120).

**Labreye:** Temam ez a to birişa veyve. **Labreye** ti do rew bêrê. (Adabeyi, 2005: 87).

**30. Lakin:** Bestoğê *lakin* qey ifadekerdişê menaya tezadi şıxuliyeno u bınateyê dı cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *lakin*, *lakim* varyanti cê esti. In bestoğ Erebiyo (لاکین - لکن) (Mutçalı, 1995: 806).

**Lakin:** Allê va o çi g' şıma wazên buwerên / **Lakin** darê ğelli şıma mewerên. (Muşeki, 2020: 26).

**Lakim:** Dedkêne yi, yi ra zaf hes kena, **lakim** in heskerdiş xwu nêşkiyena bid tever (Bor, 2013: 9).

**31. Lawrek:** Bestoğê *lawreki* qey ifadekerdişê menaya tezadi yeno şıxulnayış u binateyê dî cumleyan dî ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Lawrek:** Paşay mi tû ino pîlêkî (kîsey) zernûn dayo mi seba hûnerî mi, mi we qeşub kîyerdo, **lawrek** yew çî mî ri xudik (ecêb) imewo. (Mîrvanî, 2012: 38).

**32. Madem:** Bestoğê *mademi* qey ifadekerdişê menaya sebebi yeno şıxulnayış u sareyê cumleyan dî ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Madem:** Doxtor vono: **Madem** inavayo ez to mane nî kena. (Kaymak, 2016: 26).

**33. Mera:** Bestoğê *mera* qey ifadekerdişê menaya istisna yeno şıxulnayış u binateyê cumleyan dî ca geno. Zazaki dî zê *mera, mela, mele* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Mera:** O kueli va wellahi mî nêşnawît / In vatî **mera** mî tu ra eşnawît (Muşeki, 2020: 62).

**Mela:** Heş siyepare dî tuşk weno **mela** bînêk astî u puestê cî moneni...(Ak-bana, 2020: 26).

**Mele:** Fikrê ey de mumkin nîyo ke amike karode rind bikero. Se kena bikero êy çim de tim xirab o. Cokana radyo de kî rike de bî. **Mele** dizdiya kerdêne ra û binê orxanî de goşdarî kerdêne. (Karakaş, 2016: 24).

**34. Mesela:** Bestoğê *mesela* qey eşkerakerdiş u zelalkerdişê mena yeno şıxulnayış. Yani wext misal dayiş icab keno yeno şıxulnayış. Bestoğê *mesela* binateyê cumleyan dî ca geno. In bestoğ Ereki yo (مثلا) (Mutçalı, 1995: 818).

**Mesela:** Esas ti her çî mîyanê zemanêkê dergi de, mîyanê zemanêkê hîrayî de fikirîyenî. **Mesela**, eke yew doman hema ha pîzeyê maya xo de, ti hetanî pîriya ey fikirîyenî. (Lezgîn, 2015: 78).

**35. Mevac:** Bestoğê *mevacî* qey ifadekerdişê menaya heyreti u newe mu-sayış yan zi hayidar biyayışê çiyêk yeno şıxulnayış. Bestoğê *mevacî* binateyê cumleyan dî ca geno. In bestoğ Zazaki yo.

**Mevac:** **Mevac** legleg dehni poti u kerdî zerreyê mêsina fekteng u ardi verê lu dî nayî ru. (Ak-bana, 2020: 8).

**36. Nê:** Bestoğê *nê* ge ge qey ifadekerdişê menaya tercih kerdişê ge ge zi qey ifadekerdişê menaya tezadi yeno şıxulnayış. Bestoğê *nê* binateyê cumleyan dı ca geno u zê *nê*, *niyu* varyanti cê estî. In bestoğ Zazakî yo.

**Nê:** Mî nêzanena yewbînan ra hes kenî **nê** yewbînan reyde dewa kenî. (Zengelan, 2009: 76).

**Nîyû:** Mîyerik, bo zobîna qîj ma z' est, û Ella hama qîjûn dûn ma. **Nîyû** ma pîyor qîrbûn Elik û Fatik ib, bimir (Bor, 2013: 223).

**37. U:** Bestoğê *u* yi qey ifadekerdişê menaya ilavekerdişê şıxuliyeno. Bestoğê *u* yi, kelimeyan, grubanê kelimeyan, cumleyan u grubanê cumleyan besteno yobinan a. Bestoğê *u* yi binateyê dı çîyan dı ca geno u Zazakî dı zê *u*, *o*, *ew*, *w'*, *yu*, *we* varyanti cê estî. In bestoğ Zazakî yo.

**U:** Lu **u** kırîng beni way **u** bîra (Akbanâ, 2020: 11).

**O:** Perçemê heq dêstî Musab Umeyrî / Muhacîr **o** Ensar, Muaz **o** Elî (Çolig, 2012: 15).

**Ew:** Alos hîrî mahley bî; cêr dı mahlaya Odebaşîyan u mahlaya Çeperan **ew** lewedê paştiya Mahlaya Corî est bî. (Pamukçu, 2020: 43).

**W':** Yanî ne haça **w'** tîya enka **w'** verî / Qet çînebî hem çînikê zey verî (Xasî, 2008: 37).

**Yû:** Bebekî danê ci **yû** vijyenê şînê teber... (Adabeyî, 2005: 158).

**We:** Şehadet ti vaji **we** bawer bîki / Eger ki ti şênî telefuz bîki (Ensarî, 2018: 42).

**38. Qeni:** Bestoğê *qeni* qey ilavekerdişê menaya ixtîmal ya tercihêkê neweyî yeno şıxulnayış. *Qeni* binateyê cumleyan dı ca geno u zê *qeni*, *qeniyê* varyanti cê estî. In bestoğ Zazakî yo.

**Qeni:** **Qeni** ma xelas bîvin la ey Nebî / Ruh u cun ma bîb' feda qê cun tu bî (Muşekî, 2020: 8).

**Qenîye:** ...Xwu xwu vûn, se ben, se nîben, cê raşt a yo bela yen ma ser, **qenîye** wa zerd ma, ma dest ver di b' (Bor, 2013: 141).

**39. Seni:** Bestoğê *seni* qey ifadekerdişê menaya wextî yeno şıxulnayış. *Seni* sare yan zi miyanê cumle dı ca geno. Zazakî dı zê *seni*, *sîni* varyanti cê estî. In bestoğ Zazakî yo.

**Seni:** Lu **seni** hîna vona heş çargomî vazdono (Akbanâ, 2020: 30).

**Sînî:** We **sînî** ay nîyt yi eşnawenû, awca di vîndenû. (Sîmserkîsîj, 2018: 70).

**40. Ta:** Bestoğê *ta* qey ifadekerdişê sebebi yeno şıxulnayış. Cumleyanê sebeb u neticeyi besteno yobinan a. In bestoğ, binateyê cumleyan dı ca geno. Bestoğê *ta* Farîskî yo (⚡) (Kanar, 2008: 407).

**Ta:** Şad kerên sultanê ê hurna dinî / **Ta** bibî cennet di enbazê nebî (Babîj, 2018: 180).

**41. Wext:** In bestoğ qey ifadekerdışi wexti şıxulyeno u sareyê cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *wext*, *wexta*, *wexto*, *weqto* varyanti cê esti. In bestoğ Erebi ki yo (وقت) (Mutçalı, 1995: 1000).

**Wext:** **Wext** xıyalê werunê weşun kena aw kuena fek. (Akban, 2020: 8)

**Wexta:** Bulbul secdê şukur berd vêr bêr Rawza d' / Fek şî pıra **wexta** dı desti beyza d' (Cebexçuri, 2015: 100).

**Wexto:** **Wexto** qiyamet bêro ay zaman / Ser erdan d' yew nemanen ay mekan (Kavari, 2004: 52).

**Weqto:** **Weqto** nûrê Ehmedî anya tera / Bê hîsab yê kerd heya Rabbê xu ra (Xasi, 2008: 43).

**42. Xora:** Bestoğê *xora* qey ifade kerdışê menaya ilavekerdışê ciyêkê neweyi yeno şıxulnayış u binateyê cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *xora*, *xwura* varyanti cê esti. Bestoğ dı parçeyi êseno labelê zê yo kelimeya sade yeno şıxulnayış. In bestoğ Zazaki yo.

**Xora:** Xeyrê ey to rê çin o. **Xora** ti bibî ferîştêh, ti ey şew û roje paştıya xo de biçarnî zî, pere nêkeno. (Lezgîn, 2015: 68).

**Xwura:** Eg ti kueşk ra memnûn nibî **xwura** badî çowras rûej wuhar kueşk yen kueşkê xwu pey d' gen (Bor, 2015: 113).

**43. Xulasa:** Bestoğê *xulasa* qey ifade kerdışê piserontışê dakara u netice yeno şıxulnayış. In bestoğ sareyê cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *xulasa*, *xulase* varyanti cê esti. In bestoğ Erebi ki yo (خلاصة) (Mutçalı, 1995: 242).

**Xulase:** Heman behsê Mî'racî zav o bizan / **Xulase** ti inka ineni biwan (Ensarî, 2018: 90).

**44. Ya:** Bestoğê *ya* ge ge qey ifadekerdışê menaya tercih kerdışi ge ge zi qey ifade kerdışê menaya tezadi yeno şıxulnayış. Bestoğê *ya* binateyê cumleyan dı ca geno u zê *ya*, *yan* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Ya:** Çımun xu vêc xu kuar kerî / **Ya** xu bıkiş qatıl kerî (Pueği, 2020: 8).

**Yan:** Mi va, cay weyra vengê ereban yeno, **yan** nêno. (Zengelan, 2007: 24).

**45. Yani:** Bestoğê *yani* qey ifadeyê eşkerakerdış u zelalkerdışê mena yeno şıxulnayış u binateyê cumleyan dı ca geno. In bestoğ Erebi ki yo (يعنى) (Mutçalı, 1995: 604).

**Yanî:** Almanan de yew edet esto, merdimo ke ti nêşinasnî, **yanî** ti samimî nîyî, ti gerekî bi peynameyê ey a bivendî ey (Bor, 2014: 77).

**46. Yeqina:** Bestoğê *yeqina* qey ifadekerdışê ixtimali yeno şıxulnayış u binateyê cumleyan dı ca geno. In bestoğ kelimeya Erebi ki yo *yeqin* ra yeno (يفن)

(Mutçalı,1995: 1021). Zazaki dı ge ge wesıla -a geno ge ge zi formê cı bediliyeno zê formanê *yeqêna*, *yeqıra* şıxulyeno.

**Yeqîna:** Ez kûar a **yeqîna** reyar ra cinîye min u yi kerda pîye... (Bor, 2015: 42).

**47. Zi:** Bestoğê *zi* semedê ifadekerdışê menaya ilavekerdışê çiyêkê neweyi yeno şıxulnayış u miyanê cumle u bınateyê cumleyan dı ca geno. Zazaki dı zê *zi*, *ci*, *ji* varyanti cê esti. In bestoğ Zazaki yo.

**Zi:** Lutif bık bun mezelen ra / Wellahi tu **zi** bên ita ( Pueği, 2020: 70).

**Ji:** Waka delal, gestver zerra mı nasılıyena. Ez **ji** zaf biya vêşon. (Akban, 2020: 23)

**Ci:** Na qısa ra pêri zana kı tema Zin **ci** Kemali dı esta.( Pamukçu, 2020: 7).

**48. Zira:** Bestoğê *zira* semedê ifadekerdışê sebebi u eşkerakerdışê mena yeno şıxulnayış. In bestoğ bınateyê cumleyan dı ca geno. Bestoğê *zira* Fariski yo (زیرا) (Kantar, 2008: 761).

**Zira:** Guna mı ra ‘af tim tu ra **zira** tı pil ez tu çik niya (Cebexçuri, 2015: 286).

## NETİCE

Ina xebat dı *bestoği sadeyi* kritik biyi. Xebat dı 48 hebi *bestoği sadeyi* tesbit biyi. Ini bestoği hetê şekıl, mena, wezife u koki ra kritik biyi. Goreyê tesbitê ma hetê koki ra 29 bestoği Zazaki, 13 bestoği Erebkı, 4 bestoği Farıski, 2 bestoği zi Tırki yi. Peyniya xebat dı tesbit bı ki bestoği kelimeyan, ifadeyan ya zi cumleyan hetê sebeb, netice, wext, eşkerakerdış, izahkerdış, qıyaskerdış, ifadekerdışê miqdari, ixtimal, mena ilavekerdış, tezdad, tercihkerdış, şert, istisna, eşkayış ra besteni yobinan a. Heto bin ra cayê şıxulyayışê bestoğan zi ferq keno. Têkı bestoği teyna sareyê kelime, ifade u cumleyan dı, têkı teyna bınateyê kelime, ifade u cumleyan dı, têkı zi hem sare hem zi bınateyê kelime, ifade u cumleyan dı yeni şıxulnayış.

## BİBLİYOGRAFYA

- Adabeyi, F. (2005), *Estanekanê Sêwregi ra*, Vate: İstanbul.  
 Akban, M. (2020), *Waka Lu*, Vir: İstanbul.  
 Aldatmaz, N. G. (2016), *Piltane*, Vate: İstanbul.  
 Aslan, C. (2011) *Moriber*, Kardelen: İstanbul.  
 Babij, M. C. (2009), *Siyerê Nebî*, Nûbihar: İstanbul.  
 Babij, O. E. (2018) *Biyîşa Pêxemberî*, Vate: İstanbul.  
 Ballıkaya, H. (2010), *Dêvo Kor*, Vate: İstanbul.  
 Ballıkaya, H. (2014), *Hemedok*, Vate: İstanbul.

- Banguoĝlu, T. (1990), *Türkçenin Grameri*, (3. Baskı), TTK: Ankara.
- Beki, M. A. (2015), *Diwon Cebexçuri*, Bingöl Üniversitesi: İstanbul.
- Beytaş, A. (2012), *Şaîsmayîl*, Vate: İstanbul.
- Bor, İ. (2014), *Estareyê Koyê Hesarî*, Roşna: Dîyarbekir.
- Bor, İ. (2015), *Mesel û Vistonikî*, Roşna: Dîyarbekir.
- Bor, İ. (2013), *Vistonikê Dadîyê Mi*, Roşna: Dîyarbekir.
- Çiçek, A. A. (2014), *Lêl*, Vate: İstanbul.
- Çiçek, M. (2014), *Mêşa Dengize*, Vate: İstanbul.
- Çiftçi, H. (2013), *Uygulamalı Farsça Grameri*, Eser Ofset: Erzurum.
- Çiya, S. (2020), *Hirê Kıtabi*, Vir: İstanbul.
- Çolig, F. B. (2012), *Mewlîdê Pêximbêr*, Diwan, İstanbul.
- Demîrel, L. (2014), *Vîndîbîyaye*, Vate: İstanbul.
- Doĝuç, W. & Doĝuç, U. (2019). *Baba Vano*, Roşna: Dîyarbekir.
- Ensarî, Ş. M. (2018), *Raro Raşt & Melumatê Dînîye*, Nubihar: İstanbul.
- Espar, J. İ. (2004), *Beyi Se Bena?*, Vate: İstanbul.
- Gomayij, M. (2017), *Darule*, Roşna: Dîyarbekir.
- Kanar, M. (2008), *Farsça-Türkçe Sözlük*, Say: İstanbul.
- Karakaş, H. (2016), *Rêça Binbareke*, Roşna: Dîyarbekir.
- Kavarî, M. M. (2004), *Diwanê Muhammedê Kavari*.
- Kaya, A. (2019), *Vartî Kerda Pero, Tehm Tera Şiyo*, Roşna: Dîyarbekir.
- Kaymak, W. (2016), *Zazaki İstaneki*, Arya: İstanbul.
- Korkmaz, Z. (2017), *Türkiye Türkçesi Grameri Şekil Bilgisi*, (5. Baskı), TDK: Ankara.
- Lezgîn, R. (2015), *Tariyîya Adirî de*, (2. Baskı), Roşna: Dîyarbekir.
- Licokic, M. (2007), *Sanikan û Deyîranê Licê ra*, Vate: İstanbul.
- Mîrvanî, S. (2012), *Kal Mûsênî Zeydûnû*, Vate: İstanbul.
- Mirza, Y. (2020), *Suleman I-II-III*, Ceylan, İstanbul.
- Muşeki, M. A. (2020), *Mewlîdê Nebi*, Vir: İstanbul.
- Mutçalı, S. (1995), *Arapça-Türkçe Sözlük*, Dağarcık: İstanbul.
- Narin, A. (2018) "Mewlidi Nebi", *Vir*, Omar: 7, r. (6-15).
- Pamukçu, F. (2001), *Gramere Zazaki*, Tij: İstanbul.
- Pamukçu, F. (2020), *Welato Şirîn*, Vir: İstanbul.
- Pueĝi, M. K. (2020), *Diwan*, Vir: İstanbul.
- Sîmserkîsij, İ. (2018), *Sîmserkîs*, Roşna: Dîyarbekir.
- Şahinoĝlu, N. (1997), *Farsça Grameri*, Kitabevi: İstanbul.
- Tekîn, E. (2013), *Sewdaya Belekin*, Roşna: Dîyarbekir.
- Turgut, H. (2009), *Zazaca Dilbilgisi*, Tij: İstanbul.
- Türk Dil Kurumu, (2005), *Türkçe Büyük Sözlük*, (10. Baskı), TDK: Ankara.
- Xasi, M. E. (2008), *Mewlîd*, Hîvda: İstanbul.
- Yazar, İ. (2018), *Cimê Aşikan ra Hewt Hîkayeyê Gelêrî*, Roşna: Dîyarbekir.
- Zengelan, J. (2007), *Gorse*, Vate: İstanbul.
- Zengelan, J. (2009), *Zifqêra Berî*, Vate: İstanbul.



## شاعر و پوژنامه گهري، به نمونه‌ی شيعره کاني (هيمن موکرياني ۱۹۸۶ - ۱۹۲۱ز)

بارزان کاني طاهر

پوخته

ئهم ليکۆلئينه وديه، که به ناونيشانی (شاعر و پوژنامه گهري، به نمونه‌ی شيعره کاني ”هيمن موکرياني ۱۹۲۱ - ۱۹۸۶ز“) يه. دهروازه يه که پيهوئندی نيوان ويژه و پوژنامه گهري کوردی، به تايبه تي شاعر و پوژنامه گهري دهخاته روو. لهم روانگه يه وهش دوای ناساندن و لايه ني هاوبهش و جياوازی ههردوو ژانره که، به وردی تيشک دهخاته سهر شيعره کاني (هيمن موکرياني)، که له سهرجه م ژماره کاني پوژنامه و کۆواره کاني سهردهمی (ژينکاف ۱۹۴۲ - ۱۹۴۵ز) و (کۆماری کوردستان ۱۹۴۶ز) و پوژنامه ی (کوردستان ۱۹۵۹ - ۱۹۶۳ز) دا بلاوکراونه تهوه. بۆ ئهم مهبهستهش جگه له خسته نه پرووی سهرجه م شيعره بلاوکراوه کاني نيو ئهم پوژنامه و کۆوارانه، پاشان به دهقه شيعرييه کاني نيو ديوانه کاني بهراورد کردنيان دهکات و جياوازی نيوان ههريه کهيان دهدهخات، ههروهها (۱۶) پارچه شيعري تريشي دهخاته روو، که تاکو ئيستا له سهرجه م ديوانه چاپکراوه کانيدا بلاونه کراونه تهوه. ههريه لهم بارهوه بۆ زياتر خسته نه پرووی شيعره کاني ناوبراو، نامازه به (۳) پارچه شيعري تريش دهکات، که له کۆواره کاني، (گزننگ ۱۹۷۲ز، مامۆستای کورد ۱۹۸۵ - ۱۹۹۶ز، ژين ۲۰۰۹ز) دا، بلاوکراونه تهوه و له ديوانه کانيدا، نيين.

وشه ی کليلی: شاعر، پوژنامه گهري، پوژنامه، کۆوار، هيمن موکرياني، ديوان.

### ÖZET

**(Şiir ve Gazetecilik “Hemin Mukrîyani’nin şiir örneğiyle 1921-1986”)** isimli bu araştırma Kürt edebiyatı ve gazeteciliği arasındaki ilişkiye özellikle şiir ve gazetecilik bağlamında dikkat çekmektedir. Bu konuda her iki türün tanıtımı, ortak ve farklı özelliklerine değindikten sonra Hemin Mukrîyani’nin (Kürdistan Cumhuriyeti 1946) ve (Jêkaf 1942-1945) dönemlerinde yayınlanan (Kürdistan Gazetesi 1959- 1963) gibi dönemin dergi ve gazete sayılarında yayınlanan şiirlerine ışık tutar. Bu doğrultuda söz konusu gazete ve dergilerde yayınlanan şiirleri daha sonra divandaki şiirleri ile kar-

1 Lêkoler, Barzan Kanabi TAHER, barzank.tahir@yahoo.com

şılaştırılmakta ve her birinin arasındaki farkı ortaya çıkarmaya çalışmaktadır. Bununla beraber şimdiye kadar yayınlanan divanlarında yer almayan 16 adet siiri de günyüzüne çıkarılmaktadır. Ayrıca yine divanında yer almayan ancak (Gizing 1972, Mamostay Kurd 1985-1986 ve Jîn 2009) gibi dergilerde yer alan 3 şiirine daha yer verilmektedir.

**Anahtar kelimeler:** Gazetecilik, Gazete, Dergi, Hemin Mukrîyani, Divan.

### Abstract

This research under the title of **(Poetry and Journalism with examples from poems of “Hemin Mukriani 1921- 1986”)** which is a gateway to display the relation between literature and Kurdish journalism, particularly between poems and journalism, from this aspect after definition and display of the mutual and contradictory aspects between both types, it sheds light accurately on the published poems of “Hemin Mukriani “in all journals and magazines in the era of (Zhekaf) between (1942- 1945) and (Kurdistan Republic 1946), and (Kurdistan) journal between the of (1959 -1963) for this purpose in addition to the display of all the published poems in these journals and magazines then comparing them with the poem texts that are mentioned in his poem collections and showing all the differences between every poem texts and it displays (16) parts or poem text to the mentioned in all his printed poem collections which is not published up to now and to more display his poems which are not existing in his collections, three other poems are indicated to in (Gizng 1972, Mamostai Kurd 1985-1996, Zheen 2009) Magazines which were published but were not mentioned in his collections.

**Keywords:** Poetry, Journalism, Newspaper, Magazine, Hemin Mukriani, Poem collection.

### پیشه کی

ئه گه رچی شیعەر و رۆژنامه گهری دوو ژانری لهیه کتر جیاوازن و ههر یه که و فۆرم و میتۆدی تایبەت به خۆی ههیه، به لأم ئەم جیاوازییه له په یوهندی و کاربگهری نێوانیان به سه ره یه کتره وه به ره به ست نه بووه. بۆیه به شیوهیه کی گهستی میژووی وێژه به تایبەتی له قۆناعی نوێ و هاوچهرخدا، به میژووی رۆژنامه گهریه وه په یوهسته. ههروهک له تیشک خستنه سه ره ژانره وێژهیه کانی ئەم دوو قۆناعه ئەوه دهرده که ویت، که نامرازه رۆژنامه گهریه کان به تایبەتی رۆژنامه و کۆواره کان، جگه له وهی له بزوین و گهشه و گۆرانکاری ژانره وێژهیه کان رۆلی سه ره کییان بینیه. ههروهها ناوهندیکی گرنگی ئه رشیفکردنی ئەو به ره هه مانه شن، که له لایهن وێژهوانانه وه خراونه ته روو. بۆ ئەم مه به سته ش له هه ردوو ئاستی وێژه و رۆژنامه گهریه دا، به شیوهیه کی تیۆری و پراکتیکی بۆ دهرخستنی په یوهندی نێوانیان،

لەم چوارچۆنەیدا، شاعر وەک ژانریکی رەسەنى وێژە، بە نمونەى شیعەرەکانى (هێمن موکریانى ۱۹۲۱- ۱۹۸۶ز)، کە لە سەرجمە ژمارەکانى رۆژنامە و کۆوارەکانى سەردەمى (ژیکاف ۱۹۴۲- ۱۹۴۵ز)، (کۆمارى کوردستان ۱۹۴۶ز) و رۆژنامەى (کوردستان ۱۹۵۹- ۱۹۶۳ز) بڵاوکراونەتەو. پاشان بەراوردکردن پاشان لە گەڵ دەقەکانى نێو دیوانە چاپکراوەکانى و دەسنیشانکردنى ئەو پەيوەندى و جیاوازییانەى لە نێوانیاندا هەبە، بە تايبەتى ئەو دەقە شیعرییانەى لە دیوانەکانیدا نین، یاخود بە شێوەیەكى بەرچاو دەستکاری کراون. شایانى ناماژەبە، جگە لە چوارینەکان، سەرجم ئەو پارچە شیعرانەى لە دیوانەکانیدا نین، بەهۆى بەرتەنگى سنوورى دیاریکراوى چوارچۆنى لیکۆلینەو، تەنیا ناماژە بە دێرى سەرەتا و کۆتاییان کراوە.

هۆى هەلبژاردنى لیکۆلینەو: هۆى هەلبژاردنى ئەم لیکۆلینەو بەو ئەو دەگەریتەو، تاكو ئیستا شیعەرەکانى (هێمن موکریانى) لە چوارچۆنى پەيوەندى (شاعر و رۆژنامه گەری)یدا، نەبۆتە کەرەستەى لیکۆلینەو، کە لایەنى گرنى و کاربەگەرى ئەزمونى شاعیریەتى ناوبراوە لە بڵاوکردنەو و گەیاندى بەرەمەکانیدا.

گرنى لیکۆلینەو: گرنى لیکۆلینەو کە لەو دایە، جگە لە خستەرووى رۆل و گرنى پەيوەندى نێوان (شاعر و رۆژنامه گەری)، بەشێوەى کى تیۆرى و پراکتیکى دەسنیشانى سەرجم ئەو شیعرانەى (هێمن موکریانى) دەکات، بەر لە چاپکردنى دیوانەکانى لە رۆژنامە و کۆوارە ناماژە پى کراوەکان بڵاوکراونەتەو. پاشان لە گەڵ دەقەکانى نێو دیوانەکانى بەراوردیان دەکات و پەيوەندى و جیاوازی نێوانیان دەردەخات. هەرەها خستەرووى نمونەى هەموو ئەو پارچە شیعرانەى تاكو ئیستا لە دیوانەکانیدا بڵاو نەکراونەتەو.

سنوورى لیکۆلینەو: بۆ دیاریکردنى سنوورى لیکۆلینەو، لە چوارچۆنى وێژە و رۆژنامه گەرییدا، (شاعر و رۆژنامه گەری، بە نمونەى شیعەرەکانى "هێمن موکریانى ۱۹۲۱- ۱۹۸۶ز")، نمونەکان لە رۆژنامە و کۆوارەکانى سەردەمى (ژیکاف ۱۹۴۲- ۱۹۴۵ز)، (کۆمارى کوردستان ۱۹۴۶ز) و رۆژنامەى (کوردستان ۱۹۵۹- ۱۹۶۳ز)، دەخاتە بەر تیشكى لیکۆلینەو.

رێبازى لیکۆلینەو: لیکۆلینەو کە لە چوارچۆنى وێژە و رۆژنامه گەرییە، بە پشت بەستن بە رێبازى (وەسفى شیکارى، بەراورد کارى) لە شیعەرەکانى نێو رۆژنامە و کۆوارە دیاریکراوەکانى کۆلیوەتەو.

گیروگرتى لیکۆلینەو: لە کاتى ئەنجامدانى ئەم لیکۆلینەو، دیارترین گرت هاتیبەتە پێشمان، نەبوونى سەرچاوە و لیکۆلینەو، کى تیروتەسەل بوو، کە وێژە و رۆژنامه گەری کوردى خستیبەتە بەر تیشكى لیکۆلینەو، کى ورد بە تايبەتى لە چوارچۆنى شیعردا، هەرەها بەردەست نەبوونى سەرچاوە بە زمانانى تری وەک عەرەبى، فارسى و ئینگلیزى گرتیبەتە دیکە بوو. ئەوێ ئیمە بیزانین کتیبخانەى کوردى لەم بارەبەو هەژارە.

ناوەرۆكى لیکۆلینەو: ناوەرۆكى ئەم لیکۆلینەو جگە لە پێشە کى و ئەنجام و پاشکۆیە کى رۆژنامە و کۆوارە بە کارهاتوو، کە لە دوو بەشى سەرە کى پیکدیت:

بەشى یە کەم: ناوەرۆكى ئەم بەشە لە: (شاعر و رۆژنامه گەری، شاعر و رۆژنامه گەری کوردى، هێمن موکریانى و رۆژنامه گەری) پیکدیت. لەم بەشەدا جگە لە وردبوونەو و هەلۆهەستە کردن لەسەر

هەر یه كینكك لهم سهرهباسانه، له سهرهباسی سییه مەدا، وهك دهروازهیهك بۆ روونکردنهوهی زیاتر چهند نمونهیه کی پتویست خراونه تهروو.

بهشی دووهم: لهم به شهدا كه سهرهباسه كانی: (هیمم موكریانی و سهرحهم شیعره كانی نیو رۆژنامه و كۆوارهكان، سێ كۆوار و سێ پارچه شیعی تری ناوبراو) لهخۆدهگریت، به وردی تیشك خراوته سههره كینکیان و به پیتی ویستی لیکۆلینهوه كه نمونهكان خراونه تهروو. له كۆتایی لیکۆلینهوه كه شدا جگه له خستنه رووی گرنگترین نهجمه كان، لیستی سهرحاوه به كارها توه كان و سهرحهم ژماره ی رۆژنامه و كۆواره وهرگیاوه كان، له گهڵ پوختهی توێژینهوه كه به ههردوو زمانی تورکی و ئینگلیزی خراونه تهروو.

### بهشی یه كه م

تهوه دهی یه كه م: أ- شیعر و رۆژنامه گهری

ههرحهنده وێژه و رۆژنامه گهری دوو ژانری له یه كتر جودان و هه ریه كه و زمان و شیواز و ئاراسته ی تایبته به خۆی له په یام گه یاندندا هه به. له بهر ئه وهی وێژه به شیوهیه کی گشتی له گوازارشت گه لێکی رهنگریژكراوی به سۆز و ئهندیسه رازاوهی بییری تاكه كه سهوه سهرحاوه ده گریت، كه به هۆی ده برینی جۆراوجۆره وه به بهراورد له گهڵ دهقیکی تری ناسایی هه لگری گوازارشت و واتای فراوانتره، جا هه ر دهقیکی ژانره كانی وێژه بیته. [تیسیر محمد الزیادات، ۲۰۱۴، ۱۴] به تایبته ی شیعر، كه مه بهستی سه ره کی لیکۆلینهوه كه یه و بۆیه وردتر هه لۆسته ی له سه ر ده كه یین، كه به شیوه کی گشتی یه كینككه له ژانره كۆن و سه ره تاییه كانی میژووی وێژه ی میله تانی جیهان، وهك هونه رینکی ره سه ن و بنه رده تی یه كینككه له و ژانره ی فره په یوه نده، كه ((شه پۆلێکی نه ینی گیانییه كزه با یك یا خور په یك له میشكه وه هه لئ دهوقلێنی و له پێچ و په نای دل و دهروون شنه ده كا، شیعر بینه یی تایبه تی و ئه ی ”بوون“ چاوی شاعیر هه ستی په ده كا. ئه مه رووداوه، رووداویش له جینگه و كات په یدا ده یج له پاشانا له جینگه و كات ده چیتته ده ری و ده یج به بوونێکی هه میشه یی هه ر و هه ر به كار ده یترئ و كۆن نا یی و له كه لكیش نا كه وئ.)) [مارف خه زنه دار، ۲۰۱۰، ۱۵۱] ئه مه ش به هۆی ئه وهی له رووی رووخسار و ناوه رۆكه وه، له هه ر دهقیکی تری ژانره كانی وێژه جیاوازه. واته (ئه وه ده برینه رینكخراو و سه روا داریه، پشت به دهنگ و ئاوازیکی تایبته و هاو پێچ به و ئه وه هه ستی قوولی وه رچه رخوا ی ئه ندیشه ئامیژی کاریگه ر و ورووژینه ر ده به ستیت، كه په یامی تایبه تی نیره ر به وه رگرانی بۆ هه ر سه رده میکی دوا ی هاتنه كایه ی ده گه یه نیت). [أنطون نعمة - عصام مدور، ۲۰۰۱، ۷۷۳] هه رچی رۆژنامه گه ربیشه به شیوهیه کی سه ره کی له هه وائل و تار پینك دیت. هه وائل، واته هه وائل رووداوه كان، زانیاری ده رباره ی هۆكار و چۆنه تی روودانی رووداوه كان به شیوهیه کی خیرا، به دوور له سۆز و ئهندیسه و هه ستی تایبه تی تاكه كه سیی و ئاراسته كراو ده خاته روو. [فاطمه محمد محجوب، ۱۹۶۰، ۲۰۶] وتاریش، مه به ست لئی وتاری رۆژنامه گه ربیشه، به هه مان زمان و شیوازوه، هه لۆسته له سه ر با سوخا سه كانی رۆژ و پێشهاته كان ده كات، روونکردنه وه و شیكرنه وه ی با به تیبانه، ده رباره ی ده ركه وته و لێكه وته جۆراوجۆره كانی دواتره وه، بۆ رای گشتی ناوه، یاخود ده ره وه، ده خاته روو. [Gayle Waldrop, ۱۹۵۵, ۵۳] بۆ هه ریه ك له مه انه ش پشت به سه رحاوه ی باوه ر پینكراوی هاو پێچ به زانیاری و داتای روون و ورد ده به ستریت، ده رباره ی ئه و رووداو و كیشه و ناریشانه ی به شیوهیه کی گشتی له هه ر كات و شوینێکی په یوه ست جه ماوه ر، دینه كایه وه. [انتصار ابراهیم عبدالرزاق - صمد حسام الساموك، ۲۰۱۱، ۱۰۴]

واتە رۇژنامە گەربى ھەلگىرى پەيامىكە لە رووى كات و شونئەو دەيارىكراو، لە كۆمەلەو بە كۆمەلە. كەواتە دەقە وئەببەيە كان، بە تايبەتتى شيعر ھەمىشە لە چوارچىوئە سۆز و ئەندىشە و وئەنى تايبەتتى، بە زمان و شىوازىكى بەرزى لە ئاست چىنىكى دەيارىكراو، دەخولئەتتەو. ئەمەش لە رىنگەى بە كارھىتئانى بۆيەى ھونەرى بە شىوئەى كى بەرفراون، كە مەبەست لىئى ھونەرە كانى رەوانىيە، وئەنىە كى رەنگاوپرەنگى جوانكارى كراو نەمىش دەكات. ئەمەش بە ھۆى فەراھەمى رىزبەندە سىنتاكسىيە كان لە يارىكردن بە وشە بۇ نواندى بىرۇكە لە چوارچىوئە وئەدا بەدى دىت. واتە (زمان لە شيعردا ئامرازىكە ھەردوو ئەركى جوانكارى و گواستەنەوئەى بىرۇكە دەبىئىت). [ئىبىل حداد، ۲۰۰۲، ۹۴] كەچى دەقى رۇژنامە گەربى بە پىچەوانەو بە شىوئەى كى گشتى ھەوال و زانىارىيە تازە كان دور لە رەنگوبۆيە رەوانىيە كان، بە زمانىكى سادەى پوختە كراوى لە ئاست ھەموو چىنە كانى كۆمەل بە جەماوەر دەگەيەنئەت. بۆيە زەقتىن جىوازى نىوان دەقتىكى شيعرى و دەقتىكى رۇژنامە گەربى ئەوئە، شاعىر لە پىناو مەبەستىكى تايبەتتى مامەلە لە گەل بەبەتە كە دەكات. واتە روائىن و گوزارشتە كانى خودىن و بەدەر لە سنورىكى دەيارىكراو، لە چوارچىوئە پەيامىكى مرۇفائەتتى بە شىوئەى كى رەھا و سوودبەخش و پەيوەست بە ھەموو سەردەمىك، سەرچاوە دەگرن. كەچى رۇژنامە نووس دور لە بەرژوئەندى كەسىبى و سوودى تايبەتتى، لە پىناو گەياندىنى پەيامى گشتى راپۆرتە ھەوالە كەى زانىارىيە كان دەخاتەرۇو. واتە كەسىكى خودى نىبە، تا روائىنە كانى لەژىر چاودىرى خۆيەوئە بىت، بەلكو بەرپرسىارە بە چاودىرى كۆمەلگا و لە ئەنجامى بىنىن و بەدواداچوون، لە بەرژوئەندى و سوودى كۆمەلگا كەى، زانىارى و شىكردنەو دەربارەى رۇدواو و ھەوالە كانى رۇژ بۇ ناوئەو دەروە لە كاتىكى گونجاو دەخاتەرۇو. [رەوانە: عبداللطيف حمزە، ۱۹۵۵، ۴-۵] كەواتە دەقە وئەببەيە كان بە شىوئەى كى گشتى لە خودەو سەرچاوە دەگرن، بۆيە لە چوارچىوئە سۆز و وئەزدان داىە و ھەلگىرى ناسنامەى كەسىتتى داھىنەرە. دەقە رۇژنامە گەربىيە كانىش لە كۆمەلەو. بەلام لە گەل ئەوئەشدا بەھۆى ئەوئەى رۇژنامە گەربى بزافىكى رۇشنىبىرى فراوان و ھەمەلايەنە، جگە لە گواستەنەوئەى ھەوال و زانىارىيە جۇراوچۇرە كان، لايەنى وئەببەيە بە سەرجم لقە كانىيەو، بە تايبەتتى شيعر پانتايبەتتى كى فراوانى تىدا گرتوئە. ھۆكارە كەشى بۇ ئەو دەگەرپتتەو، ھەر لە سەرتاوە دەر كەوتنى رۇژنامە لە ناو زۆربەى مىللەتاندا (بە ھاو كارى شاعىران و وئەوانانەو ھاتتەو كايەو. بۆيە چ لە رووى شىوازى نووسىنەو، چ لە رووى ناوئەو كەو، لەژىر كارىگەربىيان بەدەر نەبوئە). [عناد اسماعيل الكبيسي، ۱۹۷۲، ۱۳۴] كەواتە ھەر لە سەرتاوە بۇ خىرا ناساندن و گەياندىنى دەنگى شاعىران و بلاو بوئەوئەى بەرھەمە كانىيان بۇ نىو چىنە كانى كۆمەل سەكۆيە كى بەرزبوئە. بۆيە ئاسايە گەر بوئرتت، بە شىوئەى كى گشتى (گرنگىرئىن ژانرە وئەببەيە كانى وەك: "چىرۇك، شيعر، وتار" لە قۇناغى نوئە و ھاوچەرخى وئەببەيە گەلاندا لە ئامىزى رۇژنامە گەربىدا پىگەيشتوئە). [عبداللطيف حمزە، ۱۹۵۵، ۲] بە پىچەوانە شەوە كارىگەرى بەرچاويشى لە كىشكردنى سەرنجى خولئەران و برەودانى رۇژنامە و بلاو كراوئە كان لە گەياندىنى پەيامە ھەمەلايەنە كانى ترەو ھەبوئە. جگە لەوئەش (زۇرجاران شيعرىك لە گوزارشتى رۇدواويك، يان دياردەبەك، يان ھىنانە كايە و پەرەپىدانى بىر و بۇچوئەىكى تازەو، لە وتارىك كارىگەرى زىتارى نواندوئە. ئەمەش واپىكردوئە، وئە و رۇژنامە گەربى ھەمىشە لىكندانە پراو بن و ھاوتەرىب بەسەر يە كەو كارىگەربىن، لە برەودان و پىشكەوتنى يە كىرتىيەو). [منير بكر، ۱۹۶۹، ۲۲۴] لە لايە كى دىكەشەو لە قۇناغبرى و ھىنانە كايە و برەودانى رىباز و ھزرە وئەببەيە تازە كان و رەخنە و پىشنىيازە كانى لەم بارەو، ئامرازە كانى رۇژنامە گەربى لە گەياندىنى كۆكرايى و ناكۆكرايى رۇلى سەرەكى و كارىگەربىيان

بە تايىبەتتى لى قۇناغە كانى وئۆزى نۆي و ھاۋچەرخدا بىنىبۇە. ھەرۋەھا ۋەك ناۋەندىكى گىرنگى تۇمار ۋ ئەرشىفكردى سەرجم بەرھەممە ھەمەلايەنە بلأوكراۋەكان رۇلىكى سەرھەكيبان بىنىبۇە. بۇيە نامرازە رۇژنامە گەربىيە كان بە گشتى ھەمىشە سەرچاۋى گىرنگى مېژوون و مېژووى ژانرە وئۆزىيە كانىش ۋەك لايەنكى بايەخداری گەشە و گۇرانە كانى قۇناغە جىاجىاكان شوئىنى خۇيان تىدا گرتوۋە. ئەمەش ۋاى كىرۋوۋ، پەيۋەندى نىوان وئۆزە و رۇژنامە گەربى پەيۋەندىيە كى بتەو و نەپساۋە بىچ و لى يە كىتر جودا نەبنەۋە، ھەر ۋەك ھەر يە كىنك لى نامرازە كانى رۇژنامە گەربى مېژووى قۇناغ و سەرھەممە كى لى خۇگرتوۋە. [دلىر محمدامىن محمد، ۱۹۹۹، ۱۴] كەۋاتە ھەر لى سەرھەتاۋە نامرازە كانى رۇژنامە گەربى، چ لى ناستى گەپاندىنى دەقە كانى ژانرە وئۆزىيە كان و ناساندىنى وئۆزەۋانان و شاعىران، چ لى ناستى گۇرانكارىيە ھەمەلايەنە وئۆزىيە كان، بە تايىبەتتى شىعەر، ھەمىشە رۇلى بەرچاۋيان بىنىبۇە.

### ب- شىعەر و رۇژنامە گەربى كوردى

سەبارەت بە شىعەر و رۇژنامە گەربى كوردى، ھەر لى گەل سەرھەلدىنى يە كەمىن نامرازى رۇژنامە گەربى كوردى، كە (رۇژنامەى "كوردستان"، ۋەك رۇژنامەيە كى ھەفتەيى وئۆزىيە يە كەمىن ژماردى لى (۲۲-۴-۱۹۹۸ز) لى لايەن (مىقداد مەدحەت بەدرخان بەگ) لى شارى قاھىردى پايتەختى مىسر بلأوكراۋەتەۋە). [عەلەنەدىن سەجادى، ۲۰۱۲، ۵۸۶] شايانى ئامازبە، زمانى كوردى تا دەرچوونى ئەم رۇژنامەيە، تەنبا زمانى گىتوگۇ و شىعەر بوۋە، نەك بوارە ھەمەلايەنە كانى تىرى نووسىن. بۇيە ھاتنە كايەى ئەم رۇژنامەيە، جگە لى بوارە رۇژنامە گەربىيە كى لى بارەى مېژوويىشەۋە بۇ زمان و وئۆزى كوردى گىرنگى و بايەخىكى تايىبەتتى ھەيە. [كەمال فواد، ۱۹۷۲، ۱] چونكە ھەر لىم كاتە بە داۋاۋە زمان و وئۆزى كوردى، چوارچىۋە و قۇناغىكى تىرى بە خۇيەۋە بىنىبۇە. ئەمەش نەك ھەر لى كورد، بەلكوۋ لى سەر ناستى مىللەتانى جىهان بە گشتى بۇ بلأوبوۋنەۋە و جموجۇل و گەشانەۋەى بەرھەممە وئۆزىيە كان، رۇژنامە ھەمىشە سەكۆيە كى كارىگەر بوۋە. [عەزىز گەردى، ۱۹۸۷، ۹] لى دەر كىردى ئەم رۇژنامەيە دا، ۋەك سەرھەتاي رۇژنامە گەربى زۇربەى مىللەتان، دەستەيەك لى نووسەران و شاعىران ھاۋكاربوۋنە. ھەرۋەھا لى ناۋەرۇكى ئەم رۇژنامەيە دا، لى تەك بابەتە كانى ۋاتارى كۆمەلايەتتى، مېژوويى، رامىيارى و دەنگوباس، شىعەر رەنگدانەۋەى بەرچاۋى ھەبوۋە، بە تايىبەتتى شىعەرە كانى (ئەحمەدى خانى ۱۶۵۰-۱۷۰۶ز) و (حاجى قادى كۆيى ۱۸۱۷-۱۸۹۷ز). [عەبدوللا زەنگەنە، ۲۰۱۰، ۶۰] ھەرۋەھا ئەم رۇژنامەيە بوۋە دەسپىنكىك بۇ بەدۋا داھاتنى چەندان رۇژنامە و كۇۋارى تىرى كوردى پەيۋەست بە وئۆزۋە. ۋەك رۇژنامە كانى: (كورد ۱۹۰۸ز، كوردستان ۱۹۰۸ز، تىگەيشتىنى راستى ۱۹۱۸ز، پىشكەۋەتن ۱۹۱۹ز، بانگى كوردستان ۱۹۲۲ز... ھتد) و كۇۋارە كانى: (رۇژى كورد ۱۹۱۱ز، كوردستان ۱۹۱۲ز، ھەتاۋى كورد ۱۹۱۳ز، بانگى كورد ۱۹۱۴ز، زارى كرمانجى ۱۹۲۶ز، ديارى كوردستان ۱۹۲۵ز... ھتد). جگە لى ۋەش ھەر خودى (داھىتان و بە كارھىتانى زاراۋەى (رۇژنامە) لى برى (غەزەتە، قەزەتە و گازىتا) ى ئەۋرۇپايى و توركى و (جرىدە) عەرەبى، دەگەرپتەۋە بۇ شاعىرى گەۋرەى كورد (حاجى قادى كۆيى ۱۸۱۷-۱۸۹۷ز) كە لى دىرە شىعەرئىكىدا دەلىت:

سەد قائىمە و قەسىدە، كەس نايكرى بە پولى

رۇژنامە و جەرىدە، كەۋتوۋنەتە قىمەت و شان) [جەمال خەزەندە، ۲۰۱۱، ۲۱]

هەر وەها هینانە کایەى زاراوەى (کۆوار)یش، لە برى (مەگەزىن)ى ئینگلیزى و (مجله)ى عەرەبى، لەلایەن (حوسین حوزنى موکریانى ۱۸۹۳- ۱۹۴۷ز) خاوەن و سەرنووسەرى کۆوارى (زارى کرمانجى ۱۹۲۶- ۱۹۳۲ز) داھێنراوە و بە کارھاتووە. [جەمال خەزەندەدار، ۲۰۱۶، ۱۷-۱۸] ئەمەش ئەو دەردەخات رەوتى رۆژنامە گەری کوردى ھەر لە سەرھاتو، نەوێک ھەر ئامرازێک بوو بۆ گەياندنى شاعر و ئاشناکردنى شاعیران بە جەماوەر، بە لکۆو بە شێوھە کى گشتى ئەو بنووسانەى لە نووسینى بابەتە ھەمەلایەنە رۆژنامەوانییەکان بەژدارییان کردووە، زیاتر وێژەوان و شاعیرانى سەردەمى خۆیان بوونە. واتە زیاتر لە ژێر کاریگەرى و ھەژموونى ئەم چىنانەو بوو، (نەک پەسپۆر و کادىرى بواری رۆژنامەنووسییەو. ھۆکارە کەشى بۆ نەبوونى ناوھند و دەزگای ئە کادىمى تايبەت بە بواردەو بۆ بەرھەمھێنان و پێگەياندنى رۆژنامەنووسى شارەزا و ئە کادىمى دەگەریتەو). [سەباح موسا، ۲۰۱۴، ۲۲۳] بۆیە زمانى رۆژنامەنووسى کوردى ئەوسا کەوتۆتە ژێر کاریگەرى وێژەى و تەنانەت نووسینە سیاسییە کانىش لەم کاریگەرییە بەدەر نیین و شێوازى وێژەیان بەسەردا زالە. [عەزیز گەردى، ۱۹۸۷، ۱۰] کەواتە زمانى رۆژنامەنووسى کوردى لە قۆناغەکانى پێشوودا، بە شێوھە کى گشتى زیاتر زمانى وێژەى ھاوینچ بە وشە و دەستەواژەى ئەندىشەبى و خوازەبى و شاعرئامێر، لەبەر ئەوێ ھەر وەک پێشتر ئامازەمان پێدا، ھۆیە کەى بۆ نەبوونى ئامرازەکانى ڕاگەياندن و کەسانى شارەزا لە پێشتردا دەگەریتەو. ئەمەش وەک دیاردەبە ک لە قۆناغە سەرھاتییەکانى رەوتى رۆژنامە گەری جیھانى بە گشتى بەرچاو دەکەوێت. واتە (ئەم دیاردەبە ھەر بە تەنیا رۆژنامەى (کوردستان)، یاخود چەند رۆژنامەبە ک ناگرتەو، بە لکۆو ھەر لە سەرھاتو، تا نیوێ یە کەمى سەدەى بیستەم، کە بەدەیان رۆژنامە و کۆوار بۆ وێژەو، بە شێوھە کى گشتى وێژەوان و شاعیران بەرپۆھیان بردووە). [Z (ھىمداد حوسین، ۲۰۰۸، ۱۹۶] ئەمەش بە ھۆکارى سەرە کى پەرەپێدان و برەدانى ژانرە وێژەبە کەن دادەنرێت. وەک لە (کۆوارى (رۆژى کورد ۱۹۱۳ز)، کە (۳) ژمارەى لە ئەستەمبۆل بۆ وێژەو، دەردەکەوێت، ئەو (چیرۆک)ى (فوادى تەمۆ) لە ژمارە (۱) - (۲) بۆ وێژەو، بە سەرھاتى چیرۆکى کوردى دادەنرێت. [عەزیز گەردى، ۱۹۸۷، ۱۰] ھەر وەھا ھەر (لەم (۳) ژمارەبە دا شیعەرى (نالى ۱۸۰۰- ۱۸۷۷ز، حاجى قادى کۆبى ۱۸۱۷- ۱۸۹۷ز، شێخ رەزا ۱۸۳۵- ۱۹۰۹ز، ئەحمەدى خانى ۱۶۵۱- ۱۷۰۷ز) بۆ وێژەو. [جەمال خەزەندەدار، ۱۹۸۱، ۲۹- ۱۱۵] کەواتە شیعەرى وەک ژانرێکى سەرە کى وێژە لە ڕاکیشانى سەرنجى خۆنەر و گرنگى پێدانى، ھەمیشە رەنگدانەو و کاریگەرى بەرچاوى ھەبوو. وەک ئاشکرايە، لە زۆرەبى ھەرە زۆرى رۆژنامە و کۆوارەکاندا لاپەرەبە ک، یاخود چەند لاپەرەبە ک بۆ بۆ وێژەو شیعەرى شاعیرانى پێشتر و سەردەم تەرخان کراوە، (بە تايبەتى شیعەرى نەتەوہبى و نیشتمانى، ئەمەش وەک ھەولێک بۆ بەرزکردنەوێ ناستى ھەستى نیشتمانى و ھۆشيارکردنەوێ کۆمەل لە پینا و مافى رەواى گەل، بەردەوام بوێرنا لە تێکۆشاندا بن). [کوردستان موکریانى، ۲۰۰۲، ۱۹] کەواتە بە سەرنجدان لە ئامرازە رۆژنامە گەریەکانى ئەو سەردەمە، بە شێوھە کى زەق ئەو دەردەکەوێت، کە وێژە و رۆژنامە گەری کاریگەرى بەرامبەرپیان بەسەر یە کەوہ ھەبوو و بە شێوھە ک ناوێزانى یە کتر بوونە، (ئەستەمە بەدەر لە ڕوانین و تینگەيشتن لە رەوتى جولانەوێ رۆژنامە گەری، بە وردى لە جولانەوێ وێژەى نوێ و ھاوچەرھمان بگەین. وەک دەگوتیت، وێژە و رۆژنامە گەری وەک دووانە کى یە ک پزدانن و لەیە ک دابى ناگرن). [مەحمود زامدار، ۱۹۸۷، ۲۳۲] بۆیە کاتێک تیشک دەخوێتە سەر مێژووێ گەشە و برەوى وێژە بە گشتى و بە تايبەتى شاعر، ناتوانیت رۆلێ سەرە کى و کاریگەرى ئامرازەکانى رۆژنامە گەری فەرماؤش بکړیت. لەبەر ئەوێ وەک دوو

ژانری ھاوینچ بە یەكەو، (لەرۆوی میژوویبەو و ژۆهوانانی كورد ھەمیشە رۆلی بەرچاو و کاریگەریان ھەبوو لە رەوتی رۆژنامەگەری كوردیدا، كاری رۆژنامەگەری ھاوتەریبە كاری و ژۆهوانان بوو، لە ھەمان كاتیشدا نامرازە رۆژنامەگەریبەكان ھەمیشە لە پێشكەوتن و گەشە و برەوی ژانرە و ژۆبەبەكان رێگەخۆشكەر بوونە). [نەرسەلان بابیز ئیسماعیل، ۲۰۱۳، ۵۸] بە تاییبەتی لە قۆناغە سەرئایبەكاندا، ھاوتەریب شاعیران ھەم لەم گەشە و برەو رۆلی بەرچاویان ھەبوو، ھەم بۆ دەرکەوتن و ئاشنابوونیشیان بە جەماوەر خێراترین نامرازی گەییەنەر بوونە.

یەكێك لەم شاعیرانە، مامۆستا (ھێمن موكریانی ۱۹۲۱-۱۹۸۶ز)یە، كە ناوی تەواوی (سەید موھەممەد ئەمینی شیخەئیسلامی موكری)یە. كات و شوینی لە دایكبوونی دەگەریتەو بە بۆ سالی (۱۹۲۱ز) لە گوندی لاچینی سەر بە شارۆچكەى مەھاباد. وەك زۆریەى خویندەواران و شاعیرانی سەردەمی خۆی، سەرەتای خویندنی لە حوجرە و خانەقاوہ بوو. لە خویندنگای میڕیشدا، تا پۆلی پینجەمی سەرەتایی خویندوو. ناسناوہ شیعیریەكەى (ھێمن) لەوہوہ ھاوتوو، كاتی وەك (۵۵) دەمین ئەندام بەیوہندی بە كۆمەلەى (ژێكاف ۱۹۴۲-۱۹۴۵ز) ھوہ دەكات و لەلایەن سەرپەرشتیارانی ئەم كۆمەلەوہ، ناوی نھیتی (ھێمن)ی بۆ ھەلەبژێرن و پاشان ھەر ئەم ناوہ دەبیتە ناسناوی شاعیریشی. [بەروانە: ھێمن موكریانی، ۱۹۷۴، ۳-۲۰] لەوہ بە داواہ ئەم ناوہ (ھێمن موكریانی)، ھەر زوو سنووری دەفەرەكەى دەبەزینیت و بە ھەموو ولادتدا بلاو دەبیتەوہ و وەك شاعیرێكى نەتەوہیی و نیشتمانی دەرئەكەوت.

### تەوہری دووہ: ھێمن موكریانی و رۆژنامەگەری

(ھێمن موكریانی) ھەر لە سەرەتای ئەزمونی شاعیریبەو، شیعرەكانی بەھوی نامرازەكانی رۆژنامەگەریبەو بەشیوہەكى بەرفراوان بلاو بوونەتەوہ و لە نیۆ جەماوەردا رەنگدانەوہی بەرچاویان ھەبوو. شایانی نامرازە، ئەو خێرا دەرکەوتن و ئاشنابوونەى بە جەماوەر و ژۆدۆستان، بە تاییبەتی لە پارچەكانی رۆژھەلات و باشووری كوردستان، تا سالی (۱۹۷۴ز) و چاپكردنی یەكەمین بەرھەمە شیعیری بە ناوینشانى (تاریك و روون)، بلاو كردنەوہى بەرھەمەكانى تەنیا بە ھۆی رۆژنامە و كۆوارەكانى ئەو سەردەمەوہ بوو. بە تاییبەتی ئەو شیعرانەى لە رۆژنامە و كۆوارەكانى سەردەمی (ژێكاف ۱۹۴۲-۱۹۴۵ز) و (كۆمارى كوردستان ۱۹۴۶ز) ھوہ، بلاو دەكرانەوہ، ھەرەك لە سەرھەم رۆژنامە و كۆوارەكانى ئەو سەردەمە، وەك: رۆژنامەى (كوردستان ۱۹۴۶ز) و كۆوارەكانى: (نیشتمان ۱۹۴۳-۱۹۴۴ز، ئاوات ۱۹۴۵ز، ھاواری كورد ۱۹۴۵ز، كوردستان ۱۹۴۵-۱۹۴۶ز، ھاواری نیشتمان ۱۹۴۶ز، ھەلەلە ۱۹۴۶ز، گرگالی مندالانى كورد ۱۹۴۶ز). شیعر و وتاری تیدا بلاو كردوونەتەوہ. لەم بارەبەوہ ھەر وەك خۆی لە نووسینێكیدا، بە ناوینشانى (ئەزمونی شاعیریم) تیشك دەخاتە سەر ئەو، كە یەكەمین شیعیری، شیعیركی سیاسییە و بە ناوێكى خواستراوہوہ لە گۆفاری گەلاوێژدا بلاو كردۆتەوہ. پاشان ھەر لە درێژى ئەم نووسینەیدا نامرازە بەوہش دەكات، كە دووہمین شیعیری لە سالی (۱۹۴۳ز) لە ژمارە (۲)ى كۆوارى (نیشتمان ۱۹۴۳-۱۹۴۴ز)دا بلاو كردۆتەوہ. [ھێمن موكریانی، ۱۹۸۳، ۱۹۳] شایانی نامرازە، سەبارەت بە یەكەمین شیعیری بلاو كراوہى، تەنیا نامرازى بە ناوی كۆوارەكە و ناوہرۆكى شیعرەكە كردووہ، كە شیعیركی سیاسییە. واتە ھیچ نامرازەكی بە ناوینشانى شیعرەكە و ناوہ خواستراوہكە و ژمارەى كۆوارەكە نە كردووہ. بۆیە لە سەرھەم ژمارەكانى ئەم كۆوارە نەمانتوانى ئەم شیعرە دەستنیشان بكەین، كە

يه كه مین شيعرى ناوبراوه. ههروهه سەبارەت بە دووهمین شيعرىشى، هەر چەندە لەم نووسینەى ئاماژەى بە ناو و ناویشان نەداوه، بەلام ههروهك له ژماره (٢)ى كۆوارى نیشتمان دەرده كه وێت، دوو شيعرى تێدا بۆلۆ كراوه تهوه، يه كه ميان شيعرىكى ههوت دێرى بچ ناویشانه و به ناسناوى (م.ش.هيمن) و دووهميان شيعرىكى (٩) دێرى به ناویشانى (كوردمو....) و به ههمان ناسناوهويه. [م.ش.هيمن، ١٩٤٣، ١٣-١٧] بەلام دواتر ههردوو شيعره كه، يه كه ميان به ناویشانى (مهحكه مهى ئيستيقلال) و دووهميان به ههمان ناویشانى پيشوو له (ديوانى هيمن) دا جارێكىتر بۆلۆ كراونه تهوه. [هيمن موكرىانى، ٢٠١٢، ٢٨١، ٢٨٢] ههروهه نايب ئەوهشمان بېر بچیت (هيمن موكرىانى) هەر له سه ره تاوه هه م له بوارى راگه ياندى و هه م له كايه ي دهسته و كۆمه له روناك بيرييه كاندا رۆل و ئاماده يى بهرچاوى هه بووه. وه ك له م خالانه ي خواره وه روتتر دەرده كه وێت:

- له سه رده مى كۆمارى كوردستاندا، له به شى راگه ياندى كارى كرده وه. كه جگه له كۆوارى «نیشتمان» سه رجه م ئەو رۆژنامه و كۆوارانه ي ئاماژه مان پيدان، له چوارچۆيه ي ئەم به شه دا سه ربه رشتى كراون. [هيمن موكرىانى، ١٩٧٤، ٢٤]

- له رۆژنامه ي (كوردستان، چاپى تاران، ١٩٥٩-١٩٦٣ز)، كه (٢٠٩) ژماره ي لى دەرچوه، چەندان شيعر و وتارى تێدا بۆلۆ كرده و ته وه. [مهحه مه د حه مه باقى، ٢٠١٣، ٤٣٨]

- له كوردستان و عێراق، به تايه تى له به غدا له سالانى (١٩٧٠ز) ي به دواوه به ژدارى كارا و بهرچاوى له كۆر و كۆمه له و ناوه نده وێژه ي و روناك بيرييه كانى وه كو، (يه كى كى نووسه رانى كورد، كۆمه له ي رۆشن بيري كوردى، كۆر ي زانبارى كورد، ده زگاي رۆشن بيري كوردى) يدا هه بووه و چەندان شيعر و تار و لى كۆلێنه وه ي له رۆژنامه و كۆواره كورد بيه كانى ئەو كاته بۆلۆ كرده ته وه. له رۆژنامه ي (كوردستان) ي ئۆرگانى (حيزبى ديموكراتى كوردستان- ئيران)، ده وه ي سېپه م، له (به غدا ١٩٧١ز) ي به دواوه، بهرپرسى به شى وێژه يى بووه و چەندان شيعر و وتارى تێدا بۆلۆ كرده ته وه. [عوسمان ده شتى، ٢٠٠٩، ٣٤، ٣٥]

- كۆوارى (سروه) ي دەر كرده وه، كه كۆوارى كى مانگانە ي فه ره نگی، وێژه يى و كۆمه لايه تى بووه و يه كه م ژماره ي له به هارى (١٩٨٥ز) ي له شارى ورمى دەرچوه، تا كۆچى دوايى له نيسانى (١٩٨٦ز) سه ربه رشتى كۆواره كه ي كرده وه. [مارف خه زنده ار، ٢٠٠١، ٤٢٤]

لێرده به سه رنجدان لەم زانبار بيه انە ي خستمانه روو، ئەوه مان بۆ دەرده كه وێت، (هيمن موكرىانى) هەر له سه ره تاي گه نجى و ئەزموونى شاعير بيه وه، بۆ گه ياندى و بهرودانى مه به ست و په يامه كانى سه كۆي رۆژنامه گه رى هه لېژاردوه، كه زياتر خۆيان له شيعرى نه ته وه يى و نيشتمانى دنوێتن. هەر به م هۆيه شه وه وه ك ناوێكى ئاشنا و ديار، ئاسا نووسين و شيعره كانى به نيو جه ماوه ردا به شيويه كى وا خيرا بۆلۆ بيه تيه وه و پێز و پايه كى بهرز به تايه تى له به شه كانى رۆژه لآت و باشوورى كوردستان ده سه بهر بكات، هه ميشه شيعره كانى له ته رازووى وێژه ي كورديدا، سه نگ و پينگە ي بهرچاويان هه ييت و جگه له جه ماوه ر و خۆنه رى ئاسايى، له لايه ن وێژه وانان و شاره زايان بيه وه مايه ي سه رنج و تيرامان بيت به شيويه كى هه مه لايه نانه تيشكى بخريته سه ر و نه نجامى جيا جياي له بهر ژه وندى و پيشكه وتنى زياترى وێژه ي كوردى لى هه لېه ينجريت و ده روازه ي تازه ش بۆ رامان و لى كۆلێنه وه ي زياتر و ده رختنى رۆل و به هاي شيعره كانى ده ست نيشان ياخود فه راهه م بكات. ئيمه ش هەر لەم سۆنگه ييه وه تيشك ده خه ينه سه ر يه كى كى

لهم لایه نانهی که تاکو ئیستا به شیوه کی ورد تیشکی نه خراوته سهر، که بریتیه لهو شاعرانهی له رۆژنامه و کۆواره کاندایا و کۆراونه تهوه. به تایبهتی لهو شاعرانهی له سهرجهم دیوانه چاپکراوه کانیدا نیین. ههروهها له لایه کی تریشه وه ههلوسته ده کهین، بۆ دهرخستنی لهو جیاوازیانهی که له نیوان دهقه شیعریه کانی نیو رۆژنامه و کۆواره کان و دیوانه چاپکراوه کانیدا به دیده کرت. واته جگه له خستنه پرووی سهرجهم شیعره کانی نیو لهو رۆژنامه و کۆورانهی تیشکیان ده خهینه سهر، ههروهها له گه له دهقه کانی نیو سهرجهم دیوانه کانبی به راوردییان ده کهین. لهو دیوانانه شی له بهر دهستان دان، بریتین له: (تاریک و پروون ۱۹۷۴ز، نالهی جودایی ۱۹۷۹ز، بارگهی یاران ۲۰۰۶ز، دیوانی هیمن ۲۰۱۲ز، سهرجهم و کۆی شیعریه و پهخشانه کانی ماموستا هیمن ۲۰۱۷ز). شایانی ناماژیه، به هۆی له وهی له سهرچاوهیهی دوایی تازهترین به رهه می چاپکراوی ناوبراوه، بۆیه نمونه وهرگیراوه کانمان به به شه دیوانه کهیه وه، به راورد کردووه. بۆ له مه به سهستهش دوو هۆکاری سهره کی بوون به دهروازهیه ک بۆ لیکۆلینه وهیه کی وهها له م بارهیه وه:

یه کهم: شاعیر، له دیداریکیدا، که له لایهن (کۆراری ماموستای کورد ۱۹۸۵-۱۹۹۶ز) وه له گه لیدا سازدراوه. له وهلامی پرسپاریک، سهبارته بوونی سانسۆر له کاتی چاپکردنی دیوانه کانیدا، به تایبهتی له دیوانی (تاریک و پروون) دا. له م بارهیه وه به راشکاوانه و نیگه رانییه وه، ناماژه به بوونی سانسۆری کهسی و حیزبییه وه ده کات. [هیمن موکریانی، ۱۹۹۲، ۳۸] له مهش وای کرد، بگه پینه وه سهر له وه دهقه شیعریانهی بهر له چاپکردنی دیوانه کانی له رۆژنامه و کۆواره کاندایا و کۆراونه ته وه.

دووهم: به هۆی به دوادا چوونمان، هم له کتیبی (پاشه رۆک)، هم له وه سهرچاوانه ی لیکۆلینه وه، یاخود وتاریان دهربارهی شاعیر نووسیوه. چهند پارچه شیعریک، یان کۆپلهیه ک، یان دیریکمان بهرچاو کهوت، که له هیچ یه کینک له دیوانه کانیدا چاپ نه کراون. وه ک له خواره وه ناماژه بهو کتیب و سهرچاوانه دههین:

۱- پاشه رۆک: ناویشانی کتیبیکه، دانراوی خودی شاعیره، که چهند بابته و لیکۆلینه وه و چیرۆکیک له هۆ ده گرت. ههروهها له کۆتا به شی له م کتیبه چهند شیعریکی تازهی تیدایه و پاشان له دیوانه کانی تری جاریکی تر بلاو کراونه ته وه. به لام له بهرگی داوهی کتیبه که، له چوارینه یه ی خواره وهی تیدایه، که له دیوانه کهیدا بلاونه کراوته وه. [هیمن موکریانی، ۱۹۸۳]

تاقه داری، کزی، پیری، عه و دال دیمه نی، هیمنی هینامه خه یال  
وه کو لهو تاک و تهریک له م لیترا غهیری سویرناوی گراو نهیچیترا

۲- چریکهی چیا و سترانی شاعیران: کتیبیکه له کۆکردنه وه و ناماده کردنی (مهحمود زامدار)، کۆمه له شیعریکی کۆکراوهی شاعیرانی کورده. شیعریکی (۴۳) دیری (هیمن موکریانی) تیدایه، به ناویشانی (مهزنی کورد)، که له دیوانه کهیدا نییه. لیژده له بهر دیرتزی شیعره که، ته نیا ناماژه به دیرتزی یه کهم و کۆتایی دههین:

۱- لهو ده مهی را که کاوه کوتکی وه شانند میشکی زوحاکی کورد کۆزی پرتاند

۲- خۆینه داشتوویه داری نازادی هات به دوا ی شینی نیوه، شادی [مهحمود زامدار، ۲۰۰۳، ۷۴-۷۸]

۳- بارزانى لە وێژدانى رۆژھەلاى كوردستاندا: بەرگى يەكەمى ئەم كتیبە، كۆكراوى كۆمەلە شیعەرىكى شاعیرانى رۆژھەلاى كوردستانە و لە كۆکردنەوه و ئامادەکردنى (حەسەنى دانیشفەر)ە. شیعەرىكى بى ناونیشانى (هێمن موكریانى) تێدايە، كە لە (۱۸) دێر پێكدیۆت و لە دیوانەكەیدا نییە. یەكەم دێر و كۆتا دێرى بەم شێوەیە خوارەوهیە:

۱- وێنەكەت گەیشتە دەستم و روون بۆوه چارى من

ساپۆژ بوو زامى كۆن و برینى هەناوى من

۲- تاكوو قەلەم برشتى هەبى هەر دەكەم خەبات

تاكوو قەدەم برستى هەبى دیم بەرەو نەجات [حەسەنى دانیشفەر، ۲۰۰۳، ۷۱]

لە بارى ئەم شیعەرەوه (عەبدوللا حەسەزادە) لە دیوانەكەدا ئەوه دەخاتەروو، كە كاتى خۆى (هێمن) وێنەكەى (بارزانى) بە دەست گەیشتوووه و ئەم شیعەرى لە بارەوه نووسيووه. هەرودها هەر لەم دیوانەكەدا تیشك دەخاتەسەر شیعەرىكى ترى لەم بارەوه بە ناونیشانى (كاوهى مەزن)، كە مەبەست لێى ئەو شیعەرە، كە پێشتر ئاماژەمان پێدا لە (چریكەى چیا و سترانى شاعیران)، بە ناونیشانى (مەزنى كورد) بلاو كراوتەوه و بۆ هەر یەكێكیشیان ئاماژە بە چەند دێرىك دەكات. جگە لەمانەش جیاوازی نیوان چەند دەقه شیعەرىكى نیو رۆژنامەى (كوردستان)ى سەردەمى كۆمار و سەرچەم دیوانەكانى دەخاتەروو. [خالید محەمەدزادە، ۲۰۱۳]

۴- هێمن دەربارى ناوهرۆكى سیاسى و كۆمەلایەتى شیعەرەكانى: كتیبەكە لە نووسینى (د. عوسمان دەشتى)یە، كە لە بنەرەدا ماستەر نامەكەیتى. لە بەرگى دواوهى ئەم كتیبەدا بى ئەوهى ئاماژە بە هیچ سەرچاوهیەك بكا، شیعەرىكى چواردێرى تێدايە، بە ناونیشانى (دوژمنى جوان)، كە لە هیچ یەكێك لە دیوانەكەیدا نییە. ئەمەى خوارەوه دێرى یەكەم و كۆتاكەیتى:

۱- لە نیو گولان دانیشت و ونبوو لە من ئەم گولانەم لى بوونە دیو و دوژمن

۲- ئەم دەسووتى، ئەو دەنالی و براوه من دەمینم، من تووشى دەرد و ژانم [عوسمان دەشتى، ۲۰۰۹]

۵- هێمن و بۆنى غەریبى: كتیبەكە لە نووسینى (محەمەد فەریق حەسەن)، لەم كتیبەدا نووسەر لە گێزانەوهیەكدا، بە ناونیشانى ((كفتوگۆیەك لە گەل هێمنى موكریانیدا))، لە رێكەوتى ۶-۷-۱۹۷۶ز لە (یانەى مامۆستایانى سلیمانى). دەلیت: (لە بارى شیعەر گوتن بۆ (ئومەم) ئەم دوو كۆیلە شیعەرى (بۆ جەزائیر و بۆ كۆریا)ی لەبەر بۆ وتم، كە لە هیچ كام لە دیوانەكانیدا نیین و بریتین لەمانەى خوارەوه:

۱- بۆ جەزائیر

ئەو گەلەى كێژى وەك جەمیلەى بى

كە نەترسا لە بەند و حەبس و دار

جا چلۆن نا بەزینى زۆردارى

جا چلۆن نا تەزینى ئیستیعمار؟

## ۲- بۇ كۆريا

بۆم مەنئە گويدىرتى مانگر و كورتانى خوار  
 لئە هئىلكەم وئ مەدە و بۇمبا لەوئى ماوئە خوار  
 لەو پەرى دنياوہ دئيتتە ئەو ولاتە چى دەكەى؟  
 لۆردى ئەو روبا ئەتۆ لەو ولاتە چى دەكەى؟ [محەمەد فەرىق حەسەن، ۲۰۰۸، ۶۹، ۷۰]

۶- سۆزى غەربىيى و سى چامەى كوردى: لە نووسىنى (حەمەسالىح فەرھادى) يە، لەم كىتئەدا نووسەر ئاماژە بە چەند دئيرئىكى شىعەرى (دەسكەوتى خەبات) دەكات، كە پئىشتەر لە ديوانى (تارىك و روون) دا بلاو كراوئەتەوہ. بەلام ئەم دئيرەى خواروہ وەك خۆشى ئاماژەى پئىدەدا، لە ديوانە كەيدا نئىيە و بەلكو لە (گەشتى ژيانم) ى (مەسعود محەمەد) دا وەريگرتوہ.

كە شىعەرى تۆ نەبايە ھاندەرى كورد ئەويستا چۆل و ھۆل بوو سەنگەرى كورد  
 [حەمەسالىح فەرھادى، ۲۰۰۶، ۵۱]

۷- بە يادى مام ھئىمن: نووسىئىكى (د. فەرھاد شاكەلى) يە، لە (چەپكى گول چەپكى نئيرگىز) دا بلاو كراوئەتەوہ. نووسەر جگە لەوہى ھەر لە زارى (ھئىمن موكرىيانى) يەوہ، جىاوازى نئىوان ئەم دوو دئيرەى خواروہ دەخاتە روو، كە دئيرەى يە كەمىيان لە شىعەرى (نالەى جودايى) بلاو كراوئەتەوہ. بەلام لە بنەپەتدا دئيرەى دووہم راستە كەيەتتى و دئيرەى يە كەم دەستكارى كراوہ.

۱- ئەو كەسەى خواردى و لەبن سئبەر رما شەو بە نىيازى كەيف لە مالى خۆى نەما  
 ۲- ئەو كەسەى خواردى و لەبن سئبەر كەوت شەو لە بۇ كەيفى لە مالى دەر كەوت

ھەر وەھا لە دئيرەى نووسىنە كەيدا ئاماژە بەم دئيرەى شىعەرى خواروہ دەكات، كە بۇ شەھيد بوونى (شىخ نوورى) نووسىوئەتتى و لە ديوانە كەيدا بلاو نە كراوئەتەوہ.

- نالى لە كوئى بئىنى كە پاتەختى شارەزور

ئەستئيرە كانى رادە كئشىن وەك شەھابى نور [مامۇستا ھئىمن، ۱۹۹۹، ۱۷۸، ۱۷۹]

۸- ھەلبەستى سوورپى دەوران: نامىلكەيە كە لەلايەن (فاروق فەرھاد) ئامادە كراوہ، برىتئىيە لە چىرۆكە شىعەرى (سوورپى دەوران). ھەر چەندە ئەم شىعەرە پئىشووئەر لە سالى (۱۹۷۹ز) لە ديوانى (نالەى جودايى) دا، رپئكەوتى (۱۹۷۸ز) لەسەرە و (۳۱۶) دئير لەخۆ دەگرئت، پاشانىش لە سەر جەم ديوانە كانيدا بە ھەمان شئوہ بلاو كراوئەتەوہ. بەلام ئەوہى جئى سەرنجە بە ھەر اوئرد لە گەل دەقە كەى نئو ئەم نامىلكەيە، جگە لە شوئنگۆر كئى چەندان دئير و جىاوازى وشەيى، كرتاندىنى چەند دئيرئىكىش بەدى دەكرئت. [بروانە: فاروق فەرھاد، ۲۰۱۷] شايانى ئاماژەيە، دەقە كەى نئو ئەم نامىلكەيە، لە بنەپەتدا تۆمارئىكى دەنگى خودى (ھئىمن موكرىيانى) يە. ھەر وەك دواى خويئندەوہى تەواوى شىعەرە كە، كە (۳۳۴) دئيرە و لە كوئاييدا جگە

ئامازەدان بە رېڭكەوتى تۆمارەكە، كە لە (۱-۲-۱۹۷۷ز)یە، ھەرھەما ئامازە بە ناوی كەسێك دەكات، بە ناوی (براژنە خەجیج)، كە ئەو تۆمارە دەنگییهى پێشكەش كردوو. [مەلەبەندى ھونەرى ماملی، ۲۰۲۰] بەمەش جیاوازی نیوان ھەردوو دەقەكە، واتە دەقى نیو تۆمارە دەنگییه كە و دەقى نیو دیوانەكانى، لە پرووی ناوەرۆك و ژمارەى دێرەكان و رېڭكەوتى نووسینیان پرونتەر دەرەكەوێت. لە پرووی جینگۆر كێ و جیاوازی وشەییەو، وەك لەم نمونانەى خوارووە دەرەكەوێت، ئەم دوو دێرە لەسەر جەم دیوانەكانییدا، ئاوا ھاتوو:

- ۱- لەبارى، نازەنینى، كۆلمە ئالى  
 نىگارى، دل رڤىنى، چاو كەژالى  
 ۲- لە سوێى ئەو شۆخە ئۆقرەى لى برا بوو  
 لە ژیندا ژان و ئىشى پى برا بوو

كەچى لە تۆمارە دەنگییه كە ئاوايان دەخوینتەو:

- ۱- نىگارنىك، دل رڤىنىك، كۆلمە ئالىك  
 لەبارنىك، نازەنىنىك، چاو كەژالىك  
 ۲- لە ژیندا ژان و ئىشى پى برا بوو  
 لە سوێى ئەو شۆخە ئۆقرەى لى برا بوو

ھەرھەما ئەو دێرانەشى لە سەر جەم دیوانەكانیدا نیین، ژمارەیان (۱۸) دێرە، كە بریتین لە دێرەكانى ژمارە: (۴۵، ۵۹، ۷۱، ۸۳، ۱۰۲، ۱۰۳، ۱۰۴، ۱۱۸، ۱۱۹، ۱۲۶، ۱۳۷، ۱۴۴، ۱۴۶، ۱۴۸، ۲۱۸، ۲۵۵، ۳۲۰، ۳۲۵) شایانى ئامازەیه دانانى ژمارەى دێرەكان بە پى ریزبەندى دەقى تۆمارە دەنگییه كە دانراون. لێردا بەھۆى زۆرپیانەو، تەنبا ئامازە بە یەكەم و كۆتا دێر دەكەین. واتە دێرەكانى (۴۵) و (۳۲۵)، كە ئەمانەن:

- ۱- لە كوێ بىزا لە دەم خوێلىنى دەرو  
 لە كوێ نىرگز لە رۆژیدا دەپشكو  
 ۲- كرىكار راپەرئى نامىنى مبرى  
 زولم شىپانەكەى بە قورئ دەگىرى

شایانى ئامازەیه ئەم چىرۆكە شیعەرە یەكێكە لە شاكارەكانى شاعیر و سەرچاوى ئەم كارە وێرەبە لە بەیتى فۆلكلورى مېللىدا ھاتوو. واتە دەچیتە ناو وێرەى مېللى نووسراووە. [مارف خەزەندە، ۲۰۱۰، ۴۶۳] ھەرھەما درێژترین شیعەرەتى و بەم شۆبەش بۆ كەسێكى دیارىكراو بە تۆماركراوى پێشكەشى كردییت.

بەشى دووم

تەوەرەى یەكەم: (ھېمن موكرىانى) و سەر جەم شیعەرەكانى نیو رۆژنامە و كۆوارەكان:

ھەر وەك لە بەشى یەكەمدا، ئامازەمان پىدا، كە (ھېمن موكرىانى) یەكەمین شیعەرى بە ناوێكى خواستراووە لە كۆوارى (گەلادىژ)دا بلاو كردۆتەو. بۆ ئەو مەبەستەش دواى گەران و پشكینیكى وردى سەر جەم ژمارەكانى ئەم كۆوارە، ھىچ شیعەرىكمان بەدى نەكرد، تا بتوانین بیسەلمینین، شیعەرى ناوبراوە. بەلام سەبارەت بەو رۆژنامە و كۆوارانەى ئامازەمان پىدا بوون، كە شیعەرى ئەویان بلاو كردۆتەو. ئامازە بە سەر جەمیان دەدەین و ھەلۆستەیان لەسەر دەكەین، بەتایبەتى ئەو شیعەرەنى لە دیوانەكانیدا نیین،

یاخود له گه‌ل ده‌قه‌کانی نیو دیوانه‌کانیدا جیاوازیبان هه‌به. هه‌روه‌ها جگه له‌وه‌ش له ئەنجامی گه‌ران و به‌دواداچوونمان له چهند کۆوارێکدا، تاک و ته‌را چهند ده‌قه شیعریکی تریشمان ده‌سکوت، که له‌سه‌رجه‌م دیوانه‌کانیدا بلأو نه‌کراوته‌وه و دواتر له‌گه‌ل ده‌قه‌کانی تری نیو پوژنامه و کۆواره‌کانی تر به‌پێی میژووی بلأو کردنه‌ویان ئاماژه‌یان پێده‌ده‌ین. واته میژووی بلأو کردنه‌وی شیعره‌کان ریزه‌بندی پوژنامه و کۆواره‌کان دیاری ده‌کن. که بریتین له‌مانه‌ی خواره‌وه:

یه‌که‌م: کۆواری نیشتمان (١٩٤٣-١٩٤٤ز): کۆوارێکی مانگانه‌ی رامباری، کۆمه‌لایه‌تی، وێژه‌یی بووه و وه‌ک زمانحالی کۆمه‌له‌ی (ژێکاف)، یه‌که‌مین ژماره‌ی (ته‌مموزی ١٩٤٣ز) ده‌رچووه. [هیمداد حوسین، ٢٠٠٨، ٥٨] هه‌رچه‌نده‌ سه‌رچاوه‌ی نووسین و بلأو کردنه‌وه‌ی له (مه‌هاباد) بووه، به‌لام له «ته‌ووێژ» به‌ نه‌پێی چاپکراوه. جگه له ژماره (٣، ٤) که به‌یه‌که‌وه ده‌رچووه. کۆتا ژماره‌شی، که ده‌کاته ژماره (٧، ٨، ٩) ی به‌سه‌ریه‌که‌وه له (مایسی ١٩٤٤ز) ده‌رچووه. [که‌مال مه‌زه‌هر ئەحمه‌د، ١٩٧٨، ٢٣] هه‌روه‌ها دوای نه‌مانی کۆماری کوردستان ژماره (١٠) ی له‌ سالی (١٩٤٨ز) له شاری (شارباژێر) ده‌رچووه، به‌لام ئەم ژماره‌یه له‌سه‌ر (نیشتمان) هه‌ژمار نا‌کرت، چونکه پاش نه‌مانی کۆمه‌له‌ی (ژێکاف) بووه. [جه‌مال نه‌به‌ز، ١٩٨٥، ٨٥، ٨٧] که‌واته ئەم کۆواره وه‌ک زمانحالی کۆمه‌له‌ی (ژێکاف)، ته‌نیا (٩) ژماره‌ی لی ده‌رچووه، له (٧) ژماره‌یاندای شیعری (هێمن موکریان) تێدا بلأو کراوته‌وه. که ئەمانه‌ن:

١- ژماره (٢)، ل ١٣: شیعریکی بچ ناو‌نیشان. هه‌روه‌ها شیعریکی تری به ناو‌نیشانی (کوردمو....)، ل ١٩. تێدا بلأو کراوته‌وه. ئەم دوو شیعره یه‌که‌میان به ناو‌نیشانی (مه‌حکه‌مه‌ی ئیسیق‌لال). دووه‌میان به هه‌مان ناو‌نیشانه‌وه له دیوانه‌که‌یدا، ل ٢٦٧، ٢٦٨، بلأو کراوته‌وه.

٢- ژماره (٣، ٤)، ل ٢٣-٢٤: شیعری (ئاخافتنی خوشک و برا). له (١٢) دێر پیکدی‌ت، به‌لام له دیوانه‌که‌یدا، به ناو‌نیشانی (وتووێژی کچ و کور، ل ٧٨)، (١٠) دێره و دێره‌کانی (٦، ١١) تێدا نین و ئەمانه‌ن:

- ١- تیکۆشه‌ بو خۆت تا‌کوو سه‌ره‌به‌ست یی  
عه‌بیه له‌بو‌ تو‌ دیل و ژێرده‌ست بی
- ٢- له‌ رێی نیشتمان به‌ هیوای خودا  
خه‌ریکی کار ببین با خوشک و برا

٣- ژماره (٥)، ل ١٦: شیعری (قه‌لای نیشتمان). (٩) دێره و له دیوانه‌که‌یدا (ل ٩٠)، (٧) دێره و دێره‌کانی (٤، ٨) ی تێدا نین و ئەمانه‌ن:

- ١- ئەتۆ نادهم به‌ جه‌ننه‌ت مستعیده  
له‌ بو‌ نشیو و تمام ئاو و هه‌وای تو‌
- ٢- بووه‌ یه‌زدانی بچ‌ چون لاکری من  
وتی ئەی نیشتمان گرتومه‌ لای تو‌

٤- ژماره (٧، ٨، ٩)، ل ٢٠: شیعری (کورده‌ گیان). له دیوانه‌که‌یدا (ل ٤١٣) وه‌ک خۆی بلأو کراوته‌وه. به‌لام هه‌ر له‌و ژماره‌یه له (٢١-٢٢) دا شیعریکی تری (١٥) دێری به ناو‌نیشانی (خه‌ونم دیت) بلأو کراوته‌وه و له دیوانه‌که‌یدا نییه و ئەمه‌ی خواره‌وه دێری یه‌که‌م و کۆتایه‌تی:

- ١- دوی شه‌وی هاته‌ خه‌ونم دایکی وه‌ته‌ن جلیکی ره‌شی

بوو له‌به‌ردا - وه‌کوو گۆل و بوو به لارووی گه‌شی

۲- کورده: ناخر به‌سه‌ ئه‌و به‌نده‌گه‌یه

مه‌رگ زۆر خۆشته‌ له‌و زینه‌گه‌یه

دوهم: کۆواری ناوات (۱۹۴۵ز): کۆوارنکی وێژهبی و میژووبی و کۆمه‌لایه‌تییه‌ بووه. یه‌که‌مین ژماره‌ی له (۲۲-۱۰-۱۹۴۵ز) بلاو‌کراوته‌وه. [عه‌بدو‌ل‌لا زه‌نگه‌نه، ۲۰۱۰، ۱۲۹] ئه‌م کۆواره‌ هه‌ر چه‌نده‌ نیاز و بووه‌ دوو هه‌فته‌ جارنک بلاو‌بکریته‌وه، به‌لام‌ ته‌نیا یه‌ک ژماره‌ی لێ دهر‌چوو و سه‌ر‌نووسه‌ره‌که‌شی (محمد‌ اذر) بووه. [هه‌یم‌داد حوسین، ۲۰۰۸، ۶۸] له‌م ژماره‌شدا شاعره‌نکی (هه‌یمن‌ای) تێدا بلاو‌کراوته‌وه، وه‌ک له‌ خواره‌و ناماژه‌ی پێده‌ده‌ین:

۱- ژماره (۱)، ۱۴ل، شاعری (کچه‌ لادینی)، (۱۷) دیره، به‌لام‌ له‌ دیوانه‌که‌یدا، ۹۶ل، (۱۵) دیره و به‌ ناو‌نیشانی (کیزی لادینی) بلاو‌کراوته‌وه، که‌ دیره‌کانی (۶، ۱۱) ی تێدا نیین و ئه‌مانه‌ن:

۱- گه‌رده‌نت وه‌کو مینای بلووره بی رۆژ و ماتیک لیبی تۆ سووره

۲- بی فر و فیل و پاک و خاوتنی کچینکی وه‌ک تۆ، پاکه‌ داوتنی

سێهه‌م: کۆواری هاواری کورد (۱۹۴۵ز): (یه‌که‌مین ژماره‌ی له (ره‌زه‌بری ۱۳۲۴) به‌رامبه‌ر (ئه‌یلول و تشرینی یه‌که‌می ۱۹۴۵ز) دهر‌چوو. به‌ دیرژ‌کراوه‌ی کۆواری نیشتمان داده‌نریت و زیاتر کۆوارنکی وێژهبی بووه. له‌ مه‌هاباد چاپ و بلاو‌کراوته‌وه و سه‌ر‌نووسه‌ره‌که‌ی (سه‌ید محمه‌د حه‌میدی) بووه. [هه‌یم‌داد حوسین، ۲۰۰۸، ۷۱] له‌م ژماره‌یه‌شدا دوو شاعری (هه‌یمن‌ای) تێدا بلاو‌کراوته‌وه و ئه‌مانه‌ن:

۱- ژماره (۱)، ۹ل، شاعری (گۆله‌ میلاقه و وه‌نه‌وشه)، (۱۸) دیره، به‌لام‌ له‌ دیوانه‌که‌یدا ۹۰ل، (۱۶) دیره و به‌ ناو‌نیشانی (ئه‌مه‌گی گۆلان) بلاو‌کراوته‌وه، واته‌ دیره‌کانی (۴، ۱۵) ی تێدا نیین و ئه‌مانه‌ن:

۱- وه‌ره‌ به‌ راستی وه‌لام‌ ده‌وه بۆته‌ به‌ گه‌ری سه‌ر دلم‌ ئه‌وه

۲- وه‌ک من رازی خۆم گه‌پراوه‌ له‌بۆت تۆش بگه‌په‌وه‌ بۆ من دهر‌دی خۆت

هه‌روه‌ها له‌م ژماره‌یه‌دا، ۱۸ل، شاعره‌نکی تری به‌ ناو‌نیشانی (قه‌ت نابه‌زم) تێدا، که‌ له‌ دیوانه‌که‌یدا، ۷۸ل، به‌ ناو‌نیشانی (کوردم ئه‌من) وه‌ک خۆی بلاو‌کراوته‌وه.

چواره‌م: کۆواری کوردستان (۱۹۴۵-۱۹۴۶ز): یه‌که‌مین ژماره‌ی له (۶ی دیسه‌مه‌بری ۱۹۴۵ز) دا دهر‌چوو. وه‌ک بلاو‌که‌ره‌وه‌ی بیری (حیزی دیموکراتی کوردستان)، کۆوارنکی وێژهبی، کۆمه‌لایه‌تی، سیاسی بووه. [ئه‌وه‌شیروان مسته‌فا ئه‌مین، ۲۰۰۷، ۱۶۳] (هه‌ر چه‌نده‌ ده‌گوتریت، (۱۸) ژماره‌ی لێ دهر‌چوو، به‌لام‌ تاكو ئیستا هه‌یج به‌لگه‌یه‌ک نییه، ئه‌وه‌ به‌سه‌لمی‌ت، که‌ ئه‌وه‌نده‌ ژماره‌یه‌ی لێ دهر‌چوو، به‌لکو تاكو ئیستا ته‌نیا (۷) ژماره‌ی له‌به‌ر ده‌سته). [عه‌بدو‌ل‌لا زه‌نگه‌نه، ۲۰۱۰، ۱۲۶] له‌م (۷) ژماره‌یه‌شدا، له‌ (۴) ژماره‌یه‌ماندا شاعری (هه‌یمن‌ای) تێدا بلاو‌کراوته‌وه.

۱- ژماره (۲)، ۷ل: شاعری (بژی دیموکرات). ئه‌م شاعره‌ به‌ هه‌ندی ده‌ستکاری وشه‌یه‌یه‌وه، بی

زياد و كەم لە ديوانە كەيدا، ل ۱۰۴ دا بۆلاو كراوتەتەو. ھەر ھەرا ھەر لەم ژمارەيەدا، لە (۱۷-۱۸) دا شيعرى (ھەل دەكەم)، كە (۱۴) دېرە و لە ديوانە كەيدا، ل ۲۶۹، (۱۳) دېرە، واتە دېرى (۳) ى تېدا نيبە و ئەمەى خوارەويە:

- رۆلەى كوردم لە ھيچ باكم نيبە رۆزى ھەرا  
سىمى خاردارى عەدوو وەك قانگلى موو ھەل دەكەم

۲- ژمارە (۴)، ل ۲۰-۲۱: شيعرىكى بى ناونيشانى (۱۱) دېرى تېدايە، لە ديوانە كەيدا نيبە و ئەمەى خوارەويە دېرى يە كەم و كۆتايەتى:

۱- جيژنەيە كاتى شادى و سرورە  
جيژنى تەشكىلى لەشكرى سوورە  
۲- گيانى پاك ھەميشە شادبى لىنين  
ھەر بژى و بەرقەرار بى ئىستالين

۳- ژمارە (۶، ۷)، ل ۴۷-۵۸: شيعرى (خۆ بەخت كردنى خۆرايى)، كە لە (۳۹) دېر پيكدىت. لە ديوانە كەيدا، ل ۱۷۸ دا بە ناونيشانى ( لە بىرم مەكە) بۆلاو كراوتەتەو.

پيئەجم: رۆژنامەى كوردستان (۱۹۴۶ز): وەك رۆژنامەيەكى وێژەيى و سياسىي زمانحالى حزبى ديموكراتى كوردستان و كۆمارى كوردستان، يە كەمىن ژمارەى لە (۱۱-۱۹۴۶ز) دەرچوو. ھەر ھەر دوو رۆژ جارنەك ژمارەيەكى لى بۆلاو كراوتەتەو و تا نەسكۆى كۆمار (۱۱۳) ژمارەى لى دەرچوو. [عەبدوللا زەنگەنە ، ۲۰۱۰، ۱۲۷] شايانى ئامازەيە ئيمە تەنيا (۹۲) ژمارەمان بەردەست بوو، لە (۱۸) ژمارەياندا شيعرى (ھيمن)يان تېدا بۆلاو كراوتەتەو، كە برىتىن لەمانەى خوارەويە:

۱- ژمارە (۲)، ل ۳: شيعرى (رۆزى شادى)، (۱۵) دېرە. وەك لەسەر شيعرەكە نووسراو: ((بە موناسەبەتى ھەل كوردنى ئالاي موقەددەسى كوردستان لە بۆكان گوتراو))، بەلام لە ديوانە كەيدا ل ۹۸ بە دەستكارىيەو، (۱۱) دېرە و دېرەكانى (۴، ۵، ۶، ۷) ى تېدا نيبىن و ئەمانەن:

۱- شاد بى و نازاد بى و سەربەست بى  
بى ئەوہى بخواتەو مەى مەست بى  
۲- ھەلپەرى و ديلان و حىندرھۆ بكا  
بەس فغان و شىەوہن و رۆرۆ بكا  
۳- پياو و ژن، كىژ و كور و پير و منال  
مالك و جوتير و ھەمال و بەقال  
۴- لىك دەبى ئەورۆ بكا شوكرى خودا  
پاك دەبى جيژنى بكا، نەزرى بدا

۲- ژمارە (۳) ، ل ۳: شيعرى (تۆم ھەر لە بىرە)، (۶) كۆپلەيە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ل ۹۵، ئەم سى كۆپلەيەى خوارەويە تېدا نيبە:

۱- لە كاتىكا كە گىژ و ويز و مەستم  
لە كاتىكا كە نويزى دادەبەستم  
كە ھەلديتم لەبۆ نيەت دوو دەستم  
ئەمن ئەى نىشتمان تۆم ھەر لە بىرە  
۲- زەمانىكى كە رادەبرم بەرى دا  
زەمانىكى كە رادەكشم لە جى دا

له شار و كوچه و كۆلان و دى دا  
 ۳- له عيشقى تۆ عهزىزم بوومه فههاد  
 چ سهر بهست بم چ ژېردهست بم چ نازاد  
 ئەمن ئەى نىشتمان تۆم هەر له بېره  
 چ غه مگىن بم چ مه جزوون بم چ دلشاد  
 ئەمن ئەى نىشتمان تۆم هەر له بېره

۳- ژماره (۱۰)، ۲: شيعرى (شانازى)، (۲۰) دېره و له ژېر ناونيشانى شيعره كه نووسراوه: (وهلام بۆ خاله مين)، له ديوانه كهيدا نيبه و دېرى يه كه م و كۆتايى ئەمانه ن:

۱- مهردى نه بهرد و شاعيرى بچ باك و چاك منم

رۆژى ههرا و كيشه و شهه سه ددى ناسنم

۲- ليم زيز مهبه عهزىزى دلّم خالى خۆشه ويست

شاگردى چووكى تۆم و كورى چاك و «هيمن» م

۴- ژماره (۱۲)، ۱، شيعرى (جېژنى نازادى)، (۳۱) دېره، بهلام له ديوانه كهيدا، ۲۷۲، (۳۰) دېره و دېرى (۱۹) ي تيدا نيبه، كه ئەمهى خواره وديه:

- كاتى داوخته، سهردهمى شادى گهوره نو رۆژه جېژنى نازادى

۵- ژماره (۱۸)، ۳، شيعرى (ره شه مه)، (۶) كۆپلهيه، بهلام له ديوانه كهيدا، ۱۰۷، (۴) كۆپلهيه، واته كۆپله كاتى (۵، ۶) ي تيدا نيين و ئەمانه ن:

۱- زه حمهت و كۆرهبهردى ديت و نه بوو هيچ وههز

مىلله تى كوردى نه بهردى به دلى مهردى نه بهز

ئاخيره لئه مه بهزى دوژمنى خوپرى بله وهز

كهى بهرى باز و هه لۆ ده گرى برا مېش و مه گهز

بويه ناييت بويه نايين كه ببين نو كه ر و ژېردهست ئەمه

۲- ئيمه قهوميكى نه جيبين و له ميژين و پاك

توند و كارامه و مهزبوت و به هيژ و چالاك

تازه نايديهن به كه سهى تاكو هه بيبن، بسى خاك

نامرى تاكو ئەبه د مىلله تى نازا و بيباك

چيان له ئيمه دهوى ئەو عاره ب و تورك و عه جه مه؟!

۶- (۲۰)، ل ۱، ۴، شيعرى (رؤيى خەم)، (۱۶) دېرە، بە ھەندى دەستكارىي وشەببەو، لە ديوانە كەيدا، ۱۰۶۷، بە ناويشاني (ھەتاوى ئىقبال) بلاو كراوئەتەو و (۱۱) دېرە و دېرە كانى (۳، ۸، ۹، ۱۲، ۱۴) ي تىدا نيين و ئەمانەن:

- ۱- داوئەتى گرتووە كىژ و كورپى كورد
- ۲- نەبەزى و سەررەقىي بە قەومى كورد
- ۳- چۆن لە ژيەدەستى و يەخسىرى دا
- ۴- خوا مەدەد كار بى دەكەن دوژمنە كان
- ۵- چونكو لايەنگرى مەزلومانە
- رېك و جوان ھەرەو كو غيلمان و حور
- بوو لە تارىخى جيهاندا مەشھور
- ھەل دەكا ميللەتى بيباك و غيور
- لە سنورى وەتەنى خۆيان دوور
- چونكو بو كوردى ھەزارە چاوسور

۷- ژمارە (۲۲)، ل ۲، شيعرى (تال و شيرين)، (۴۰) دېرە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ل ۹۶، (۳۳) دېرە و بە جياوازيبە كى زۆر و تىكچرژاوەو، بە ناويشاني (دواروژرى رووناك) بلاو كراوئەتەو. بۆيە بەھوى ئەم تىكچرژاويبەو تەنيا ئەم دوو دېرەى خوارەومان بو دەستنيشان كرا، كە بەرەھايى لە ديوانە كەيدا نين.

- ۱- لە كوردان كوشتيان بى سووچ و تاوان
- ۲- ئەوانە كىوى و ديو و درنج نيين
- ھەزارى وەك (سمایل ئاغای سمكو)
- ئەوانەش ئادەمیزان ئيدى خۆ

۸- ژمارە (۲۴)، ل ۶، شيعرى (ژياني نازادى)، (۱۳) دېرە و لە ديوانە كەيدا نيبە و ئەمەى خوارەو بە كەم و كۆتا دېرە:

- ۱- ئەوئستاكە بەكوئرى چاوى دوژمن
- ۲- بژى ياخوا سەرۆكى بەرزى گەورە
- لە ھەر لايىكى كورد گرتويە جیژن
- ئەوئستە بۆتە وئردى زارى «ھيمن»

۹- ژمارە (۲۵)، ل ۱، شيعرى بى ناويشاني (۲۶) دېرى تىدايە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ل ۱۰۲، بە ناويشاني (رېبەندان و شاعير)، (۲۳) دېرە، كە دېرە كانى (۲۰، ۲۱، ۲۲) ي تىدا نيين و ئەمانەن:

- ۱- گەرۆك ساز دەكا و رپى ئيسفالت دەكا
- ۲- مەكتەب دادەنى و ھەكیم و دكتۆر
- ۳- نايەلن چيدى كوردى بەستە زمان
- بە ھەموو كارى ولات را دەكا
- لە كوردستاندا دەبى فرە زۆر
- بە ھيلاك بچى بى داو دەرمان

۱۰- ژمارە (۲۸)، ل ۱، شيعرى (رپى پيشكەوتن)، (۸) دېرە و لە ديوانە كەيدا نيبە و ئەمەى خوارەو دېرى بە كەم و كۆتايە كەيەتى:

- ۱- دەزانی كورده رپى پيشكەوتنى تۆ
- ۲- بە كىژ و كور بخوينن چونكو زانين
- چيە ئىستاكە: من پيم وايە خوئندن
- شتىكى لازمە بو پياو و بو ژن

۱۱- ژمارە (۳۰)، ۲، شيعرى ( داىكى نىشتمان و ھېمن)، (۲۲) دېرە. لە دىوانە كەيدا، ۱۰۸، بە دەستكارىيە كى زۇرى وشەييەو (۲۰) دېرە و بە ناونىشانى (داىكى نىشتمان) بىلەن كراوئەتەو، واتە دېرە كانى (۴، ۱۳) تىدا نىين و ئەمانەن:

۱- سەر و پودراكى تۆ بۇچى بىلەن  
بەرۇكت بۇچى تا داوین دراو

۲- دە رۇزە چىژنى ئىستىقلالى كوردان  
دەگىرى و خۇشى و كەيفە لەبۇمان

۱۲- ژمارە (۳۴)، ۳، شيعرى ( جىژنە پىرۇزە)، (۹) كۆپلەيە لەژىر ناونىشانى شيعرە كەش، ئەم پىشە كىيەى نووسىيو: ((ھاوخوئە خۇشەويستە كان: لە جىژنى ونەرۇزدا لە سەفەردا بووم و نەمتوانى پروبەر وو جىژنە پىرۇزانەتان لى بەم، ئەوا بەو دەستە شيعرە جىژنە پىرۇزە لە ھەموو براىە كى ھاوخوئە و ھاونىشتمان دەكەم))، بەلام لە دىوانە كەيدا، ۱۰۹، بى ئەم پىشە كىيە، (۶) كۆپلەيە و بە جىاوازى و دەستكارىيەو، بە ناونىشانى (نەرۇزى رزگارى) بىلەن كراوئەتەو، واتە كۆپلە كانى (۵، ۶، ۸) تىدا نىين و ئەمانەن:

۱- لە زەويا بۆتەو مالات و دىارى داو، وىشك و تەر  
لەھەر لا دىتە گوئى ئەورۇ كە دەنگى زاوە ماكى مەر  
دەكا كورژن و حىلە ئەسپ و ماين گوچكەبى پىاو كەر  
ئەوا ھات مانگى خۇشى خاكەلپو و جەژنى نەرۇزە  
دەكەم لىتان برايانى وەتەن من جىژنە پىرۇزە

۲- لە خۇى داو بەرەلپىنە كچە كابانى گەردەن كىل  
دەكا مەست پىاو بە بۇنى مېخەك و عەتر و گوللا و ھىل  
بە لار و لەنجە ئەو شۇخە دەكا لاو و جىئىلان گىل  
ئەوا ھات مانگى خۇشى خاكەلپو و جەژنى نەرۇزە  
دەكەم لىتان برايانى وەتەن من جىژنە پىرۇزە

۳- كە ھىناى باى بەيانى بۇنى خۇشى گول لەلاى گولشەن  
دەبى عەتارە كان ئىو ھەموو دەر كى دوكان داخەن  
لەكن بۇنى ھەلالە بۇنى عەترە وەك ھەلال بۇ كەن  
ئەوا ھات مانگى خۇشى خاكەلپو و جەژنى نەرۇزە  
دەكەم لىتان برايانى وەتەن من جىژنە پىرۇزە

۱۳- ژمارە (۴۴)، ۱، شيعرى (ئاوونگى سوور)، (۱۳) دېرە و لە دىوانە كەيدا نىيە. لە ژىر ناونىشانى شيعرە كەش نووسىيوئەتى (بە موناسەبەتى رۇيىنى لەشكرى سوور گوتراو). ئەمەى خوارو دە دىرى يەكەم و كۇتايە كەيەتى:

- ۱- دویئیکه کاتی کازیوهی بهیان له خه و هه لسام رۆیم به گه ران  
 ۲- له وهی به داوهش قهت مهیکه له بیر هه یفه به ته نها کورد بیع یه خسیر

۱۴- ژماره (۴۸)، ل ۴ شیعری ( کورد و نازدربایجانی )، بهم پێشه کییه وه: (به مونا سه به تی یه کیکتی کورد و نازدربایجانی گوتراوه و له رۆژی ۶- ۲- ۲۵ دا له جزووری سه رانی ئه و میلیه ته دۆسته دا خویندراوه ته وه). پاشان به هه ندی ده ستکاری وشه ییه وه، له دیوانه کهیدا ل ۱۱۲، بلا و کراوه ته وه.

۱۵- ژماره (۶۲)، ل ۲، شیعری (خونچه ی خوینین)، (۲۰) دیره و له سه ر ناو نیشانی شیعره که نو سه راوه: ( شینی هیمن بو قاره مان خو شه وی خه لیل). ئه م شیعره له دیوانه کهیدا نییه و ئه مه ی خواره وه دیره ی یه که م و کو تا که یه تی:

- ۱- دویئێ ئیواری چوومه سه یر و گه شت تا بانگی شه وان گه رام کینو و ده شت  
 ۲- ئه و باغه جوانه ش خولدی به رینه جی په روه رشی خونچه ی خوینینه

۱۶- ژماره (۶۵)، ل ۲، شیعری (وه نه وشه و گو له میلاقه)، (۱۸) دیره، به لام له دیوانه کهیدا، ل ۹۰، (۱۶) دیره و به ناو نیشانی (ئه مه گی گولان) بلا و کراوه ته وه، واته دیره کانی (۴، ۱۵) ی تیدا نیین و ئه مانه ن:

- ۱- وهره به راستی وه لامم ده وه بو ته به گری سه ر دلم ئه وه  
 ۲- وه ک من رازی خۆم گپراوه له بو ت تو ش بگپه روه بو من ده ردی خۆت

۱۷- ژماره (۸۷)، ل ۲، شیعری (بلویری شوان)، (۱۲) دیره و به هه ندی ده ستکاری وشه ییه وه، له دیوانه کهیدا، ل ۱۱۱، بلا و کراوه ته وه.

۱۸- ژماره (۸۸)، ل ۳، شیعری (گول و بولبول)، (۱۲) دیره، به لام له دیوانه کهیدا، ل ۱۱۱، (۱۱) دیره و به ناو نیشانی (پیکه نیینی گول) بلا و کراوه ته وه. واته دیره ی (۱۱) ی تیدا نییه و ئه مه ی خواره وه یه:

- من بنیری به هه دیه و دیاری عاشقینکی هه ژار بو یاری

شه شه م: کوواری هه لاله (۱۹۴۶ز): (یه که مین ژماره ی له (ره شه مه ی ۱۳۲۴- ئاداری ۱۹۴۶ز) دا ده رچوه. کوواریکی سیاسی و وێژیه یی بووه و له لایه ن (حزبی دیموکراتی کوردستان) له بو کان ده رچوه، مامۆستا (هه سه نی قزلیچی) سه ره ره شتی کردوه و (۳) ژماره ی له ده رچوه]. [جه مال خه زنه ردار، ۱۹۷۳، ۵۱] له هه ر (۳) ژماره که دا شیعری (هیمن) ی تیدا بلا و کراوه ته وه و ئه مانه ن:

۱- ژماره (۱)، ل ۱۸، شیعری (به هاری زانین)، (۱۶) دیره و له دیوانه کهیدا، ل ۲۷۱، وه ک خۆی بلا و کراوه ته وه.

۲- ژماره (۲)، ۲۷-۲۵، شاعری (نامه‌ی لادیی بو شارستانی)، (۹) کۆپلەیه، له دیوانه‌که‌یدا، ۹۱ل، به ناییشانی (به‌هاری لادی) بڵاوکراوته‌وه.

۳- ژماره (۳)، ۲۴-۲۲، شاعری (شینى ژنه کوردیک)، (۲۸) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ۲۷۵ل، وه‌ک خۆی بڵاوکراوته‌وه.

حه‌وته‌م: کۆوارى هاوارى نیشتمان (۱۹۴۶ز): (یه‌که‌مین ژماره‌ی له (۲۱- ۳- ۱۹۴۶ز)، وه‌ک (بلاوکه‌ره‌وه‌ی بیرى ییکه‌تى جه‌وانانى دیموکرات) ده‌رچوو. کۆوارى ئىکى وێژى، سیاسى و کۆمه‌لایه‌تى بووه و له مه‌هاباد، له چاپخانه‌ی کوردستان چاپکراوه). [نه‌وشیروان مسته‌فا ئەمین، ۲۰۰۷، ۱۶۹] ته‌نیا یه‌ک ژماره‌ی لێ ده‌رچوو. له‌م ژماره‌یه‌شدا شاعری ئىکى (هێمن) ی تێدا بڵاوکراوته‌وه و ئەمه‌ی خواره‌ویه:

۱- ژماره (۱)، ۳۸-۳۸، شاعری (ده‌مه‌ته‌قه‌ی دوو خوێنمژ)، (۲۹) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ۲۷۳ل، وه‌ک خۆی بڵاوکراوته‌وه.

هه‌شته‌م: کۆوارى گروگالێ منداڵانى کورد (۱۹۴۶ز): یه‌که‌مین ژماره‌ی له (بانهمه‌رى ۱۳۲۵ به‌رامبه‌ر (شوباتى ۱۹۴۶ز)، له ژێر دروشمى (بیرى کارگه‌رانى چاپخانه‌ی کوردستان) ده‌رچوو. ته‌نیا سێ ژماره‌ی لێ ده‌رچوو و له‌لایه‌ن (مه‌لا قادری موده‌پرسى)، که له مه‌هاباد به‌رپۆه‌به‌رى چاپخانه‌ی کوردستان بووه، سه‌ره‌به‌رشته‌ی کراوه. [هێمداد حوسین، ۲۰۰۸، ۱۱۴، ۱۱۵] له‌م سێ ژماره‌یه‌دا له ژماره (۱)، شاعری (هێمن) یان تێدا بڵاو کراوته‌وه و ئەمانه‌ن:

۱- ژماره (۱)، ۷ل، شاعری (بو کچان)، (۳) دێره و له دیوانه‌که‌یدا نییه و ئەمه‌ی خواره‌ویه:

کچه کورد تۆش وه‌کو کاکت بخوێنه	له‌ خوێندن چاره‌کانم دامه‌میته
به‌رات محتاجی یاری دانسی	گه‌لێک پێوستی فیکری جوانی
له‌ کاکى خۆت که‌وى بخوێنه‌ داده	که‌ هه‌یوانه‌ هه‌چىکى بچ سه‌واده

۲- ژماره (۳)، ۵ل، شاعری (خودا)، (۷) دێره و له دیوانه‌که‌یدا نییه و ئەمه‌ی خواره‌وه دێرى یه‌که‌م و کۆتایه‌که‌یه‌تى:

۱- هه‌ر خودایه‌ که‌ فهد و بچ هه‌متا	پاک و بچوون و گه‌وره و دانا
۲- «هێمن» تا هه‌بچ زبانت تۆ	هه‌ر بلى (لا اله الا الله)

نۆیه‌م: رۆژنامه‌ی کوردستان (۱۹۵۹- ۱۹۶۳ز): رۆژنامه‌یه‌کى هه‌فته‌یى (سیاسى و زانیارى و وێژیه‌ی و کۆمه‌لایه‌ی)، یه‌که‌مین ژماره‌ی له (۶- ۳- ۱۹۵۹ز) له تارانى پایته‌ختى ئێران، به سه‌ره‌به‌رشته‌ی

(عبدالرحميد بهديع زهماني) دەرچووه، تا نيساني (۱۹۶۳ز) بهردووم بووه، لهو ماوهيهدا (۲۰۹) ژماره‌ی لئ دەرچووه. [محهمد باقي، ۲۰۱۳، ۴۳۴] وهك له خواروه ئاماژهي پيندهدين، له (۲۵) ژماره‌ی ئهم رۆژنامهيه شيعري (هيمن)يان تيدا بلاو كراونه‌تهوه و ئهمانهن:

۱- ژماره (۷)، ل، شيعري (كچي مه‌هاباد)، (۱۱) ديره، به‌لام له ديوانه‌كهيدا، ل، ۱۱۹، جگه له جياوازي وشه‌يي، (۸) ديره. واته ديره‌كاني (۳، ۷، ۸) ي تيدا نيين و ئهمانهن:

۱- له كوئ وهك من ده‌زاني: چهند شيرين و رها سووكي،

كه‌سيكي توئ له رئ بازا، له‌ژير چارشيو رهدا، دي؟

۲- ئه‌سيرو ئالقه‌ي زنجيري باسكي توئه دل، ئه‌ي گول!

نه‌يينئ ئه‌و ئه‌سيرو، تازه، رهنكه، رهنكي ئازادي

۳- له بيرته ئه‌و شه‌وه‌ي بۆم هاتيه‌ي ژواني به‌ته‌نيابي

گوتم: خوشت دوه‌يم گيانه؟! بزته هات و گوتت: ئادي

۲- ژماره، (۱۲)، ل، شيعري (بانهمه‌ر)، به‌شي به‌كه‌م.

۳- ژماره، (۱۳)، ل، شيعري (بانهمه‌ر)، به‌شي دوه‌م.

۴- ژماره، (۱۴)، ل، شيعري (بانهمه‌ر)، به‌شي سييه‌م. ئهم شيعره له ديوانه‌كهيدا، ل، ۱۲۰-۱۲۶، به

ناونيشاني (به‌هاري كوردستان) بلاو كراوته‌وه.

۵- ژماره، (۹۳)، ل، شيعري (به‌هاري بئ خه‌زان)، (۱۲) ديره، له ديوانه‌كهيدا، نيهه و ئهمه‌ي

خواروه ديري به‌كه‌م و كوئتايه‌تي:

۱- له سايه‌ي لوتفي بئ حه‌ددى خوداوه‌ند

۲- ((الهي))! سه‌لته‌نه‌ت هه‌ر به‌رده‌وام بئ شه‌هه‌نشاهي مه‌زن هه‌ر شادكام بئ

۶- ژماره (۹۵)، ل، ۹، شيعري (رۆله‌ي ماد)، (۲۴) ديره، له ديوانه‌كهيدا، نيهه و ديري به‌كه‌م و

كوئتايي ئهمه‌ي خواروه‌يه:

۱- كورده! تو رۆله‌ي دليراني

۲- به‌و هه‌موو زيپك و غيره‌ت و هيژه وه‌ته‌ني ئاريا پارا‌رزه

۷- ژماره (۹۶)، ل، ۹، سئ شيعري (هيمن) ي تيدا بلاو كراوته‌وه و ئهمانهن:

۱- شيعري (زيپكي شاهانه)، (۹) ديره و له ديوانه‌كهيدا نيهه و ئهم دوو ديره‌ي خواروه به‌نموونه:

۱- ساقیا لێوئالێه‌که‌ی چاوک‌الێه‌که‌ی ئه‌برۆ که‌وان

بمده‌رێ جامی شه‌رایی نابێ ره‌نگی ئه‌رخه‌وان

۲- خاوه‌نی بیڕنکی روونه، صاحبی عه‌زمی قه‌وی

هیممه‌تی ئه‌و بوو، ته‌می نگه‌به‌ت له‌سه‌ر ئیمه‌ ره‌وی

۲- شیعری (دلی شاعیر)، (۲) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۹۲، وه‌ک خۆی ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۳- شیعری (خونچه‌ی سیس)، (۱۲) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۳۱، وه‌ک خۆی ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۸- ژماره (۹۷)، ل ۳، ۱۸، شیعری (به‌هاری لادێ)، (۱۳) کۆپله‌یه و له ژێر ناوینشانه‌که‌یدا نووسیبویه‌تی: ((ته‌م شاعرانه‌م له جوابی نامه‌ی دۆستیکم دا نووسیه‌)). له دیوانه‌که‌یدا، ل ۹۱، ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۹- ژماره (۹۸)، دوو شیعری (هێمن) ی تێدا ب‌لاو کراوه‌ته‌وه و ئه‌مانه‌ن:

۱- شیعری (گریانی نیوه‌شه‌و)، ل ۳، (۹) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۲۹، وه‌ک خۆی ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۲- شیعری (کۆچی یار)، ل ۶، (چوارینه) و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۳۸، وه‌ک خۆی بووه به‌ چواره‌مین کۆپله‌ی شیعری (موو ناپسینم).

۱۰- ژماره (۱۰۷)، ل ۴، ۹، شیعری (چاره‌نووسی شاعیر)، (۸) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۴۰، به‌ هه‌ندی ده‌ستکارییه‌وه، ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۱۱- ژماره (۱۲۲)، دوو شیعری (هێمن) یان تێدا ب‌لاو کراوه‌ته‌وه و ئه‌مانه‌ن:

۱- شیعری (ماچی شیرین)، (۷) دێره و له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۴۳، وه‌ک خۆی ب‌لاو کراوه‌ته‌وه.

۲- چوارینکه، که له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۹۲، به‌ ناوینشانی (ته‌رجه‌مه له ئه‌نوه‌رییه‌وه)، ب‌لاو کراوه‌ته‌وه، به‌لام له رۆژنامه‌که‌دا، ل ۴ به‌م شیویه‌ی خواره‌وه ب‌لاو کراوه‌ته‌وه:

(( ناوالیکم دوو شیعری - ئه‌نوه‌ری - بۆ خویندمه‌وه، که:

هر بلائی کر آسمان آید      گرچه بر دیگران قضا باشد

بزمین نا رسیده می‌رسد:      خانه‌ی انوری کجا باشد؟

چونکه وه‌صفه‌لحالی برای خۆتان بوو، ویستم وه‌ری گێرمه‌وه سه‌ر کوردی و بو‌تانی بنێرم، وه ئه‌وا، وام به‌سه‌ر هینا:

هر به‌لایینک له ناسمانه‌وه بێ      با، له‌ویش را نه‌هاتبێ بۆ من

که گه‌یشه‌ زه‌وین، ده‌کا پرسیار      ئه‌ری له‌ کوێ یه‌ مالی کاک (هێمن؟)

۱۴- ژماره (۱۲۳)، ل ۱۰، شیعری (که‌م ته‌رخه‌می)، (۵) چوارینه‌یه، به‌لام له دیوانه‌که‌یدا، ل ۱۳۹، ناوینشانی

شاعره‌که‌ بوو (توره‌ی) و (۴) چوارینه‌یه. واته‌ چوارینه‌ی پینجه‌می تێدا نییه و ئه‌مه‌ی خواره‌ویه:

- ھىندە كىشاومە رەنجى بېھودە  
شەرتە تازە نەخۆم خەمى خەلگى  
پىر بووم و توامەو، وەك شەم  
خۆم بگەم شىت و مەست و كەم تەرخەم

۱۵- ژمارە (۱۳۳)، ل، ۴، دوو شىعرى تىدايە و ئەمانەن:

۱- شىعرى (ھىلانەى بەتال)، (۷) دېرە و لە ديوانە كەيدا، ۱۴۴ل، بە ھەندى دەستكارىيەو،  
بلاو كراوئەتەو.

۲- شىعرى (پەيمان شكىنى)، (۲) دېرە و لە ديوانە كەيدا، ۱۳۸ل، بوويتە سىيەمىن كۆپلەى شىعرى  
(موو ناپسىنم).

۱۶- ژمارە (۱۳۴)، ل، ۱۲، شىعرىكى بى ناونىشانە و (۶) دېرە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ۱۴۵ل، بە  
جىگۇرگىنى ھەندى دېرەو، بە ناونىشانى (گلىنەى شاعىر) بلاو كراوئەتەو.

۱۷- ژمارە (۱۳۸)، ل، ۸، شىعرى (ژيانم پر لە دەردە و نامرادى)، (۴) دېرە و لە ديوانە كەيدا، ۱۳۸ل،  
بوويتە يە كەمىن و دووھەمىن كۆپلەى شىعرى (موو ناپسىنم).

۱۸- ژمارە (۱۴۳)، ل، ۳، شىعرى (ورپىنەى رۆژوو)، (۱۷) دېرە و ئەم پىشەكىيەى بۆ نووسىو:  
(سالگىكى لە مانگى رەمەزاندا، دوو مېوانم بوون كە ھەمىشە لەسەر شىعرى تازە و كۆن كىشەيان بوو،  
ئەمىنىش كە رۆژوو، نىوہ عومر و شېرزە و كەلەلەى كردبووم، ئەو پارچە ھەلبەستەم بۆ پىكەنەن نووسى).  
ئەم شىعرە لە ديوانە كەيدا نىيە و دېرى يە كەم و كۆتايى ئەمەى خواروئەيە:

۱- ئەمەن ئەورۆكە پەيدام كردوئە بۆ خۆم يەكى دىكە

بەرۆ خوئىرى! نەكەى تۆ بى يە ئەو جىي ژوانە چى دىكە

۲- ئەمەن دلبەستەيى ھەلبەستەكانى نالى و كوردىم

بلا، ئەو شاعىرە لاوہ بللى (ھىمن) فەتايىكە

۱۹- ژمارە (۱۳۳)، ل، ۲، شىعرى (سايەى غەم)، (۷) دېرە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ۱۴۰ل، بە ناونىشانى  
(بۆسەى رۆژگار) بلاو كراوئەتەو و دېرى (۵) تىدا نىيە و ئەمەى خواروئەيە:

- دەردى بى دەرمانى من، چارەى بە ھىچ كەس ناكرى

چونكو دەرمانى نىيە، بىنگە لە: ماچى دەم نەبى

۲۰- ژمارە (۱۷۴)، ل، ۳، ۴، شىعرى (خاوەنى زېر)، (۵) دېرە، بەلام لە ديوانە كەيدا، ۸۸ل، بە  
جىياوزىيەكى زۆرەو، (۴) دېرە. لىزەدا بە ھۆى ئەم جىياوزىيەو، دەقى نىو رۆژنامە كە دەخەينە روو، كە  
بەم شىوہى خواروئەيە:

جھيل و چاك و له باره، خاوهنى زېر  
 رەزا شيرينه، شوخه، قيت و قۆزه  
 قسه زانه، وئزەوانه، خويئدەواره  
 سلاوى لى دەكەن، سەر دادەخەن بۆى  
 بهلام زېرت نەبى، سووكى، ئەگەر تۆ  
 ئەگەر پيئيكي خوين تالە و ورگ تير  
 ئەگەر خينگە زلە و خوار و شەل و گير  
 ئەگەر نەخويندين، شەش بيت و دوو دير  
 لە رى باز و لە كۆلان و لە بازير  
 بليى دەرسى هەزارى وەك (شكسپير)

۲۱- ژماره (۱۷۵)، ۱۱، شيعرى (ئارەزووى فرين)، (۷) كۆپلەيه، بهلام له ديوانه كهيدا، ل ۱۳۰،  
 (۶) كۆپلەيه، ئەم كۆپلەيهى دوايى تيدا نيبه و ئەمەى خوارەويه:  
 - خيوى بيئيكي بەرز و روناكم كەچى لەلايان پەستم و نەوى  
 ئەمن كە دەليى ناوونگى پاكم نازام بوچى هاتمه سەر زەوى؟

۲۲- ژماره (۱۸۵)، ۶، شيعرى (كيژى لادى)، (۱۷) ديرە، بهلام له ديوانه كهيدا، ل ۹۶، (۱۵) ديرە.  
 واتە ديرەكانى (۶، ۱۱) تيدا نيبه و ئەمانەن:  
 ۱- گەردەنت وەكو ميناي بلوورە بى رۆژ و ماتىك ليوى تۆ سوورە  
 ۲- بى فر و فيل و پاك و خاوينى كچيكي وەك تۆ، پاكە داوينى

۲۳- ژماره (۱۸۶)، ۳، شيعرى (تۆم هەر له بيره)، (۵) كۆپلەيه و له ديوانه كهيدا، ل ۹۵، وەك  
 خۆى بلاو كراوتەتەوه.

۲۴- ژماره (۱۸۷)، ۳، (۱۰)، شيعريكي بى ناوينشانە و (۳) ديرە و ئەمەى خوارەويه:  
 گولگى گەش بە باى شەمالى بەهار، ئەشنيتهوه  
 قاسپەى كەوى كەژ، بەرانبەر نزار، بەرز ئەيئتهوه  
 من كە ديم لەرهى شەپۆلى شەنى..... كوردستان  
 تىكەلاو ئەبى لەگەل جريوى ئەستيرەى بەيان  
 ئەو كاتە هيو و ئامانجى دوورم، هەردوو پيئەوه  
 ئەبن بە پرشنگ، گولالەى سوورم، ئەگەشيتەوه

هەرچەن ئەم شيعره به ناوى (هيمن) بلاو كراوتەتەوه، بهلام له بنه رەتدا، هى نووسەر و شاعير (كامل  
 ژير ۱۹۳۴ز). هەر وەك هەمان شيعر پيشتريش له كۆوارى (هيو، ژ، ۱۲، ۳، سالى يەكەم) دا، به  
 ناوينشانى (ئامانجى من)، هەر بەم ناوهوه (هيمن)، بلاو كراوتەتەوه. هەر وها دوو شيعرى تريشى له هەمان  
 كۆواردا به ناوينشانە كانى: (زەنگ)، له (ژ، ۸، ۲۸، ۲۹، سالى يەكەم)، (سرودى لاوان) له (ژ، ۶، ۷،  
 ۱۳، ۱۴، سالى دووهم) دا، بلاو كراوتەتەوه.

ھۆكاری ئەمەش ھەلەى چاپ، ياخود خەلەتاندنى خوينەر نەبوو، بەلكو بۆ ئەو دەگەرپیتەو، لەم سەردەمەدا بەھۆى نۆودارى و خۆشەويستى (ھيمن موكرىيانى) (ھەندى لە شاعير و نووسەرانى كورديش بە شانازى بەو ناو، (ھيمن)يان بۆ تەخەللووسى وئۆبىي خۆيان ھەلبژاردوو و لە رۆژنامە و كۆوارەكاندا، شيعر و بەرھەميان بۆ كوردۆتەو، يەكيك لەمانەش (كامل ژير ۱۹۳۴ز) بوو). [عوسمان دەشتى، ۲۰۰۹، ۵] ھەرەك نامازەمان پيدا، ھەم لە كۆوارى (ھيوا) و ھەم لە رۆژنامەى (كوردستان ۱۹۵۹-۱۹۶۳ز)دا شيعرى بە ناوى (ھيمن) بۆ كوردۆتەو، بەلام دواتر ئەم شيعرانەى نامازەمان پيدا و سەرچەم شيعرەكانى ترى بە ناو، راستەقىنەكەى خۆى (كامل ژير ۱۹۳۴ز) لە ديوانىكدا، بە ناوئيشانى (كوردايەتتى و جوانى) جارۆكتەر بۆ كوردۆتەو. [كامل ژير، ۲۰۰۹، ۱۴۱، ۱۵۶، ۱۶۱]

۲۵- ژمارە (۱۹۴)، ۱۱، شيعرى (گيژەلووكەى خەزان)، (۲۵) دۆرە، بەلام لە ديوانەكەيدا، ۱۴۶، (۲۱) دۆرە و دۆرەكانى (۳، ۶، ۱۰، ۱۳، ۱۴) تيدا نيبە و ئەمانەن:

- |                                    |                                |
|------------------------------------|--------------------------------|
| ۱- ھەل دەوئۆزى بيساتى دل خۆشى      | داى دەمەزىتۆزى خوزن و خامۆشى   |
| ۲- بى ئەوئەى ھەر موچرەكى پيدا بى   | كۆر لە گريان دەكا لە سوئى بابى |
| ۳- بزەيىك نايبىنى لەسەر ليوئى      | چاو، فرميسكى خوين دەپالئوى     |
| ۴- نەبوو قەت فاجعەى ئەوئەندە بەسام | سە برا، پىكەو بەن ناكام        |
| ۵- دەستى تەقدير لەت لەتتى كردن     | گورگى برسى ئەجەل ھەمووى بردن   |

۲۶- ژمارە (۲۰۰)، ۱۱، شيعرى (شىنى گۆران)، (۲۵) دۆرە و بە ھەندى دەستكارىبەو، لە ديوانەكەيدا، ۱۵۱، بۆلۆكراوتەو.

تەوئەرى دووھ/ سە كۆوار و سە پارچە شيعرى ترى (ھيمن موكرىيانى):

لەم تەوئەرىبەدا نامازە تيشك دەخەينە سەر سە پارچە شيعرى تر، كە لە ئەنجامى گەپان و بەدواداچوونى زياترمان بە نۆ رۆژنامە و كۆوارەكاندا دەستمان كەوتوون. كە تاك و تەرا لە كۆوارەكانى: (گزنك ۱۹۷۲ز، مامۆستاي كورد ۱۹۸۵-۱۹۹۶ز، بنكەى ژين ۲۰۰۹ز)دا، دواى كۆچى دوايى شاعير، بۆلۆكراوتەو و تا رۆژگارى ئەمروۆشان لە ديوانەكانيدا نيبين. وەك لە خواروھ نامازەيان پىدەدەين:

يەكەم: كۆرارى مامۆستاي كورد ۱۹۸۵-۱۹۹۶ز: ژ. ۹، ۴، شيعرى (شارى تووك لىكراو)، (۷) دۆرە و ئەمەى خواروھ دۆرى سەرەتا و كۆتايەكەيتى:

- ۱- ديسان ھەورى بۆر و چلكن دايانگرت ناسمانى ساو
- ديسان وەك كچى شەرميۆن خۆى شاردەو تيشكى ھەتاو
- ۲- ديسان دايانگرد شارەكەم بە بۆمبا و رەھيلەى شەست تير
- دايانە بە گەوزى مردن پياو و ژن و مندال و پير

دووهەم: كۆوارى گزنگ ۱۹۷۲ز: ژ، ۸۵، ۱۲۹ل، شېعرى (وەنەوشە)، شېعەرىكى (۷) دېرىبە و ئەمەى خوارەو دېرى يە كەم و كۆتايەتى:

- ۱- ئەى وەنەوشە، ئەى گولئى من ئەى خەمەرەوئى دئى من  
 ۲- بەلام عەترت لى دەگىرى بۆيە ناكرىئى فەراموئش

سېبەم: كۆوارى زىن ۲۰۰۹ز: ژ، ۱۰، ۳۰۷ل، شېعەرىكى بىخ ناوئىشان، (۷) دېرە و دېرى يە كەم و كۆتايى ئەمەى خوارەوبە:

- ۱- ەمەيشە تەوئەمى ئەندووھو ەمەسەرى مېحەنم نەماوە قووتى ئەژنۆم و تاقەتى بەدەنم  
 ۲- خوايە يارمەتېم دە، ئەمن خەرىكى ئەوهم نەمامى دووبەرەكى كورد لە رېشە ەلەبەكەنم

### ئەنجام

گرنگترىن ئەنجامى لىكۆلئىنەو كە لەم خالانەى خوارەو دەخەينەرەو:

۱- لە كۆى ئەو رۆژنامە و كۆوارانەى بەسەرمان كەردنەو، (۷۱) شېعرى (هېمەن موكرىانى) يان تېدا بلاءو كراوئەتەو، كە بە بەراورد كەردن لە گەل شېعرە كانى نئو دىوانە كانىيدا، بەم شئوئەى خوارەو دابەش دەبن:

أ- (۳۳) پارچە شېعر، تەنبا بە ەندەى دەستكارى وشەببەو، وەك خۆيان بىخ زىاد و كەم لە دىوانە كانىيدا، بلاءو كراوئەتەو.

ب- (۲۲) پارچە شېعر، جگە لە ەندەى وەردە دەستكارى وشەببەى، دېرئەك، يان چەند دېرئەك، ياخود كۆپلەبەك يان چەند كۆپلەبەك يان تېدا نەبوو.

ج- (۱۶) پارچە شېعر، كە تاكو رۆژگارى ئەمەرۆشمان لە ەيچ يەكئەك لە دىوانە كانىيدا، بلاءو نەكراوئەتەو. ەروەها لەو سەرچاوانەى، وتار، لىكۆلئىنەو، ياخود شېعرى ناوبراويان، بلاءو كەردۆتەو. جگە لە بەراورد كەردن و دەرختنى جىاوازى نئوان ەردوو دەقى شېعرى (سوورى دەوران) نئو دىوانە كە و كاسىتتە تۆماركراو كە، (۷) پارچە شېعرى ترمان بەردەست كەرد، كە لە دىوانە كانىيدا، بلاءو نەكراوئەتەو. بەمەش ئەو شېعرانەى كە لە دىوانە كانىيدا، بلاءو نەكراوئەتەو، ژمارەيان دەكاتە (۲۳) پارچە شېعر.

۲- رەونكەردنەو، دەربارەى ئەو شېعرە بىخ ناوئىشانە (۳) دېرىبەى لە ژمارە (۱۸۷) رۆژنامەى (كوردستان ۱۹۵۹-۱۹۶۳ز) و ئەو (۳) شېعرەى ترى كۆوارى (هېوا ۱۹۵۷-۱۹۶۳ز)، بە ناوئىشانە كانى (نامانجى من، زەنگ، سرودى لاوان)، كە سەرچەمىيان بەناوى (هېمەن) بلاءو كراوئەتەو، لە بنەرەتدا شېعرى (كامل ژىر)ن.

### پاشكۆ

-: ژمارەى رۆژنامە و كۆوارەكان:

۲- پروژنامهی کوردستان (۱۹۵۹-۱۹۶۳ز)	۱- پروژنامهی کوردستان (۱۹۴۶ز)
- ژ ۱، س ۱، ۶-۵-۱۹۵۹ز - ژ ۷، س ۱، ۱۷-۶-۱۹۵۹ز - ژ ۱۲، س ۱، ۲۲-۶-۱۹۵۹ز - ژ ۱۴، س ۱، ۵-۷-۱۹۵۹ز - ژ ۹۳، س ۲، ۱۵-۲-۱۹۶۱ز - ژ ۹۵، س ۲، ۱-۳-۱۹۶۱ز - ژ ۹۶، س ۲، ۸-۳-۱۹۶۱ز - ۹۷، س ۲، ۱۵-۳-۱۹۶۱ز - ژ ۹۸، س ۲، ۲۹-۳-۱۹۶۱ز - ژ ۱۰۰، س ۲، ۱۲-۴-۱۹۶۱ز - ژ ۱۰۷، س ۳، ۳۱-۵-۱۹۶۱ز - ژ ۱۲۲، س ۳، ۱۳-۸-۱۹۶۱ز - ۱۲۳، س ۳، ۲۰-۸-۱۹۶۱ز - ژ ۱۳۳، س ۳، ۲۹-۷-۱۹۶۱ز - ژ ۱۳۴، س ۳، ۶-۸-۱۹۶۱ز - ژ ۱۳۸، س ۳، ۲-۱-۱۹۶۲ز - ۱۴۳، س ۳، ۷-۲-۱۹۶۲ز - ژ ۱۷۲، س ۴، ۵-۸-۱۹۶۲ز - ژ ۱۷۳، س ۴، ۱۲-۸-۱۹۶۲ز - ژ ۱۷۴، س ۴، ۱۹-۸-۱۹۶۲ز - ژ ۱۷۵، س ۴، ۲۷-۸-۱۹۶۲ز - ژ ۱۸۴، س ۴، ۲۸-۷-۱۹۶۲ز - ژ ۱۸۵، س ۴، ۵-۱۲-۱۹۶۲ز - ژ ۱۸۶، س ۴، ۱۲-۱۲-۱۹۶۲ز - ژ ۱۸۷، س ۴، ۲۱-۱۲-۱۹۶۲ز - ژ ۱۹۴، س ۴، ۶-۲-۱۹۶۳ز - ۲۰۰، س ۴، ۲۰-۳-۱۹۶۳ز	- ژ ۱، س ۱، ۱۱-۱-۱۹۴۶ز - ژ ۲، س ۱، ۱۳-۱-۱۹۴۶ز - ژ ۳، س ۱، ۱۵-۱-۱۹۴۶ز - ژ ۱۰، س ۱، ۴-۲-۱۹۴۶ز - ژ ۱۲، س ۱، ۹-۲-۱۹۴۶ز - ژ ۱۸، س ۱، ۲۳-۲-۱۹۴۶ز - ژ ۲۰، س ۱، ۲۷-۱-۱۹۴۶ز - ژ ۲۲، س ۱، ۴-۳-۱۹۴۶ز - ژ ۲۴، س ۱، ۱۳-۳-۱۹۴۶ز - ژ ۲۵، س ۱، ۱۷-۳-۱۹۴۶ز - ژ ۳۰، س ۱، ۴-۴-۱۹۴۶ز - ژ ۳۴، س ۱، ۱۰-۴-۱۹۴۶ز - ژ ۴۴، س ۱، ۶-۵-۱۹۴۶ز - ژ ۴۸، س ۱، ۱۸-۵-۱۹۴۶ز - ژ ۶۲، س ۱، ۲۷-۶-۱۹۴۶ز - ژ ۶۵، س ۱، ۲-۷-۱۹۴۶ز - ژ ۸۷، س ۱، ۱۷-۹-۱۹۴۶ز - ژ ۸۸، س ۱، ۱۹-۹-۱۹۴۶ز
۴- کۆواری کوردستان (۱۹۴۵-۱۹۴۶ز)	۳- کۆواری نیشتمان (۱۹۴۳-۱۹۴۴ز)

- ژ ۱، ۱، س، ته مموزی ۱۹۴۳ز	- ژ ۱، ۱، س، ۱، ۶- ۱۲- ۱۹۴۵ز
- ژ ۲، ۱، س، تشرینی یه که می ۱۹۴۳ز	- ژ ۲، ۱، س، ۱، ۲۱- ۱۲- ۱۹۴۵ز
- ژ ۳، ۱، س، تشرینی دووه می ۱۹۴۳ز	- ژ ۴، ۱، س، مایسی ۱۹۴۶ز
- ژ ۵، ۱، س، کانوونی دووه می ۱۹۴۳ز	- ژ ۶، ۷، ۸، ۱، س، ئایاری ۱۹۴۳ز
- کۆواری ئاوات (۱۹۴۵ز)	- ۶- کۆواری هاواری کورد (۱۹۴۵ز)
- ژ ۱، ۱، س، ۲۲- ۱۰- ۱۹۴۵ز	- ژ ۱، ۱، س، ۱، ئهیلولی ۱۹۴۵ز
- ۷- کۆواری هه لاله (۱۹۴۶ز)	- ۸- کۆواری گروگالی مندالانی کورد (۱۹۴۶ز):
- ژ ۱، ۱، س، شوپاتی ۱۹۴۶ز	- ژ ۱، ۱، س، نيسانی ۱۹۴۶ز
- ژ ۲، ۱، س، ئاداری ۱۹۴۶ز	- ژ ۳، ۱، س، حوزهبیرانی ۱۹۴۶ز
- ژ ۳، ۱، س، نيسانی ۱۹۴۶ز	
- ۹- کۆواری هاواری نیشتمان (۱۹۴۶ز)	- ۱۰- کۆواری هیوا (۱۹۵۷- ۱۹۶۳ز)
- ژ ۱، ۱، س، ۱۲- ۳- ۱۹۴۶ز	- ژ ۸، ۱، س، شوپاتی ۱۹۵۹ز
	- ژ ۶، ۷، ۱، س، ۲، کانوونی دووه می ۱۹۵۹ز
- ۱۱- کۆواری گزنگ (۱۹۷۲ز)	- ۱۲- کۆواری مامۆستای کورد (۱۹۸۵- ۱۹۹۶ز):
- ژ ۸۵، تشرینی دووه می ۲۰۱۰ز	- ژ ۹، به هاری ۱۹۹۰ز
- ۱۳- کۆواری ژین (۲۰۰۹ز)	
- ژ ۱۰، ۱۰- ۱۱، ديسه مبهري ۲۰۱۹ز	

## سه رچاوه كان

یه کهم: به زمانی کوردی:

أ- کتیب:

- ۱- کهمال مهزههر ئه حمده. (۱۹۷۸)، تیگه یشتنی راستی و شوینی له رۆژنامه گه ی کوردیدا، چاپخانه ی کۆری زانیاری کورد- به غدا.
- ۲- نهوشیروان مسته فا ئه مین. (۲۰۰۷)، حکومه تی کوردستان، چاپی سییه م، چاپخانه ی تیشک- سلیمانی.
- ۳- ئه رسلان باییز ئیسماعیل. (۲۰۱۳)، سیمای شیعری کوردی دوا ی راپه رین، چاپخانه ی شه هاب- هه ولیر.
- ۴- محمه مد فه ریق هه سن. (۲۰۰۸)، هیمن و بۆنی غه ربیی، بلا و کراوه ی ئاراس- هه ولیر.
- ۵- محمه مد حه مه باقی. (۲۰۱۳)، وێژه و میژوو، چاپخانه ی موکریان- هه ولیر.
- ۶- هیمداد حوسین. (۲۰۰۸)، رۆژنامه وانی کوردی سه رده می کۆماری کوردستان، بلا و کراوه ی ئاراس- هه ولیر.
- ۷- جه مال خه زنده ار. (۲۰۱۱)، ئینسکلۆپیدیای رۆژنامه گه ربی کوردی، چاپخانه ی حاجی هاشم- هه ولیر.

- ۸- \_\_\_\_\_ . (۱۹۸۱)، رۆژی کورد، چاپخانهی المؤسسة العراقية- بهغدا.
- ۹- \_\_\_\_\_ . (۱۹۷۳)، رابه‌ری رۆژنامه‌گه‌ریی کوردی، - بهغدا.
- ۱۰- \_\_\_\_\_ . (۲۰۱۶)، له بابته میژووی رۆژنامه‌گه‌ریی کوردییه‌وه، چاپخانهی رۆژه‌لآت- هه‌ولێر.
- ۱۱- مارف خه‌زنه‌دار. (۲۰۱۰)، میژووی ئەدهبی کوردی، به‌رگی یه‌که‌م، چاپی دووهم، بلاوکراوه‌ی ئاراس- هه‌ولێر.
- ۱۲- \_\_\_\_\_ . (۲۰۱۰)، میژووی ئەدهبی کوردی، به‌رگی هه‌وته‌م، چاپی دووهم، ده‌زگای چاپ و بلاوکراوه‌ی ئاراس- هه‌ولێر.
- ۱۳- هه‌سه‌نی دانیشه‌فر. (۲۰۰۳)، بارزانی له‌ ویژدانی رۆژه‌لآتی کوردستاندا، چاپخانه‌ی وه‌زاره‌تی په‌روه‌رده‌- هه‌ولێر.
- ۱۴- عوسمان ده‌شتی. (۲۰۰۹)، هیمن ده‌رباره‌ی ناوه‌رۆکی سیاسی و کۆمه‌لایه‌تی شیعره‌کانی، چاپخانه‌ی رۆژه‌لآت- هه‌ولێر.
- ۱۵- \_\_\_\_\_ . (۲۰۰۹)، هیمن نامه، چاپخانه‌ی رۆژه‌لآت - هه‌ولێر.
- ۱۶- مه‌حمود زامدار. (۲۰۰۳)، چریکه‌ی چیا و سترانی شاعیران، چاپخانه‌ی وه‌زاره‌تی په‌روه‌رده‌- هه‌ولێر.
- ۱۷- وریا زاری. (۲۰۱۲)، دیوانی هیمن، چاپی یه‌که‌م، په‌خشانگای ئازادی- کوردستان
- ۱۸- زه‌نگه‌نه: عه‌بدوڵلا. (۲۰۱۰)، سه‌رجه‌م به‌رهمه‌ رۆژنامه‌ نووسیه‌ی کانی جه‌بار جه‌باری، چاپخانه‌ی هیفی- هه‌ولێر.
- ۱۹- کامیل ژیر. (۲۰۰۹)، کوردایه‌تی و جوانی، چاپخانه‌ی بابان- سلیمانی.
- ۲۰- : عه‌لاه‌ده‌دین سه‌جادی. (۲۰۱۲)، میژووی ئەدهبی کوردی، انتشارات کردستان- سنه.
- ۲۱- سه‌باح موسا عه‌لی. (۲۰۱۴)، زمانی رۆژنامه‌نووسی کوردی له‌ عێراق، چاپخانه‌ی کارۆ- که‌رکوک.
- ۲۲- فاروق فه‌ره‌اد. (۲۰۱۷)، هه‌لبه‌ستی سوو‌ری ده‌وران، چاپخانه‌ی نینا- سوید.
- ۲۳- هه‌مه‌ سه‌لح فه‌ره‌ادی. (۲۰۰۶)، سۆزی غه‌ریبی و سه‌ی چامه‌ی کوردی، چاپخانه‌ی سه‌یما- سلیمانی.
- ۲۴- که‌مال فواد. (۱۹۷۲)، یه‌که‌مین رۆژنامه‌ی کوردی، چاپخانه‌ی اوفسیت الاخلاص- به‌غداد.
- ۲۵- عه‌زیز گه‌ردی. (۱۹۸۷)، په‌خشانی کوردی، چاپخانه‌ی زانکۆی سه‌لاه‌ده‌دین- هه‌ولێر.
- ۲۶- کوردستان موکریانی. (۲۰۰۲)، زاری کرمانجی، چاپخانه‌ی وه‌زاره‌تی په‌روه‌رده‌- هه‌ولێر.
- ۲۷- هیمن موکریانی. (۱۹۷۴)، تاریک و روون، بلاوکراوه‌ی بنکه‌ی پێشه‌وا.
- ۲۸- \_\_\_\_\_ . (۲۰۰۶)، بارگه‌ی یاران، بلاوکراوه‌ی ئاراس، هه‌ولێر.
- ۲۹- \_\_\_\_\_ . (۱۹۸۳)، پاشه‌رۆک، انتشارات ستدیان، چاپخانه‌ی پیروژ - مه‌هاباد.
- ۳۰- \_\_\_\_\_ . (۲۰۱۶)، سه‌رجه‌م و کۆی شیعیر و په‌خشانه‌کانی، انتشارات کردستان- سنه.
- ۳۱- \_\_\_\_\_ . (۱۹۷۹)، ئاله‌ی جودایی، چاپخانه‌ی علاه، به‌غدا.
- ۳۲- جه‌مال نه‌به‌ز. (۱۹۸۵)، گو‌فاری نیشتمان، بنکه‌ی چاپه‌مه‌نی ئازاد، چاپی دووهم- هه‌ولێر.

۳۳- مامۆستا هیمن. (۱۹۹۹)، چه‌په‌کی گۆل چه‌په‌کی نێرگز، چاپی دووهم، چاپخانه‌ی ره‌هرو- مه‌هاباد.

ب- کۆوار:

۳۴- محمود زامدار. (۱۹۸۷)، ده‌وری رۆژنامه‌گه‌ری کوردی له ژبانی رۆشنییری و کۆمه‌لایه‌تی گه‌لی کورددا، گ، رۆشنییری نوێ، ژ ۱۱۳- به‌غدا.

۳۵- هیمن موکریان. (۱۹۹۲)، له به‌هاری شیلا ناوێوه تا پاییزی ورمی، به‌شی دووهم، گ، (مامۆستای کورد)، ژ. ۱۴- سوید.

۳۶- دلێر محمد امین محمد. (۱۹۹۹)، گۆفاری هیوا و به‌ژداری له بزوتنه‌وه‌ی وێژه‌ی هاوچه‌رخدا، گ، (زانکۆی سلێمانی)، ژ. ۱۲- سلێمانی.

ج- پێگه‌ی ئه‌لیکترۆنی:

۳۷- خالد محمه‌دزاده. (۲۰۱۳)، (۱۲)، (rojpress.wordpress.com)-۱۱- (۲۰۲۰)

۳۸- مه‌لّه‌ندی هونه‌ری ماملی، (۲۰۲۰)، (www.Mamle.net)، (۱۲-۱۱-۲۰۲۰)

دووهم: به‌زمانی عه‌بی:

۳۹- تیسیر محمد الزیادات. (۲۰۱۴)، الادب العربي لغير الناطقين بالعربية، جزء الاول، دار المنهل- الاردن.

۴۰- عناد اسماعیل الکبیس. (۱۹۷۲)، الادب في صحافة العراق، مطبعة النعمان- النجف الاشرف.

۴۱- منیر بکر. (۱۹۶۹)، الصحافة العراقية واتجاهات السياسية والاجتماعية والثقافية، مطبعة الارشاد- بغداد.

۴۲- نبیل حداد. (۲۰۰۲)، في الكتابة الصحفية، دار الكندي- عمان.

۴۳- حمزة: عبداللطيف. (۱۹۵۵)، الصحافة و الاب في مصر، مطبعة البرلمان- مصر.

۴۴- انتصار ابراهيم عبدالرزاق- صفد حسام الساموك. (۲۰۱۱)، الاعلام الجديد، الدار الجامعية- بغداد.

۴۵- فاطمة محمد محبوب. (۱۹۶۰)، دائرة معارف الناشئين، دار الهلال- مصر

۴۶- أنطوان نعمة - عصام مدور. (۲۰۰۱)، المنجد في اللغة العربية لمعاصرة، دار المشرق - بيروت.

سێهه‌م: به‌زمانی ئینگلیزی:

47- Gayle Waldrop. (1955), Edilor and Editorial Writer, Rinhart and Kompany, Inc – New York.

**Serçawekan Yekem:****Be Zimanî Kurdî:****A- Kitêb:**

- 1- Kemal Mezher Ahmed. (1978), Têgeyîştinî Rastî u şiwênî le Rojnamegerî Kurdî da, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd- Baxda.
- 2- Newşîrwan Mistefa Emîn. (2007), Hikumetî Kurdistan, Çapî Sêyem, Çapxaney Tîşik - Silêmanî.
- 3- Erselan Bayîz Isma'îl. (2013), Sîmay Şî'rî Kurdî diway raparîn, Çapxaney şehab-Hewlêr.
- 4- Mihened Ferîq Hesên. (2008), Hêmin u bonî gerîbî, bilawkirawey Aras-Hewlêr.
- 5- Mihemed Heme Baqî. (2013), Wêje u Mêjû, Çapxaney Mukiryani - Hewlêr.
- 6- Hîmîdad Husên. (2008), Rojnamewanî Kurdistan serdemî Komarî Kurdistan, Bilawkirawey Aras - Hewlêr.
- 7- Cemal Xeznedr. (2011), Iyniskilopîdyayî Rojnamegerî Kurdî, Çapxaney Hacî Haşim - Hewlêr.
- 8- \_\_\_\_\_. (1982), Rojî Kurd, Çapxaney Almuesese Alirawîye - Bexda.
- 9- \_\_\_\_\_. (1973), Raberî Rojnamegerî Kurdî, Çapxaney Alhurîye - Bexda.
- 10- \_\_\_\_\_. (2016), Le babet Rojnamegerî Kurdîyewe, Çapxaney Rojhelat - Hewlêr.
- 11- Marif Xeznedar. (2010), Mêjûy Edebî Kurdî, Bergî Yekem, Çapî Dûem, Bilawkirawey Aras - Hewlêr.
- 12- \_\_\_\_\_. (2010), Mêjûy Edebî Kurdî, Bergî Yekem, Çapî Hewtem, Bilawkirawey Aras - Hewlêr.
- 13- Hesênî Danîşfer. (2003), Barzsnî le wîjdsnî Rojhelatî Kurdistan da, Çapxaney Wezaretî Perwerde - Hewlêr.
- 14- Usman Deştî. (2009), Hêmin derbarey nawerokî siyasî u komelayetî şî'reksnî, Çapxaney Rojhelat - Hewlêr.
- 15- \_\_\_\_\_. (2009), Hêminname, Çapxaney Rojhelat - Hewlêr.
- 16- Mehmûd Zamdar. (2003), Çirîkey çiyaw sitranî şa'îran, Çapxaney Wezaretî Perwerde- Hewlêr.
- 17- Wîrya Zîrarî. (2012), Dîwanî Hêmin, Çapî Yekem, Pexşangaî Azadî - Kurdistan.
- 18- Abdullah Zengene. (2010), Sercem berheme Rojname nûsyîekanî Cebârî, Çapxaney Hêvî - Hewlêr.
- 19- Kamil Jîr. (2009), Kurdayetî u ciwanî, Çapxaney Baban- Silêmanî
- 20- Alaedîn Secadî. (2012), Mêjûy Edebî Kurdî, Intîşarat Kurdistan- Sine.
- 21- Sebah Musa Ali. (2014), Zimanî rojnamenûsî Kurdî le Iraq, Çapxaney Karo - Kerkuk.
- 22- Faruq Ferhad. (2017), Helbestî Sûrî Dewran, Çapxaney Nîna- Siwêd.

- 23 -Hemesalih Ferhadî ,(2006) .Sozî gerîbî u sê çamey kurdî ,Çapxaney Sîma-Silêmanî.
- 24 -Kemal Fiwad ,(1972) .Yekemîn Rojnamey Kurdî ,Çapxaney Ofsêt Alixlas-Bexdad.
- 25 -Ezîz Gerdî , (1987) .Pexşanî Kurdî ,Çapxaney Zankoy Selaheddîn -Hewlêr.
- 26 -Kurdistan Mukiryani , (2002) .Zarî kirmancî ,Çapxaney Wezaretî Perwerde-Hewlêr.
- 27 -Hêmin Mukiryani ,(1974) .Tarîk u rûn ,Bilawkirawey binkey pesewa.
- 28 - \_\_\_\_\_ . (2006), Bargey yaran, Blawkirawey Aras- Hewlêr.
- 29- \_\_\_\_\_ . (1983), Paşerok, Çapxaney Pîroz- Mehabad.
- 30- \_\_\_\_\_ . (2016), Sercem u koy şî'r u Pexşanekanî, Intişarat Kurdistan-sine.
- 31- \_\_\_\_\_ . (1979), Naley cudayî, Çapxaney Ela- Bexda.
- 32- Cemal Nebez. (1985), Govarî Nîştiman, Binkey çapemenî Azad, çapî dwem-Hewlêr.
- 33- Mamosta Hêmin. (1999), Çepkê Gul çepkê nêrgiz, Çapî dwem, çapxaney Rehru-Mehabad.

#### **B- Kowar:**

- 34- Mehmûd Zamdar. (1987), Dewrî Rojnamegerî Kurdî le jiyani roşinbîrî u komelayetî gelî kurd da, G, (Roşinbîrî niwê), j, 113- Bexda.
- 35- Ferhad Şakelî. (1992), Le beharî şilanawêwe ta paîyzi wirmê, G, (Mamostay Kurd), j,14- Siwîd.
- 36- Dilêr Mehemed Emîn Mehabad.(1999), Govarî Hîwa u bejdarî le bizûtnewey Edebî hewçerxî kurdî da, G, (Zankoy Selaheddîni), j, 12- Silêmanî.

#### **J- Pêgey Elîktironî:**

- 37- Xalid Mihemedzade. (2013), (rojpress. wordpress. com). (12-11-2020).
- 38- Melbendî hunerî Mamlê. (2020), (www. Mamlê. net). (11-11-2020).

#### **Dwem: Be Zimanî Erebi:**

- 39- Teysir Muhamed Alziyadat. (2014), Aledêb Alerebî ligêr alnatiqîn blige alerebiye, Cuzil ewel Derlmenhel- Alerden.
- 40- Inad Isma'îl Alkubeyî. (1972), Eldeb fî Sehafet Aliraq, Metbe'e Aln'man - ncef aleşref.
- 41- Munîr Bekir. (1969), Alsehafe Aliraqîye we iticahat alsiyasiye we lictîma'îye we lseqafiye, Metbe't Alirşad Bexdad.
- 42- Nebîl Hedad. (2002), Fî Kitabet alsehefiye, Darlkindî- Amman.
- 43- Abulltîf Hemze. (1955), Alsehafe weledeb fî Mîsr, Metbe'e Elberleman- Mîsr.

- 44- Intisar İbrahim Ebdulrezaq - Sefid Husam Elsamuk. (2011), Ela'lam Elcidid, Eldar Elcami'ye- Bexdad.
- 45- Fatıme Muhammad Mehcub. (1960), daiyret me'arif linaşıyn, dar Elhılal-Misr.
- 46- Entiwan Ni'me - 'usam Mudewer. (2001), Elmecned fi Elluget Elerebıye Elmu'asiret, darl meşriq- Beyrut.
- 47- Gayle Waldrop. (1955), Edilor and Editorial Writer, Rinhart and Kompany, Inc- New York.

# HETÊ ŞIKIL, MUHTEWA U HUNERANÊ EDEBİYAN RA TEHLİLÊ MEWLİDİ NEBİ Ê MALA ABDULQADİRÊ MUŞEKİ

**Molla Abdulkadir Muşeki'nin Mewlidê Nebi Adlı  
Eserinin Şekil, İçerik ve Edebi Sanatlar Açısından  
İncelenmesi**

**Mehmet ARSLAN<sup>1</sup>**

## XULASA

Mala Abdulqadirê Muşeki, nuştoğanê edebiyatê klasiki ê Zazaki ra yo. Serranê 1990 ra pey dest nuştışê bı Zazaki kerdo, verco mewlidêk nušto, nka zi heyne bı usilê klasik qesideyan nuseno. Mewlidê Mala Muşeki, verco bı herfanê Erebi ame neşırkerdiş u serran ra pey zi latinize bı. Ma waşt ki ina xebat dı ino mewlidê Muşeki analiz biker.

Ina xebat dı, mewlidê Mala Abdulqadirê Muşeki; hetê şıkal, muhtewa u huneranê edebiyan ra tetqıq biyo. Ina xebat hiri qısıman ra yena meydan. Verco destpêk dı derheqê mewlid, kelimeya mewlid u heyatê Muşeki dı me-lumat diyeno. Dıma mewlid qısıme verini dı hetê şekil ra, qısıme dıyn dı hetê muhtewa ra, qısıme hiriyın dı zi hetê huneranê edebiyan ra tetqıq beno.

**Çekuyi Muhimi:** Huneri Edebi, Mala Abdulqadir Muşeki, Mewlidê Nebi, Zazaki.

## ÖZET

Molla Abdulkadir Muşeki, Klasik Zaza Edebiyatı yazarlarındanır. 1990'lı yıllardan sonra Zazaca yazmaya başladı. İlkın bir Zazaca mevlit yazdı. Günümüzde ise Zazaca kaside yazmaya devam etmektedir. Molla Muşeki'nin

1 Wendekarê doxtora, Qısıme Zıwan u Edebiyatê Zazaki ê Enstituya Zıwananê Ganiyan ê Üniversiteya Bingoli, mmarslan1979@gmail.com

mevlidi ilkin Arap harfleriyle neşredildi yıllar sonra latinize edildi. Bu çalışmada Molla Muşeki'nin mevlidini tahlil etmek istedik.

Bu çalışmada Molla Muşeki'nin mevlidi şekil, muhteva ve edebi sanatlar yönünden incelendi. Giriş kısmında mevlit, mevlit kelimesi ve Molla Muşeki'nin hayatı hakkında bilgi verildikten sonra mevlit üç bölümde incelenmiştir. İlk bölümde şekil, ikinci bölümde muhteva ve üçüncü bölümde ise edebi sanatlar yönünden tahlil edilmiştir.

**Anahtar kelimeler:** Edebi sanatlar, Mevlid-i Nebi, Molla Abdulkadir Muşeki, Zazaca.

### ABSTRACT

Mollah Abdulkadir Muşeki is one of the writers of Classical Zazaki Literature. He started writing in Zazaki after 1990s. He first wrote a mawlid in Zazaki. Today, he's been writing Zazaki eulogies. Mollah Muşeki's mawlid was first published in Arabic and years later it was transcribed by using Latin alphabet. The aim of this study is to analyze Mollah Muşeki's mawlid.

In this study, Mollah Muşeki's mawlid has been analyzed in its form, content and from the standpoint of literary arts. After the introduction part, in which some information is given about mawlid, the word 'mawlid' and Mollah Muşeki's life, Muşeki's mawlid has been analyzed in three parts: in terms of its form in the first part, its content in the second and finally with regards to literary arts in the third part.

**Key words:** Literary arts, Mawlid al-Nabi, Mollah Abdulkadir Muşeki, Zazaki

### DESTPÊKERDIŞ

Kelimeya mewlid, Erebki ya u kokê kelimeya weladet ra yena, zafiya ina kelime zi mewlid a. Bı menaya xısusî ina kelima, kitabî ki biyayış u cuyayışê Hz. Peyxemberî ra behs kenî qey inan yena şıxulnayış. Mewlidan dı teyna biyayış u cuyayışê Hz. Peyxemberî nê, bê meyi hediseya miraç ra heta mucizeyan u wefatê ey, zaf çi ra behs beno. Kitabî mewlid verco teyna qey Hz. Peyxemberî nusiyayî, labelê badi wextan hêdi bı hêdi qey cuyayışê weliyan u şexsiyetanê pılan zi mewlidi ameyî nuştış.

Mewlidi bı zafî manzum î u şıklê mesnewî dı yeni nuştış. Nuşteyi mewlidi, miyanê şarî dı şewa biyayışê Hz. Peyxemberî dı waniyeni. Bê meyi bı zafî qê çiyêko bimbarek u şayi zi mewlid diyeno wendış.<sup>2</sup> Eğleb mewlidan dı gereka ini meseleyi biyeri ifadekerdiş: Xelqkerdişê nurê Peyxembertî, hemiltiya Hz.

2 Murat Varol, "Benateyê Mewlidê Mela Kamilê Pueği u Mela Mehamedê Muradonî Dı Yo Muqayese", *Anemon*, 2018 6(2), r. 287-288.

Amine, wefatê babiyê Peyxemberi, meseleyê acibi ê wextê biyayişê Peyxemberi, wesfi Peyxemberi, şekl u şemalê Peyxemberi, exlaqê Peyxemberi, nubuwetê Peyxemberi, mucizeyi Peyxemberi, meseleya İsrâ u Miraci, tebliğ u herbi ey, zewacê ey u tutanê ey u wefatê Peyxemberi.<sup>3</sup>

Şarê Zazayan, bısılmananê verinan ra ye. Mevlidê Peyxember, miyanê Zazayan dı zi zaf rağbet diyo. Heta eyro zafi mevlidî Zazaki ameyi nuştış. Mevlidî verin ê Zazaki, mevlidê Mala Ehmedê Xasi yo. Ê diyın inê Usman Efendiyo Babiji yo. Ini mevlidan ra pey zobina mevlidî ameyi nuştış. Mevlidê Mala Eliyê Huni, Mevlidîê Mala Kamilê Pueği, Mevlidê Mala Abdulqadir Muşeki uêb.

Mala Abdulqadirê Muşeki, nuştoganê muhiman ê edebiyatê klasiki ê Zazaki ra yo. O hem wayirê mevlidêk o u hem zi bî terzê klasiki dı nuşteyan nuseno. Ina xebat dı zi ma mevlidê ey girot dest u analiz kenî.

Mala Abdulqadir Muşeki serra 1968 dı dewa Muşek dı ameyo dınya. Dewa Muşek binateyê Çolig u Darêyeni dı ya. Mala Abdulqadir, ewlî babiyê xu ra ders geno, babiyê xu het Qur'ano Kerim waneno. Heta *İbn-i Qasım* babiyê xu het ders geno. Dıma serra 1982 dı Takueron (Büyüktökören) dı şino medresa. Tiya yo serr ders waneno, dıma şino qezaya Mardin Kızıltepe. Tiya dı çar-panc aşmî Seyda Şêx Mustafayı het waneno. Serra 1983 dı ina hew şino dewa Oğun ê Muşi. Mala, Oğung dı yo serr Mala Zeki het waneno. Dıma şino yona dewa Muşi. Nameyê ina dew Ardun a. Mala Abdulqadir ina dew dı nızdiya panc serri Mala Zeki ra ders geno. Dıma şino esker. Eskeri ra pey Mala Ezizi het yo serr ders waneno. Cuwapey reyêna şino Mala Zeki het, itya dı goreyê usulê medresa kitabo peyin *Cemu'l Cami* waneno. Ino kitab, kitabê fiqihî yo. Pê ino kitab tehsilê Malatî tamam beno. Mala Abdulqadir *Cemu'l Cami* ra pey yona dor şino Kızıltepe. Oca dı Şêx Selahadin ra icazet geno. Xulasa Mala Muşeki, medreseyanê Çolig, Mardin u Muşi dı des serri ilim tehsil keno. Mala serra 1992 dı Darêyeni dı dewa Rotuj (Tarlabası) dı dest bî wezife keno u oca dı 3 serri malatî keno. Serra 1995 dı yeno dewa xu Muşek u hali hazır zi dewa xu dı malatî rê dewom keno. Mala Abdulqadir bê mevlidî çendna eseri zi nuştî; labelê inî eseri hema neşir nebiyi

## 1. ŞIKLÊ MEWLİDÊ NEBÎ Ê MALA ABDULQADIRÊ MUŞEKÎ

### 1.1. Weznê Mevlidî

Mevlidan dı eğleb weznê aruz yeno şıxulnayış. Weznê aruz ra zi ey babî kılmi ki esti ey şıxulyeni. İnî weznanê kılman ra wezno ki mesnewiyan dı şıxuliyeno weznê Failatun Failatun Failun” o. Mala Muşeki, mevlidê xu bî weznê aruz u şeklê mesnewî dı nuştî. Ma eşkenî weznê mevlidê Mala Muşeki hına ramocnî ra:

3 M. Fatih Köksal, *Mevlid-Name*, Neşirxaneyê Weqfa Diyanet, Ankara 2011, s. 22-23.

Ez bı Bismil / lahi destı / pêkena  
 - . - - / - . - - / - . -  
 Numo şirin / ez qê yi dest / pêkena  
 - . - - / - . - - / - . -  
 Fa i la tun / Fa i la tun / Fa i lun

### 1.2. Rêzkerdışê Qafiyeya Mewlidi

Goreyê rêzkerdışê qafiye her beyit zerreye xu dı qafiye arda meydan.

Ez bı bismillahi destı pêkena	a
Numo şirin ez qê yi dest pêkena	a
Ma keni hemd u sena ey musluman	b
Yi do ma Pêğemberi axir zeman	b
O Allah o yi hidayet dawı ma	c
Nî'meti wêş dini İslam dawı ma	c

### 1.3. Qafiyeya Mewlidi

Şiir rêzan ra yena meydan. Têki şiiri bê wezn u hece têki zi bı hece u aruz yeni nuştış. Ey şiiri ki pê aruz u hece ameyi nuştış peyniya inan dı şair hunerê senatê xo mojneno ra. Ini senatan ra yo zi qafiye u redif i. Qafiye, peyniya dı rêzan dı eg kokê kelimeyan dı herfi bımani yobinan tiya dı qafiye vıraziyena.<sup>4</sup> Redif, badê qafiye ca gena u ey herfi ki wesleyan dı yeni nuştış ini herfi beni redif.<sup>5</sup>

#### 1.3.1. Qafiyeya Nimcet

Peyniya rêzanê şiir dı, wext yo herf bımano yobinan qafiyeya nimcet yena meydan. Mala Muşeki, ina beyita ciyerın dı hem redif hem zi qafiyeya nim icra kerda. Kelimayanê “pa, ca” dı herfa “a” qafiyeya nim hesabiyena.

Dest a wı tu dini tu ra **pa** nêverd  
 ‘Edas va ez çırrê din yi **ca** nêverd

#### 1.3.2. Qafiyeya Tam

Şiir dı peyniya rêzan dı eger kok dı, dı herfi bımani yobinan qafiyeya tam vıraziyena. Mala Muşeki ina beyita cêrin dı ina qafiye icra kerda. Peyniya kelimayanê “bıra u eşkera” dı herfi “ra” wertax i.

4 Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Neşırxaneyê TDK, Ankara 1999, r.59.

5 Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Neşırxaneyê Grafiker, Neşırê 5ın, Ankara 2011, r.198.

Cuapê heyyatî yî bunên ey **ıra**  
Çunki heyyatî yî nuro eşkera

### 1.3.3. Qafiyeya Zengin

Peyniya rêzan dî kokê kelimeyan dî eger hiri u hiri ra ziyeder herfi bîmani yobinan ina qafiye ra vanî qafiyeya zengin. Mala Muşeki, mevlidê xu dî zafî cayan dî ina qafiye icra kerda. Ina beyita cêrinan dî zi qafiyeya zengin icra biya.

Ma kenî hemd u sena êy musulman  
Yî do ma Pêyğemberî axir zeman

### 1.3.4. Qafiyeya Tunç

Peyniya rêza verin dî kamci kelîma esta eg ina kelîme zereyê rêza diyîn dî zi ca bigero ineyî rê vanî qafiyeya tunç. Mala Muşeki, mevlidê xu dî ina qafiye zaf weş şixulnaya.

Merheba tu r' rueşniyê çımuni **ma**  
Merheba tu r' piyurê ma fidyê **şıma**

### 1.3.5. Redif

Peyniya rêzane şîir dî herfi kî hem nuştîş hem zi menayê inan yo ya, inan ra vanî redif. Peyniya rêzan dî badê qafiye yena nuştîş. Bê qafiye redif xu ser icra nêbeno. Gera redif ra ver qafiye bîbo.

Mekki Mukerrem şehir u emin **ib**  
Çı yazığ qê cehalet ir zemin **ib**

Ina beyta corin dî peyniya wîrdî rêzan dî wesla “ib” esta. Hem wendîş hem zi mena yo ya. Edebiyat dî ino hal pê nameyê “redif” yeno zanayîş. Redif ra ver zi peyniya kelîmayanê “emin-zemin” dî qafiyeya tunç icra biya.

## 2. MUHTEWAYA MEWLÎDÊ MALA ABDULQADIRÊ MUŞEKÎ

Mala Muşeki, mevlidê xu bînatê serranê 1992-1995 dî nuştî. Inî hiri serran dî nuştîşê mevlidê xu temom keno. Dewa xu Muşeki dî bî ardîmê yo hevalekê xu destnuştîyê xu erzeno compitîr. Mevlid, 268 beyitan ra yeno meydan. Bila inî beyitan peyniyê her yo qîsım dî zi yo beyta naqarat yena nuştîş. Ina beyta naqarat dî selat u selam yeno nuştîş. Mevlid 15 qîsım ra yeno meydan:

### 2.1. Behsê Bismillah

Ino behs 14 beyitî yo. Pê nameyê Homayî dest pêkeno. Homayî bîsılmanan rê Peyxember şîrawîto, hîdayet nasîbê inan kerdo, inan rê berê cenetî akerdo.

Her wırdi dınyayan dı zi Homê nimeti dayi insanan . Qey iney lazımo bısılmanê Homayi rê şıkır bıkeri.

Ez bı bismillahi dest pêkena  
Numo şirin ez qê yi dest pêkena

Ma keni hemd u sena êy musluman  
Yi do ma Pêyğemberi axir zeman

## 2.2. Behsê İcadê Mewlidi

Ino behs 15 beyiti yo. İcad u ehemmiyetê mewlidi ra behs beno. Ino qısım dı vaciyeno ki mewlido tor verin hirsê serr mergê Hz. Pêxemberi ra pey nusiyayo. Lazım o eyro zi insanı hem qedr u qıymeti mewlidi bızani u hem zi bıwani.

Ger tı wazên wahari xêr ib bıra  
Guêş xu bîdên mewlidi Peğembera

Hiri asir bad Peğembêr icad bu  
Padişah Melik muzeffer tertib ku

## 2.3. Behsê Adabê Mewlidi

Ino behs 16 beyiti yo. Mala ino qısım dı adabê mewlidi ser vındeno. Hem mewliddayış, hem zi Homayi rê bêitiatiya şari ra ecız beno u iney tenqîd keno. Seyda tiya dı insanan iqaz keno u vano mewlid u çiyi herami yo ca dı nêbeni.

Tay İslami qê şuhret mewlid duni  
Yi vuni sewab u amel ma geni

Halbuki sewab u amel çinu yi ri  
Lakin ezab u cehennem qê yi ri

## 2.4. Behsê Wextê Cehaleti

Ino behs 15 beyiti yo. Ino behs dı dınya rê ameyişê peyxemberi ra ver weziyetê Mekke ra behs beno. Zê putperesti, gani defınkerdışê keynayanê qıckekan, zulım u heqaret, xırabiya Mekkeyıcan ra behs beno.

Kênê tıfil guni eştê bin qumi  
Yın vatên ina dunya d' ma hakımı

Etraf beytullê dekerd ib put bı put  
Yın vatên Allê Homayi ayi puit

### 2.5. Behsê Hz. Ademi

Ino behs 17 beyiti yo. Mewzuyanê xelqkerdîşê Hezreti Ademi ra, isyanê şeytani ra, erdan ser ameyayîşê Hz. Ademi u Hz. Havva ra u qeblbiyayîşê tobeyê inan ra behs beno.

Allê waşt Ademi xulqu bıkeru  
Hem y1 ra zurriyeti zedi bıkeru  
Emir herr kerd va bıb Adem ey1 herr  
Ruh eşt yi w1 kerd xelifi ardı ser

### 2.6. Behsê Ecdadê Nebi (as)

Ino behs 25 beyiti yo. Tiya dı Hz. Ademi ra heta babiyê Peyxemberi, ecdadanê Peyxemberi ra behs beno. Hz. Ademi ra heta Hz. Muhammedi (a.s.) ameyayîşê nurê peyxemberti ra zi behs beno.

Ewwela nuri Muhammêd Mustefa  
Adêm ra umı rasa Şis bı wefa  
Ebdulmutterlib va ey ewladi mı  
Allah yo şerefu pılı dumı tı

### 2.7. Behsê Qıctiya Nebi (as)

Ino behs 17 beyiti yo. Ino behs dı biyayîş ra heta wehiya verin heyatê Peyxemberi (a.s) ra behs beno.

Duyesi aşmê Rebi'ulewweli b'  
Şewa dışenbı umı dñnya hebib  
Umri Muhammêd umı duyese sêrr  
Wu Ebutalibi şı karwani ser

### 2.8. Behsê Exlaqê Nebi (as)

Ino behs 14 beyiti yo. Mala tiya dı exlaqê Peyxemberi wesifneno u bısılmanan ra vano şıma zi zê Peyxemberi bıbên merdumi exlaqweşi.

Ger tı wazên İslami exlaq bıgêr  
Ef'alun ehwalun Resul xu r' bıgêr  
Xızmeti xu yi xu ri kerdê Resul  
Zerrê kê xu d' xızmkar nêkerd qebl

### 2.9. Behsê Hamlê Amine

Ino behs 13 beyiti yo. Ino behs dı mudeyê hamiletiya Hz. Amine fekê ay ra ameyo vatîş. Her aşm dı yo peyxember - Hz. Adem, Hz. Şis, Hz. İdris, Hz. Nuh,

Hz. Hud, Hz. İbrahim, Hz. İsmail, Hz. Musa u Hz. İsa - sılam dano Hz. Amine u mijdana Hz. Muhammedi dano ay.

Aşmê ewwil umı Adem va kelam  
 Êy Muhammed merheba yi da selam  
 Aşmê şeşın mı di İbrahim Xelil  
 Va Amine hamil tu Resulu pil

### **2.10. Behsê Rocê Wiladeti u Wefat**

Ino behs 18 beyiti yo. Hem rocê biyayiş hem zi rocê wefatê Peyxemberi roco dişeme yo. Mala, ino behs dı muhimiya inê roci ser vındeno.

Hebib Allê yo hedıs ıd kerd beyan  
 Amêl ummet dı rueji mi r' ben 'eyan  
 Ruej dişenbı u ruej paşenbı ben 'eyan  
 Amêl ummet qê mı ri Reb kerd beyan

### **2.11. Behsê Taifi**

Ino behs 27 beyiti yo. Ino qısım dı Taif şiyayişê Peyxemberi ra behs beno. Peyxember Taif dı eziyet vineno, cuwapê dı bırayi pê xızmkarê xu cı rê engur şıraweni. Xızmkar Addas wext engur dano cı, Hz. Peyxember vano "Bismillah" u engur weno. Addas menayê Bismillah perseno u dıma bı Peyxemberi iman ano.

Yo duenım Resuli Ekrem şı sefer  
 Vêr xu da wı şı bajar Taifi ser  
 Pêğemberi wexta gu engurı werd  
 Va bı ismillahi cuapê destpê kerd

### **2.12. Behsê Hicreti**

Ino behs 31 beyit o. Mewlid dı behso tor derg ino behs o. Mekke ra veciyayiş u Medina resayişê Hz. Peyxemberi ra behs beno. Wext Hz. Peyxember niyet keno Hicret bıkeru, muşriki yeni yoca u wazeni Hz. Peyxemberi bıkişi. Mala ina hedise ra zi behs keno.

Hebib Allê wı şı kê Ebabekir  
 Va ma piya xu r' Medina ya Bekir  
 Ruej paşembı Mekki ra vêja Nebi  
 Ruej dişenbı daxılı Medina bi

### **2.13. Behsê Herbê Uhudi**

Ino behs 9 beyiti yo. Herbê Uhudi dı Peyxemberi u bısılmanan zaf cefa di, zaf sahabeyi biyi şehid. Ina tengasi dı zi Peyxemberi dua kerd u dorêna exlaqê xu yo weş muet ra. Ino qısım dı bıxısusiyet iney ra behs beno.

Hali Resul wexta gu sehabu di  
 Va zutu bîd tî qê yîn ir ya Nebî  
 Resulî va ez niyumeya şawtîşî  
 Qê le'net u zutun a newaştîşî

### 2.14. Behsê Merheba

Ino behs 12 beyiti yo. Mevlidan dî behsê merheba, welîdyayîşê Hz. Amine ra pey ca geno. Labelê Seydayê Muşeki peyniya mevlidî dî ca dayo qısımê merheba. Ino qısım dî hem hemd u şikir hem zî şefaetwaştîş esto.

Merheba tu r' sari çimu ser umê  
 Merheba tu r' nuri çimu tî umê  
 Merheba tu r' rehmeten lil 'alemin  
 Merheba tu r' xatimen lil murselin

### 2.15. Behsê Dua

Ino behs 25 beyiti yo. Mevlid pê dua qediyeno. Seyda tiya dî hem qê xu hım zî qê ummeta Muhammedi dua keno.

Ya Resul tî seyyidi kewnu mekan  
 Ya Nebî tî qasîdî axir zeman  
 Qê Muhammed esselatu wesselam  
 Şıma bunên Fatıha yîn ser tamam

## 3. HUNERÎ EDEBÎ Ê MEWLİDÊ MALA ABDULQADİRÊ MUŞEKÎ

Mala Muşeki wextê nuştîşê mevlidê xu dî, mevlidî ki ey ra ver ameyî nuştîş, inî mevlidî xu rê kerdi rehber u bî qaideyê inan mevlidê xu nuşt. Mala Abdulqadir, hem ilmê xu hem zî senatê xu ino mevlid dî mojneno ra. Ey mevlidê xu bî ilmê edebiyat nuşt. Mala Muşeki, mevlidê xu dî çî senatî edebî icra kerdi ma tiya dî inan izah kenî.

### 3.1. Aliterasyon

Şiir dî yo herfa bêveng ya zî yo hece eger çend dori biyero vatîş inay ra vanî aliterasyon. Ina herf ya zî ina hece hem xıtabê çıman hem zî xıtabê goşan kena. Inî herfî u heceyî unsurê aheng ê. Pê ino senat ahengêk yeno meydan.<sup>6</sup>

Aliterasyon senatê mena niyo, senatê ahengi yo. Şair pê mena nê, pê vengê herfan senatê xu icra keno. Ino senat, senatê şikl yo<sup>7</sup>

6 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, Neşirxaneyê Akçağ, Ankara 1995, r.34.

7 İsa Kocakaplan, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, Neşirxaneyê Türk Edebiyat Vakfı, İstanbul 2005.

**Şeytuni** va ez qulun tu **şaş** kena

Ay ig ze'if yın heq ra ez **kaş** kena

Ina beyita corin dı Mala Muşeki, pê herfa “ş” senatê alterasyon icra kerdo. Çend dori vatişê herfa “ş” ahengêk virazeno.

### 3.2. Husnê Telil

Dınya dı her çi yeno meydan, ini çiyi ki yeni meydan ciya ciya sebebê inan esto. Varayişê varonî, xılqetê kainati, germiya tij uêb. Feqet hunermendê edebiyat, sebebê inê çıyan zobina tarif keno. Yani sebebê meydan ameyayişê yo mesela keni rınd u ino zi beno husnê telil. Sebebê vıraştışê inê çıyan beno vin u sebebê huner kuweno meydan.<sup>8</sup>

Ey Muhammed qê tu wa kewnu mekan

Ardı wucud ku tamam Reb ın mekan

Yo hedisê Peyxemberi (sahih niya) dı yeno vatiş ki dınya qey xatirê Peyxemberi ameya vıraştış. Mala Muşeki zi ina hedis xu rê mesned keno u sebebê vıraştışê dınya besteno xatirê Peyxemberi ra. “*Qey xatirê tu nêbo dınya nêameni vıraştış*” edebiyat dı ina mesela ra vani husnê telil. Yani sebebe vıraştışê kainati pê sebebêko rınd yeno ramotış.

### 3.3. İntaq

Ino senat “qıseydayış” o. Ey mexluqati ki nêşkeni qısey bıkeri pê ino huner diyeni qıseykerdiş. Eğleb intaq u teşxis yo ca dı şıxuliyeni. Qıseykerdiş, hunerê insani o. Wext nuştoğ qayil bo yo çi bido qıseykerdiş, ewlî pê senatê teşxis ey çi keno insan badê cı zıwan erzeno fek u dano qıseykerdiş.<sup>9</sup> Temamê senatanê intaq dı senatê teşxis zi esto, feqet tamamê senatanê teşxis dı senatê intaq şert niyo.<sup>10</sup>

Şewê wiladêt wırışt we dar u ber

Esselam hem merheba yın da tu ser

Ina beyit dı dar u ber diyeno qıseykerdiş. Dar u ber, selam dano Peyxemberi. Qıseykerdiş, hunerê insanan o. Ina beyit dı ino hunerê insanan diyayo dar u beri. Dar u ber sey insanan merhaba dayo Peyxemberi. Nuştoğ, pê ino senat mewcudat dayo qıseykerdiş. Dar u ber ker u lal i; labelê sayeyê ino senat dı zıwan koto inan fek.

### 3.4. İstiare

Her çi bı nameyê xu yeno şınasnayış. Eg yo çiyi ki bı nameyê xu yo ki herkes zano pê ey nê, pê zobina yo name biyero şıxulnayış ino senat viraziyeno. Feqet

8 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, r.265.

9 Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, r. 70.

10 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 209.

şıxulnayişê ino name dı gereka benateyê wırdi çıyan dı elaqe bıbo. Nameyo esıl niyeno vatiş, nameyo ki herında nameyo esıl geno, o yeno vatiş. Ino senat dı hem mecaz hem zi teşbih esto.<sup>11</sup>

Merheba tu r' sari çımu ser umê

Merheba tu r' **nuri çımu** tı umê

Mala Muşeki ina beyita corin dı senatê istiare ra fayde diyo. Sayeyê ino senat dı Peyxemberi ra vano, “nuri çımu”. Nurê çıman qey insanan çiyêko muhim o. Çiyêko zaf biyero heskerdış tera vaciyeno. Nuştoğ, tiya dı herında nameyê Peyxember dı “nuri çımu” şıxulnayo.

### 3.5. İstifham

Ino senat dı pers yena persayış. Labelê ina pers baweyê cewab niya. Yani meqsedê pers cewabwaştış niyo. Nuştoğ qayilo şıira xu dı quwet bıdo his u mena. Ino semed ra persêka qestikin perseno. Qest ra perseno; la cewab nêwazeno.<sup>12</sup>

Bı çı rı wa in venên vun ya Resul

Tı şefa'et bıker Allah ken qebul

Mala Abdulqadir, ina riyeza yoyin a beyita corin dı senatê istifham icra kerdo. Mala, cewabê ina pers nêwazeno. Xu bı xu vano; ina milet bı çı rı vendena Peyxemberi, ini gunahkari pê çı rı vendeni Peyxemberi u vani tı ma rê bıbi şe-faatkar.

### 3.6. İştıraq

Ferheng dı menaya ina kelima “ziyedoni” ya. Edebiyat dı ina ziyedoni hına yena vıraştış. Kokê yo kelima ra çendnê kelimeyi yeni vıraştış. Eg çend hebi kelimeyi yo kok ra biyeri vıraştış u ini yo beyit dı biyeri yoca ino senat yeno meydan. Kok yo yo; labelê menaya inan yo niya.

‘Ednan ra bi hetta Adem ixtilaf

O binatı d’ ‘alimu tê kerd xilaf

“İxtilaf u xilaf” wırdi zi kelimeyi ‘Erebki yi. Kokê inan yo yo, xilaf kokê keli-ma yo. Mala Muşeki ina beyit dı ini wırdi kelimeyi zi şıxulnayı.

### 3.7. İqtibas

Menaya ina çeku “guretiş, emonet guretiş ” a. Yani çekuyêk ya zi riyezêkê zobina kesan ya tam ya nime yan zi bı mena guretiş o. Nuştoğ qayilo şıira xu hetê mena ra zengin kero. Ino semed ra qıseyanê verinan, hedisan u ayetan ra iqtibas vırazeno. Mala Muşeki zi mevlidê xu dı zaf cayan dı ino senat şıxulnayo. Ayet u hedisi kerdi şahidê rêzanê xu.

11 Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 412-414.

12 Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r.456.

Merheba tu r' rehmeten lil 'alemin

Merheba tu r' xatimen lil murselin

Mala Muşeki ina beyita corin dı senatê iqtibas şıxulno. Sureya Enbiya Ayetê 107. dı Homa vano; “Ya Muhammed! Ma tı qey rehmet şırawıtı ina dınya”. Mala Muşeki zi menaya ino ayet ardo eşto beyitê xu. Ino rıd ra ina beyit dı senatê iqtibas icra biyo.<sup>13</sup>

### 3.8. Mecazê Mursel

Yo qalêk bila meqsedê teşbih herında yona qal dı biyero vatiş, senatê mecazê mursel vıraziyeno. Ino senat dı gereka, dı şerti biyeri ca. Şerto verin gereka menaya raştikin niyero vatiş, yo zi gereka tede nişaneyê menaya verin ca nêgero.

Hebib Allê bêr xu ra umı tever

Di muşriku fêk beri guret yuver

Peyxemberê dinê İslam, Hz. Muhammed o. Nameyê ey Ehmed, Muhammed u Mustafa yo. Labelê bila inı hiri nameyan zaf sıfatê Peyxemberi esti. İnı sıfatın ra yo zi “Habibullah” o. Mala Muşeki riyeza yoyın a beyita corin dı herında Peyxember dı, kelimaya “Hebib Allê” şıxulnayo.

### 3.9. Mubalağa

Hunermendi şiiranê xu pê senatê huneran nuseni. Şiira ki bêhuner a, şiira hol qebul nêbena. Nuştoğ huneranê edebiyat ra fayde vineno. İnı huneran ra yo zi mubalağa ya. Ino senat dı meqsed tesirê lafzan ziyedkerdiş u eğleb heyecandayış o. Ino semed ra ê çiyi ki qiji, gırd mojıniyeni ra.<sup>14</sup>

‘Alim u katib ummet piyor biyêr yoca

Hesabdar ‘ilmi munecim biyêr yoca

Defter u qelemin yın piyor iz qêdên

Ya Resulallah wesif tu nêqêdyên

Nuştoği mewlıdan, wesfanê Peyxemberi qasê ilm u hunerê xu wesifneni. Mewlıdan dı ca dani inı wesfanê Peyxemberi. İnı beyitanê corinan dı Mala Muşeki, wesfanê Peyxemberi ra behs keno. Vatişê wesfanê ey dı qala xu derg nêkeno. Sayeyê senatê mubalağa dı, pê yo-dı beyit zaf wesfanê Peyxemberi keno tamam. Vano “Ez xura nêşkena tamamê wesfanê tu vaji; alım u katibi biyeri yoca, hesabdar u munecimi zi biyeri yoca, reyna zi nêşkeni wesfanê tu bıqedini. Defter u qelemin inan qediyeni; labelê wesifi tu nêqediyeni.” Bı ino hal semedê senatê mubalağa misalêko rınd yeno meydan.

13 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 278.

14 Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, r.72.

### 3.10. Nida

Vêndayîş, qehuriyayîş, şaşmendîş, yersbiyayîş uêb pê berzbiyayîş ya zi pê kemkerdîşê vengê insani icra benî. Edebiyat dî belukerdîşê ini hisan rê vanî, senatê nida. Ini hisî pê çekuyanê “ya, ey, ho...” xu mojnenî ra. Şiiran dî ini çekuyî vengîni eg estî tiya dî senatê nida esto.<sup>15</sup>

**Ya Resul** numê tu weş exlaq tu weş

**Ya hebib** Allê tî kumca b’ uca weş

Ina beyita corin dî senatê nida ca geno. Riyeza ewilîni dî “ya Resul”; riyeza dîyîni dî “ya Hebib” numuneyî senatê nida yî.

### 3.11. Tekrir

Şiir dî, semede zıxmkerdîşê mena ge ge eyîni kelîma çend dori yena vatîş. Ino têdîma vatîş rê tekîrî vaciyeno.<sup>16</sup>

Merheba tu r’ sari çîmu ser umê

Merheba tu r’ nuri çîmu tî umê

“Merheba” yo qîsîmê mewlîdan o. Temamê mewlîdan dî ino qîsîm esto. Çî zîwan dî nusîyeno wa binusîyo ino qîsîm ca geno. Ino qîsîm sare ra heta peynî pê merheba vajiyeno. Ina kelîmaya merheba, zaf dori yena vatîş. Beyita corin u tamamê inê qîsîmî dî çekuya “merheba” têdîma ameya vatîş. Ini têdîma vatîşî senatê tekîrî o.

### 3.12. Telmih

Ferheng dî menaya ey “virardîş” o. Nuştoğ yo çîyo ki şar zano, verco biyo muracatê inê durubê emsalan keno. Ey meseleyî ki verco biyî u viyertî inan ano virê insanan. Ino virardîş senetê “telmih” o. Telmih dî tamamê mesela niyena vatîş. Dor bena mesela ça dî biya teyna o ca yeno vatîş, dor bena nameyê mesela yeno vatîş u dor zi bena ina mesela kam serî ameya vatîş, a yena vatîş.<sup>17</sup>

Kênê tîfil gunî eştê bin qumî

Yîn vatên ina dunya d’ ma hakîmî

Bîsîlmantî ra ver cezîreya Erebiistan dî dorê cahîltî bî. Cahîltî tamamê Erebiistan guretî xu dest. Nê dîn bîbî nê iman bîbî nê zî medeniyet bîbî. Ê adetanê cahîltî ra yo zi kıştîşê keynayanê qîjan o. Kam cî rê keyna bîbên berdên kıştên u eştên bînê qumî. Hîndêk cahîlî bî biyayîşê keynaya qîj kemasi qebul kerdên. Mala Muşeki ina meselaya ki herkes zano, ina beyita corin dî ca dayo cî.

15 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 429.

16 Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 452.

17 Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, r.77.

### 3.13. Tenasub

Ferheng dı menaya cê “mınasıb” a yan “mınasıbê yobinan biyayış a”, aheng a. Ê kelimeyi ki benateyê inan dı bila tezat elaqeyê mena esto, ey kelimeyi yo beyit dı biyeri yoca senatê tenasub icra beno.<sup>18</sup>

Tu yo waqıt **xebera fahiş** nêdên

**Le’neti nêng xebera pis** yi nêdên

Beyita corin dı ê kelimeyi ki benateyê inan dı elaqe esto ameyi yoca. Hemeyê ini kelimeyan, kelimeyi xırab i. Şair, “xebera pis, xebera fahiş, le’neti u neng” yo beyit dı şıxulnayı.

### 3.14. Teşbih

Ino senat dı ê çiyi ki benateyê inan dı elaqe esto, inan ra çiyi ki zeyif o, pê çiyêko zıxm teşbih beno ya zi çiyêko qj pê çiyêko gırd teşbih beno. Yani o çiyi zeyif u feqir, pê çiyi zıxm u zengin teşbih beno.<sup>19</sup>

Uniya kalmê hê yın ıd yi gawırı

Piyorı yını ti vuni cınawırı

Teşbih dı egleb çiyi zeyif pê çiyi zıxm teşbih beno. Ina beyita corin dı ina mesela esta. Ê muşriki ki verê berê Peyxemberi dı vınderte yi, heti zıxmi ra zê cınawırı teşbih biyi.

### 3.15. Teşxis

Kainat dı bê insanan, gani u camid zaf mexluqati esti. Labelê bila insanan qet yo mexluq nê qısey keno nê zi zê insanan fikriyeno. Hunermendi semedê ino huner, heme mexluqat zê insanan qebl kenı. Iney rê vani senatê teşxis. Sayeyê ino senat dı hunermend şiiira xu keno weş, keno zengin. Nuştoğê ma Mala Muşeki, ina beyita cêrin dı ino senat icra kerdo.

O zamun insuni rahetı beni

Put u senêmxu r’ huzur vineni

Put u senemi bê can u bê ruh i. Huzur diyayış, yo qabiliyetê insanan o. Put, insan dest ra yeno vıraştış. Nê ruh tede yo nê zi gani yo. Sey insanan nêfikriyeno. Labelê nuştoğ ina beyit dı vano put u sanemi huzur vineni. Nuştoğ, pê ino senat put u seneman sey insanan qebl keno.

18 İskender Pala, *Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 448.

19 Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, r. 405-406

### 3.16. Tezad

Goreyê mena ê kelimeyi ki benateyê inan dı zıdı esta u eg yo riyez yaxut yo beyit dı biyeri şıxulnayış beno senatê tezat. Senatê tezat, hem menaya raştikin dı hem zi menaya mecazi dı beno.<sup>20</sup>

Nur mı ra vêjenu wı parçı benu

Yo şını şerq yo şını ğerb wı yenu

Mala Abdulqadir Muşeki, mewlidê xu dı ino senat zaf şıxulnayo. Dınya dı her çı bı zidê xu qıymet vineno. Heta xırabi niyero kerdış qıymetê holi nêzaniyena. Heta têsani çin bo qıymetê aw nêzaniyeno. Ini sebaran ra zafê nuştoğan şıiranê xu dı bı meqsedê zıxmkerdişê mena muracatê ino senat kerdo.

Riyeza dıyın a ina beyit dı “şerq u ğerb” yoca dı zıkır biyi. Miyanê şerq u ğerb dı yo tezati esta. Menayê şerq “rojvete” yo; ê ğerb zi “rojawan” o. Mala Muşeki pê ini wırdi kelimeyan senatê tezat icra kerdo.

### NETİCE

Ina xebat dı, mewlidê Mala Muşeki hetê şekl, muhtewa u huneranê edebiyân ra tetqiq biyo. Destpêkerdiş dı derheqê mewludan u heyatê Muşeki dı melumat diyayo. Dıma hiri qısmın ser mewlidê Muşeki ameyo tehlilkerdiş.

Qısmê verini dı hetê şekl ra mewlid geriyayo dest. Wezn u rêzkerdişê qafiyeya mewlidê Muşeki, bı misalan ameyi ramotış. Verco qafiye u redifê mewlidi tesbit biyi. Qafiyeya nimcet, qafiyeya tam, qafiyeya zengin u qafiyeya tunc ameyi tesnifkerdiş. Mewlidê Muşeki dı eğleb qafiyeya nimcet u qafiyeya tam şıxuliyaya.

Qısmê dıyın dı muhtewaya mewlidi ser izahat vıraziyayo. Mewlidê Mala Muşeki 15 qısmın ra yeno meydan. Her yo qısm derheqê yo mewzu dı ameyo nuştış: behsê bismillah, behsê icadê mewlidi, behsê adabê mewlidi, behsê wextê cehaleti, behsê Hz. Adem’i, behsê ecdadê nebi (as), behsê qıctiya nebi (as), behsê exlaqê nebi (as), behsê hamilê Amine, behsê rocê wiladeti u wefat, behsê taifi, behsê hicreti, behsê herbê uhudi, behsê merheba, u behsê dua. Ma her qısmê mewlidi dı çıtayi ra behs biyo, inı analiz kerdi.

Qısmê peyin dı zi huneri edebi ê Mewlidê Muşeki ameyi ramotış. Mewlid dı 16 huneri edebi tesbit biyi; aliterasyon, husnê telil, iqtibas, intaq, teşxis, istiare, istifham, iştıraq, mecazê mursel, mubalağa, nida, tekrar, telmih, tenasub, teşbih u tezat. Ino huneran ra ekseri teşbih, teşhis, mubalağa u nida ameyi şıxulnayış.

20 Muhsin Macit, Uğur Soldan, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, r. 74.

**ÇİMEYİ**

- Dilçin, Cem, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Neşirxaneyê TDK, Ankara 1999.
- Kocakaplan, İsa, *Açıklamalı Edebi Sanatlar*, Neşirxaneyê Türk Edebiyat Vakfı, İstanbul 2005.
- Köksal, M.Fatih, *Mevlid-Name*, Neşirxaneyê Weqfa Diyanet, Ankara 2011.
- Macit, Muhsin, Soldan, Uğur, *Edebiyat Bilgi ve Teorileri El Kitabı*, Neşirxaneyê Grafiker, Neşirê 5ın, Ankara 2011.
- Mala Abdulqadirê Muşeki, “Mewlidê Nebi” (Transkripsiyon: Murat Varol), *Vir*, Omar: 2, Serr: 2016, r. 7-30.
- Özel, Ahmet, “Mewlid”, *DİA*, Cilt: 29, Neşirxaneyê Weqfa Diyanet, Ankara 2004, r.475-479.
- Pala, İskender, *Divan Şiiri Sözlüğü*, Neşirxaneyê Akçağ, Ankara 1995.
- Pala, İskender, *Mevlid*, Neşirxaneyê Kapı, İstanbul 2009.
- Şeker, Mehmet, “Mevlit”, *DİA*, Cilt: 29, Neşirxaneyê Weqfa Diyanet, Ankara 2004, r.479-480
- Varol, Murat, “Benateyê Mewlidê Mela Kamilê Pueği u Mela Mehamedê Muradoni Dı Yo Muqayese”, *Anemon*, 2018 6(2), r. 287-291.
- Varol, Murat, “Zazalarda Mevlit ve Siyer Geleneği”, *II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu* (4-6 Gulan 2012), Neşirxaneyê Üniversiteya Bingoli, İstanbul 2012, r. 625-652.

# METN Û DANASÎNA FİQHNAMEYA HEYDERÎ

**Heyderî'nin Fıkhnamesi'nin Metni ve Tanıtımı**  
The Text and an Introduction to the Fıqhnameh of Heyderî

**Muhammed İkbâl DENİZ<sup>1</sup>**

---

## **Kurte**

Di nav ‘ilmên Îslamî yên mîna tefsîr, kalam, hedîs, qira’et û usûlên wan de, ‘ilmê fiqhê angî ‘ilmêhal jî wek ‘ilmekî esasî cih girtiye. ‘ilmê fiqhê, di edebiyatên rojhilatê yên klasîk de jî bo perwerde û teblîxa dînê Îslamê bûne wek çavkanî. Berhemên ku di edebiyata klasîk de bi vê mebestê hatine nivîsîn wek “fıqhname” hatine binavkirin. Di fıqhnameyan de mijarên Îslamî ên ferdî û civakî ên ku vabestê hukmeke emelî ne, bi zîmaneke edebî û bi şêwazeke dîdaktîk tîne nivîsîn. Ev cure berhem bi gelemberî menzûm in û di şîklê mesnewîyan de ne. Mijara xebata me jî li ser fıqhnameyeke kurmancî ye ku jî aliyê nivîskareke kurmancî, Şêx Muhammed Emînê Heyderî ve hatiye nivîsîn. Ev fıqhname wek destxet di erşîva Mehmet Zahir Ertekin a taybet de heyê. Me jî vê fıqhnameyê jî tîpên erebî latinîze kir û di bin van beşan de vekola: 1-Destpêk, 2-Navê Berhemê û Nusxeyên Wê, 3-Muellifê Berhemê, 4-Tarîxa Nivîsandina Berhemê û Sebebê Te’lîfa Wê, 5-Taybetmendiyên Teşeyî yên Berhemê, 6-Naveroka Berhemê, 7- Zîman û Şêwaza Berhemê û 8-Beşa Transkrîba Metnê.

**Bêjeyên Sereke:** ‘ilmê Fıqhê, Fıqhnameyên Kurmancî ên Menzûm, Heyderî, Destxet, Transkrîb.

## **Abstract**

Islamic laws (fiqh) such as the methods of tafsir, kalam, hadith and recitation are among the fundamental sciences. The knowledge of fiqh which has been

---

1 Öğr. Gör. Zanîngeha Bîngolê, Beşa Zîman û Edebîyata Kurdî, mideniz@bingol.edu.tr

mentioned in the oriental literature, has been a major source for the education and announcement of Islam. These kind of products that mention the knowledge of fiqh are called fıkhname “fiqhnamehs”. In the fıqhnamehs, practical issues that have a social or individual religious decree are retreated by a literary and didactic style. These type of products are generally written in verses and in mathnawi form. This study discusses the fıqhnameh of Şeyh Muhammed Emin Heyderî that is written in the Kurmanji dialect of Kurdish. The manuscript of this fıqhnameh is available in the private archive of Mehmet Zahir Ertekin. The manuscript was transcribed in Latin alphabet by the author of this article. This study introduces the work and presents the transcribed text. The titles of the study is as follows; 1. Introduction, 2. The Name and the Copies of the Work, 3. The Author of the Work, 4. The Writing Date of the Work, 5. The Form and the Rhythm of the Verse, 6. The Contents of the Work, 7. The Language and the Genre of the Work and 8. The Transcribed Text of the Work.

**Keywords:** Science of Fiqh, Fiqhnames in Kurdish Verse, Heyderî, Manuscript, Transcript.

## Özet

İslamî ilimler içerisinde tefsir, kelim, hadis, kıraat ve usul ilimleri gibi fıkhî ilimler de temel ilimler arasında yer almaktadır. Klasik doğu edebiyatlarına da konu olan fıkh ilmi, İslam dininin öğretimi ve tebliği için büyük bir kaynak oluşturmuştur. Fıkhî ilimleri konu alan bu tarz edebî eserlere “fıkhname” denilmektedir. Fıkhnamelerde, amelî olup dinî bir hükme bağlı olan toplumsal veya ferdî bir konu, edebî bir dil ve didaktik bir üslûpla işlenir. Bu tür eserler genellikle manzum olarak kaleme alınır ve mesnevî şeklindedir. Bu çalışmamız da Şeyh Muhammed Emin Heyderî'nin, Kürtçe'nin Kurmancî lehçesi ile yazdığı fıkhnamesini konu edinmektedir. Bu fıkhname el yazması şeklinde Mehmet Zahir Ertekin'in özel arşivinde bulunmuştur. Daha sonra da tarafımızdan latînze edilmiştir. Bu çalışmamızda hem eserin tanıtımını yapacak hem de latinize ettiğimiz metni sunacağız. Çalışmamızın temel başlıkları şunlardır: 1. Giriş, 2. Eserin Adı ve Nüshaları 3. Eserin Müellifi, 4. Eserin Yazılış Tarihi ve Yazılış Amacı, 5. Eserin Nazım Şekli ve Vezni, 6. Eserin Muhtevası, 7. Eserin Dil ve Üslûbu 8. Eserin Transkripsiyonlu Metni.

**Anahtar Kelimeler:** Fıkh İlmi, Kürtçe Manzum Fıkhnameler, Heyderî, El Yazma, Transkrip.

## 1. Destpêk

Edebiyata klasik, bi sedan sala xeynî berhemên beşerî, berhemên dînî jî di repertûara xwe de bi cîh kirine. Di edebiyata klasik a rojhilatîyan de cureyên edebî yên dînî di nava xwe de li ser çar beşên sereke dikarin bîn dabeşkirin:

Cureyên bi Xwedê re têkildar, cureyên bi Pêxember re têkildar, cureyên dînî-tarîxî û cureyên bi zanistên Îslamî re têkildar.<sup>2</sup> Helbet her cure li gorî teşe û mijarê tê binavkirin. Wek çawa ku em ji helbestên li ser mebhesa hebûn û yekîtiya Xwedê re tewhîd û teşeya wê re jî qesîde dibêjin wisa jî zanistên Îslamî yên wek ‘eqîde, fiqih, hedîs û tecwîdê jî bûne mijara mesnewiyên dîdaktîk. Eger mijara mesnewiyekê zanista ‘eqîde/‘eqaidê be ew wek “ ‘eqîdename/ ‘eqaidname” û eger zanista fiqhê be wek “fiqihname” eger zanista tecwîdê be wek tecwîdname tê binavkirin.<sup>3</sup>

Fiqih di Qur’anê de, bi gelemperî bi wateya “têgihêştina tiştekî bi têr û tam, fêmkirin û zanîna heqîqeta tiştekî” ye. Fiqih, piştî ku bûye şaxeke ilmî û furûatên dînî, agahî û hukmên emelî di xwe de civandî ye, êdî mijarên wî jî roj bi roj berfirehtir bûye.<sup>4</sup> Berhemên ku li ser fiqhê hatine nivîsîn jî wek ilmêhal tê binavkirin. Alimên musulman, dema ku di nav jiyana ilmî û civakî de kêmasiyek an sistiyek an yeknesaniyek û xirabiyek dîtine dest bi nivîsîna van ilmêhalan kirine.<sup>5</sup> Ev ilmêhal wek ku me li jorê jî gotiye, demek şunde bûne mijara edebiyata klasik jî. Di edebiyata klasik de şair û nivîskarên ev cure berhem, hem mensûr û hem menzûm telif kirine.

Di warê cureyên edebî yên bi zanistên Îslamî re têkildar de, xeynî zimanê erebî, farişî û tirkî bi zimanê kurdî jî gelek berhemên menzûm hatine nivîsîn. Dema em li fiqhnameyên menzûm ên edebiyata kurdî dinihêrin, em digihêjin van agahiyan: “Di serdema mîrektiyên kurdan de di hin berhemên wek Nehcul’l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî de, bi awayekî sînorkirî behsa adabên nimêjê hatiye kirin. Di çarçoveya agahiyên heyî de yekem menzûmeya fiqhê ya serbixwe di serdema Komarê de hatine nivîsîn ku ew jî Sefîna Kurdan a Mela Ebdulcelîlê Botî ye. (Tarîxa nivîsînê: 1951)”<sup>6</sup>

Di edebiyata kurdî a klasîk de xebatên bi vê rengê ku hatibin kirin gelek kê m in. Ji ber vê yekê me jî xwest ku em li ser fiqhnameyêke menzûm ku ji aliyê nivîskareke kurd ve û bi kurmancî hatiye nivîsîn, rawestin. Herwiha me hewl da ku em hem berhemê jî tîpên ‘erebî latînze bikin û hem jî ji aliyê teşe û naverokê binirxînin. Fiqihnameya menzûm a Heyderî<sup>7</sup>, fiqhnameyêke ku bi

2 Hayrullah Acar, Fiqihnameyêke Menzûm Di Edebiyata Kurdî De: Rîsaletu Sefînetu’l-Ekrahî Ila Sebîlî’r-Reşad/Sefîna Kurdan Ji Bo Ehlê Bajar û Gundan A Mela Ebdulcelîlê Botî, *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Nisan-2016 Cilt:8 Sayı:1 s.377

3 Adurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê- Di edebiyata kurdî ya klasîk de- Weş.* Nûbihar, İstanbul 2019. r. 340

4 Hayrettin Karaman, “Fıkıh” TDV İslam Ansiklopedisi, Cild.13, İstanbul, 1996. r. 1

5 Ali İhsan Akçay, “Manzum İlmihaller”, Türk-Üslam Edebiyatı El Kitabı, Edt. Ali Yılmaz, Weş. Grafiker, Ankara 2015. r. 270.

6 Hayrullah Acar, h.b.,r. 381.

7 Şêx Muhemmed Emînê Heyderî, di sala 1927an de li gundê Keleha Nisêbîna Mêrdînê jî dayik bûye. Kurê Ehmed el-Heyderî ye. Hêj di deh saliya xwe de diçe gundekî Qamişlo

kurt û kurmancî li ser agahiyên fiqhî yên wek teharete, desmêj û limêj hatiye nivîsîn. Di destpêka berhemê de piştî bismillahê ji Xwedê re hemd ji Pêxember (s.e.w.) re selat û selam û ji al û eshab û ‘emeldarên şer‘a wî re selam û di‘a tê kirin. Piştî 17 beşên cuda yên berhemê henin ku li ser fiqha Îslamê ango esasen wek teharete û desmêj û nimêjê ne. Di dawiya(tetimme) berhemê de jî behsa sebebê te‘lîfa berhemê tê kirin û herwiha bi di‘a û niyaz diqede. Me nixandina berhemê li gorî xebateke ku li ser ilmêhaleke menzûm<sup>8</sup> bû kir.

## 2. Navê Berhemê û Nusxeyên Wê

Navê berhemê li ser destxetê xuya nake; lê di çavkaniyek de navê berhemê wek Werd’ul-Etfal<sup>9</sup> derbas dibe. Muellif di beşa dawiya fiqhnameyê de ji bo berhema xwe peyva ‘risale’yê bikaraniye:

173 We la terhemna ecrehu li piştî wan selam din hûn  
Xitama vê **risalê** hat nekin mehrûm di‘a kin hûn

Berhem, ji rûpela 5an destpê dike. Çend rûpel jî ji nav berhemê kêman in. Ew rûpelana, rûpela 12.,13., 18. û 19an in. Herwiha destxeta li ber dest, ji 24 rûpelan pêk tê. Berhem bi bismillahê destpê dike. Em dizanin ku xeynî vê nusxeyê nusxeyeke tam jî heye ku di mecmu‘a nivîskar a bi navê *Tuhfetu’l-Hayderî*<sup>10</sup> de derbas dibe.

## 3. Muellifê Berhemê

Navê muellif Muhammed Emînê Heyderî ye ku ew di dawiya fiqhnameyê de mexlesa xwe wek “Heyderî” diyar kiriye:

---

û li cem Şêx Mehdî dest bi xwendina medresê dike. Piştî demekê diçe gundê Xezna li cem Şêx Ehmedê Xeznewî xwendina xwe diqedîne û ji Seydayê Mele Ebdurrezxaqê Helêlî îcazet werdigire. Li medreseyên Xeznewî, bi gelek alimên dewrê wek Şêx Ebdulhekîmê Huseynî, Şêx Maşûqê Norşînî, Şêx Huseynê Kinikî, Şêx Mele Muhammedê Erebkendî û Mele Ebdulcelîlê Omerî re xwendiyê. Li Medresa Xezna, ilmên wek serf, nehew, fiqh, hedîs, tefsîr, tecwîd, eqaid, kelam û mentiq qedandiyê. Xincê van ilman bi astronomî û erdnîariyê re jî mijûl bûye. Li gelek gundên Mêrdîn û Diyarbekirê xwendiyê û melatî kiriye. Li Diyarbekirê, 22ê Gulanê sala 2003an de wefat kiriye.

Berhemên Wî: 1. *Eqîda Îmanê*(kurmancî),2. *Mewlîdu’n-Nebî* (kurmancî),3. *Mewlîdu’n-Nebî* (erebî), 4. *Werdu’l-Etfal*(kurmancî), 5. *Diwana Heyderî* (kurmancî). Ji bo agahiyên zêdetir bnr. Halil Akçay, Son Dönem Tasavvuf Âlimlerinden Şeyh Muhammed Emin el-Heyderî (Hayatı ve Eserleri), *Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı’dan Günümüze Kürtler, Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013. r.392-404.

8 Zahir Süslü, “Ali Efendi’nin Manzûm İlmihâli”, *International Journal of Economics, Politics, Humanities & Social Sciences* Vol: 2 Issue: 3 Summer 2019. ss.165-183.

9 Halil Akçay, h.b., r.392-404.

10 Şeyh Muhammed Emin el-Hayderî, *Tuhfetu’l Hayderî*, Seyda Yay. Diyarbakır, 2019.

178 Li enba' û li wanê ku 'emeldar in bi şer'a wî  
Dikim hemdê Xudê ku Heyderî di dûv terîqa wî

Peyva terîqê jî ku di heman malike de ye, nîşaneyeke ku muellif ehlê terîqetê ye. Jixwe ew li cem Şêx Ehmedê Xeznewî, di terîqeta Neqşibendiyê de bûye.<sup>11</sup>

#### 4. Tarîxa Nivîsandina Berhemê û Sebebê Te'lîfa Wê

Tarîxa nivîsandina berhemê di destxetê de xuya nake; lê ji ber hin çavkaniyên berdest em têdigihêjin ku Heyderî, ev berhem di sala 1987an de nivîsiye. Werdu'l-Etfal tê mena "Gula Zarokan". Berhem ji bo zarok û ciwanan wek ilmêhaleke kurtik hatiye nivîsin.<sup>12</sup> Muellif, di beşa dawî a bi navê "Uzr Xwestina Ji Bo Temam Kirina Risalê" de wiha behsa sebebê te'lîfa fiqihnameyê dike:

175 Me ev çê kir ji bo zarwê nezan ê bûn hevalê min  
Ez û wezna xuh pir kêr in bikin rehmê li halê min

Muellif di vê malikê dibêje ku min vê berhemê ji bo zarokên cahil nivîsiye da ku ew perwerdeyê 'ilmê dînê xwe û şerî 'eta Îslamê bin û herwiha bi wan 'ilman 'emeldar bibin.

2 Şelat bîn ser Muhemmed hem li ser wan alê beyta wî  
Digel eŞhab û etba'ê 'emeldarên bi şer'a wî

3 Di piştî wan birayê min musulman wer tu guhdar be  
Bizane 'ilmê dînê xu bi şer'a wî 'emeldar be

Ji peyvên wek "'ilmê dînê" û "şer'a wî" em têdigihêjin ku berhemê behsa 'ilmê şerî'etê ango şerî 'eta Muhemmediye bike. Di peyva 'emeldarê de jî xuya ye ku muellif xwendevanan teşwîqê 'emelkirina şerî'etê dike. Jixwe pirtûkên fiqhê jî ji ber 'emelê hatine nivîsîn.

#### 5. Taybetmendiya Teşeyî a Berhemê:

Berhem ji 178 malikan pêk tê. Heyderî, menzûmeya xwe bi şiklê mesnewiyê û bi wezna erûzê, behra hezecê û qaliba " Mefailun/ Mefailun/ Mefailun/ Mefailun"ê nivîsiye. Di helbestan de ev wezn bi serkeftî hatiye tetbîqkirin.

4 Ez ê ewwel bikim behsa teharat ka çi ye yanî  
· \_ \_ \_ / · \_ \_ \_ / · \_ \_ \_ / · \_ \_ \_

11 Halil Akçay, h.b., r.395.

12 Halil Akçay, h.b., r.398-399.

Ku Peyxember digotî paqijî qismek ji îmanî

. \_ \_ \_ / . \_ \_ \_ / . \_ \_ \_ / . \_ \_ \_

## 6. Naveroka Berhemê

Berhem ji van sernavan pêk tê: Destpêk, Beḡsa Tehareta Bi Avê, Beḡsa Necaseta Biçûk û Mezin Navî, Beḡsa Zêr û Zîv û Hevrîşim, Beḡsa Xeyra Siwakê, Beḡsa Celdê Mirara Helal Dibî Bi Debaḡ, Beḡsa Tahirbûna Ji Mîz û Gû, Beḡsa Şurûtê Girtina Desmêjê, Beḡsa Sinnet û Adabê Desmêjê, Beḡsa Xûslê Sunnet, Beḡsa Şikestina Desmêjê, Beḡsa Teyemmum, Beḡsa Mesha Xufa, Beḡsa Sinnetê û Musteḡebb û Mendûb û Hey'etê Wî-Limêja Ferz-, Beḡsa Tefşîla Beḡalbûna Limêjê, Beḡsa Limêjê Herdu 'Îd û Xuḡbeyê Wan, Beḡsa Mewtê, 'Uzr Xwestina Ji Bo Temam Kirina Risalê. Dema em bi kurtasî li naveroka van sernavan dinhêrin:

**1-Destpêk (malikên 1-3.):** Ji Xwedê re hemd û ji Pêxember(s.e.w.) re selat û ji al û etba'ê wî re selam.

**2-Beḡsa Tehareta Bi Avê (malikên 4-14.):** Avên tê vexwarin, avên destmêj pê tê girtin û avên necis.

**3-Beḡsa Necaseta Biçûk û Mezin Navî (malikên 15-21.):** Necaseta biçûk û mezin çi ne û çawa tên paqij kirin.

**4-Beḡsa Zêr û Zîv û Hevrîşim ( malikên 22-28.):** Helal û herambûna bikaranîna zêr û zîv û hevrîşimê.

**5-Beḡsa Xeyra Siwakê(malikên 29-34.):** Miswak kîjan wextan de pir xêrtir e, behs dike.

**6-Beḡsa Celdê Mirara Helal Dibî Bi Debaḡ (malikên 35-36.):** Xeynî mirarê kûçik û berazan, çermê hemû heywanan ku bi debax kîrinê tahir dibe.

**7-Beḡsa Tahirbûna Ji Mîz û Gû (malikên 37-43.):** Behsa adaba paqijbûna ji destmêja mezin û biçûk dike.

**8-Beḡsa Şurûtê Girtina Desmêjê (malikên 44-47.):** Behsa 6 şertên desmêja limêjê dike.

**9-Beḡsa Sinnet û Adabê Desmêjê (malikên 48-56.):** Di vir de tê gotin ku ji 300dan zêdetir adabê desmêjê hene lê yê sunnet ku di fiqhê de nin hatine gotin. Ev behs dibe ku kêmbê. Lewra 2 rûpel jê kêmbê in û piştî vê mebhesê jî behsek heye ku derbarê girtina desmêja xûslê û ferzên xûslê de ye. Dîsa ji ber ku 2 rûpel kêmbê in, nayê zanîn ku ev mebhes ji ku û çawa destpê dike.

**10-Beḡsa Xûslê Sunnet (malikên 57-59.):** 12 heb xûslê ku sunnet e hatiye gotin.

**11-Beḡsa Şikestina Desmêjê (malikên 60-65.):** Bi kîjan awayan desmêj dişikê behs dike.

**12-Beḥsa Teyemmum (malikên 66-79.):** Behsa şertên desmêja teyemmumê tê kirin.

**13-Beḥsa Mesha Xufa (malikên 80-83.):** Ev beş behsa çawanîbûna xufikên piyan dike. Ji bo meshê divê xufik çawa bin.

**14-Ji vê beşê şunde 2 rûpel kêman in. Piştê behsek derbarê erkanê limêja ferz heye. Ev beş jî ji malika 84an heta malika 106an dewam dike.**

**15-Beḥsa Sinnetê û Musteḥebb û Mendûb û Hey'etê Wî-Limêja Ferz-(malikên 107-156.):** Behsa cureyên limêja sinnet û sinnetên di mêja ferz de tê kirin.

**16-Beḥsa Tefşîla Beḥalbûna Limêjê (malikên 157-162.):** Behsa çend tevgerên ku limêjê betal dike û çend tevgerên ku limêjê betal nake tê kirin.

**17-Beḥsa Limêjê Herdu 'Îd û Xuḫbeyê Wan (malikên 163-165.):** Behsa limêjên 'îdê çawa tê kirin û xutbeyên wan çî çax tê xwendin dike.

**18-Beḥsa Mewtê (malikên 166-173.):** Behsa şuştin û defna miriya dike û çawa limêja cinazeyan tê kirin îzeh dike.

**19-'Uzr Xwestina Ji Bo Temam Kirina Risalê ( malikên 174-178.):** Mebhesa dawî ye. Di vir de muellif bi tawazû kêmbûna xwe tîne ziman û behsa sebebê te'lîfa berhemê dike. Di herdu malikên dawî de jî li ser Pêxember (s.e.w) selawat dide û li kesên devdora wî di'a dike. Herî dawî jî ji ber ku bi xwe di rêya Xwedê de ye, hemdê Xwedê dike.

## 7. Ziman û Şewaza Berhemê

Berhem di tertîba şeweya mesnewiyan de hatiye nivîsîn. Bi bismileh û hemdele û salweleyê destpê dike û piştê bi sebeba te'lîf, di'a û xatimeyê diqede. Berhemên dinî her çiqas bi şeweyeke edebî jî hatibin nivîsîn; zimanê wan bi gelemperî zelal û fehimbare. Lewra di van berheman de mebest ji huner çêkirin û sen'etê bêhtir, agahdarî û hîndarî ye. Di vê berhemê de jî ev daraz derbasdar e. Muellif, muxatebên xwe -ku di berhemê de zêdetir zarok in- di derbarê hukmên şerî de agahdar dike û ji wan re behsa emelên şerî dike. Wexta xîtabê wan dike jî peyvên wek; birayê min, birayê min ê musulman, paşa, hevalê min û hwd. şewazeke xisûsî ji bo wan bikartîne:

Dema ku em li zimanê berhemê hur dibin, em dibînin ku berhem, ji sernavan heta naveroka helbestan, zêdetir bi peyvên Kurmancî hatiye honandin. Mebhesên şerî û termên Erebî dîsa bi peyvên Kurmancî hatine zelal kirin. Wek devok, zêdetir devoka Mêrdîne di zimanê berhemê de xuya dike. Em ê li jêr çend taybetmendiyên devokî nîşandin:

**Din-dî**

- 8 Bi avek **dî** ku pir bû ew geħa heddê qulleteyn  
Muxeyyer ger nebû ew av temîz û tahir e ‘eyn

**Dayne-deyne**

- 9 Çiqa ava ku hindik bî dibî kê m qulleteyn e  
Necaset ku ketê ew av necis bû ji xu dûr **deyne**

**Wan-wa**

- 13 Çi ava hindik û pur ya te‘am ruhnê wekî avê  
Ew ê bi xwîn we ya ne ji **wa** ye ew xwîn ku ketê navê

**Tiştêkî-tiştikî**

- 36 Heçî yê xinzîr û kuçik **tiştikî** wana helal nabin  
Benî âdem necis nabî kullî û masî heram nabin

**8. Encam**

Muellifê vê fiqhnameyê Şêx Muhemmed Emînê Heyderî ye. Berhem di sala 1987an de hatiye nivîsîn. Destxeta li ber dest ji 24 rûpelan pêk tê û 4 rûpel jî jê kê m in. Derbarê nivîsandina nusxeya li ber dest de agahî nehate dîtin. Ev nusxe bi tesdufi hatiye dîtin. Berhem menzûm e û ji 178 malikan pêktê. Teşaya wê ya nezmê mesnewî ye û bi wezna erûzê, behra hezêcê û qaliba “ Mefailun/ Mefailun/ Mefailun/ Mefailun”ê hatiye nivîsîn.

Berhem dîdaktîk e. Muellif berhemê ji bo zarokên cahil bi mebesta perwerdeya ‘ilme Îslamê û ‘emelkirina şerî‘etê nivîsiye. Berhem bi gelemperî mijarên fiqhî yê n wek teħaret, desmêj û nimêjê dihewîne. Zimanê berhemê bi Kurmanciyê zelal û fehîmbar hatiye nivîsîn.

Me di latîniye kirina vê berhemê de alfabe ya transkrîpsiyonê a navneteweyî bi kar anî.

Tip	Deng
ء	’
ث	ṣ
ح	ħ
خ	x
ذ	ẓ
ص	ş
ض	ḍ
ط	ṭ
ظ	ẓ
ع	‘
غ	ğ

## 9. Transkrîba Metnê

- Bismillahirreḥmanirreḥim  
Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun Mefaîlun
- 1 Bi hemdillah me dî himmet ji kirna medḥ û zikrê Wî  
Gelek zêde dibin ni'met ji dana wesf û şukrê Wî
  - 2 Şelat bîn ser Muḥemmed hem li ser wan alê beyta wî  
Digel eŞhab û etba'ê 'emeldarên bi şer'a wî
  - 3 Di piştî wan birayê min musulman wer tu guhdar be  
Bizane 'ilmê dînê xu bi şer'a wî 'emeldar be

### BEḤŞA ṬEHARETA BI AVÊ

- 4 Ez ê ewwel bikim beḥşa ṭeharet ka çî ye yanê  
Ku Peyxember digotî paqijî qismak ji îmanê
- 5 Ku avek muṭleq û Şafî qe tevlê wî nebû tiştêk  
Ji wanî jî xenî ew aw muṭehher ṭahir e bê şek
- 6 Eger tiştêkî ṭahir ketye wê avê muḫeyyer kir  
Ji desmêj kirtina ferz ketye wê avê muste'mel kir
- 7 Ku ew av tê vexwarin lê qe desmêjî bi wî nabî  
Ḥelal e ew belê tiştê necis qet pê ḥelal nabî
- 8 Bi avek dî ku pir bû ew geḥa ḥeddê qulleteyn  
Muḫeyyer ger nebû ew av temîz û ṭahir e 'eyn
- 9 Çîqa ava ku hindik bî dibî kê m qulleteyn e  
Necaset ku ketê ew av necis bû ji xu dûr deyne
- 10 Tu zanî ku te'am xwarina ruḥne çîqa pir bê  
Necaset ku ketê tev de necis bû ew bi yek derbê
- 11 Belê ava qulleteynê ku necaset ketê xem nakî  
Ku te'm û reng û bêhna pîs ji wî avê eger nakî
- 12 Ku ava qulleteynê ber milekî duwazdeh tenke bî  
Bi texmînî du Şed û ḥeft ew her kîlo bi hev re bî

- 13 Çi ava hindik û pur ya te'am ruhne wekî avê  
Ew ê bi xwîn we ya ne ji wa ye ew xwîn ku ketê navê
- 14 Wekî kêçan û mêşan kêzikan texyîr nekin yanê  
Zerer nakî di av û xwarinê de wer 'efûdanê

### BEHSA NECASETA BIÇÛK Ê MEZIN NAVÎ

- 15 Tu zanî ku necaset jî li ser sê qism û şekla ye  
Ewwel mîza wan tîflê bişîr gihê du sala ye
- 16 Ew ê lawa hinek av lê bireşîne be ser jêr e  
Ew ê mîza tu avê lêk û bigvêş e wuha xeyr e
- 17 Hêram kûçik û xinzîr e heft ava tu yê lê kî  
Ji wan hefta yekî jî axekî tahîr tu tev lê kî
- 18 Necis bûna ji xeyrî wan ku bê reng e tu pey'd berde  
Bi yek av bişo sê carî bûye sinnet diha rind e
- 19 Necisbûna bi te'm û reng û bêhna wî ev e çara  
Divê avê tu lê kî qenc bişo bigvîşne çend cara
- 20 Heta te'm û reng û bêhn herî av tu pêda kî  
Bihekîne ku te'm û bêhn herî rengê wî xem nakî
- 21 Eger rengê wî jê naçî bişuştin û hekkandinê  
Ku tahîr bû bes e jê re<sup>13</sup> ne mecbûrî qetandinê

### BEHSA ZÊR Ê ZÎV Ê HEVRÎŞIM

- 22 Ew ê şer'ê hêram kirye tu isti'mal neke qeş wan  
Feraxê zêr û zîv in lê helal in ê ji xeyrê wan
- 23 Hêram e zêr û zîv bigrî ji bona zînet û neqşê  
Wekî zincîr û qutiya taxim mala ji bo rewşê
- 24 Ji mêran re hêram e lubs û hevrîşim we ya pir bî  
Ji bo raxistin û zînet û isti'mala hindir bî

13 Ev daçek di vê nusxeyê de hin caran wek re; hin caran jî wek ra hatiye nivîsîn.

- 25 Heram e tev ji mêran re ku bistînin ji libsê ra  
Belê gustîlekê zîv sinnet e ji tilliya di rastê ra
- 26 Ji xeyrê heybeta herbê we ya ‘uzra wî çêbû ye  
Wekî jê ra dibî derman di wî weqtî helal bû ye
- 27 Helal e ji pîreka re zêr û zîv bo xu bikin zînet  
Çi isti‘mal bikin ya ne ji bo lubsê kirin niyet
- 28 Helal e ji pîreka re lubsê hevrîşm wekî zêra  
Ne raxistin belê qîlek helal kirye firaş jêra

### **BEHŞA XEYRA SIWAKÊ**

- 29 Di her halê de siwak sinnet û xeyrekî mewcûh e  
Ji xeyrê yê bi rojî bî ji nivro pê ve mekrûh e
- 30 Di sê weqta de xeyra wê heye zêde li fikrê bî  
Ku wexma dev ji bêhna tiştê wek pîvaz û sîrê bî
- 31 Tu yê weqtî ji xew rabî di dev werdî siwaka xu  
Ev a dîtir ku pur xeyr e wekî rabî li mêja xu
- 32 Serê her karî xeyr e sinnet e siwak di dev werdî  
Tu bê siwak nemînî tê rehet kî pê hemî derdî
- 33 Di ders û xwendina Qur’an û desmêj gotinê xeyra  
Di weqtê sekeratê de rehet tê der rihê meyra
- 34 Ji alê rastê des pê ke tu sê cara bibe bîne  
Ji jora dev bi hêdî ser zimanê xu biderxîne

### **BEHŞA CELDÊ MIRARA HELAL DIBÎ BI DEBAË**

- 35 Ji heywanê mirarbûyî ji xeyrê kuçik û xinzîr  
Ku cildê wan dibin tahir bi debaë ev e tedbîr
- 36 Heçî yê xinzîr û kuçik tiştikî wana helal nabin  
Benî âdem necis nabî kullî û masî heram nabin

**BEHŞA TAHIRBÛNA JI MÎZ Û GÛ**

- 37 Temîzbûna ji mîz û gû li ser me wacib e paşa  
Bi avê ya bi kevira ku bi her duwa bî diha baş a
- 38 Tu yê lingê çepê bavê ciyê xwestî tu lê rûnê  
Piyê rastê berî bavê berê te ku ketî çûnê
- 39 Berê xu qet nede qiblê ne piştta xu li destavê  
Ber û piştê nede rojê nede hîvê di wî gavê
- 40 Ziwa ke xu ji mîzê ta ji neqtê wê tu paqij bî  
Tu hêlqa duburê sist ke bişo hêtta ku tahir bî
- 41 Di ava hewz û golê sekinî da mîz neke heyra  
Li bin darê bi fikî qullukê erdê qamkê meyra
- 42 Tu rûnê bêje Bismillah bi te hîfz dikim ya Rebb  
Ji şeytan û cinnan ê nêr û mê wanê xebîş ya Rebb
- 43 Li rabûnê bibî xüfraneke'l-lahumme el-hemdu  
Ke lillah izheb 'ennî'l-eza we 'afanî li du

**BEHŞA ŞURÛTÊ GIRTINA DESMÊJÊ**

- 44 Hene şeş şertê desmêjê ewwel niyyet tu yê bêjî  
Me niyyet kir hêlal kim ez li ser xu kirna limêjê
- 45 Ewa dî şuştina wech e bike qesd û niyyet pê ra  
Ewa sisêya bişo desta heta bê ser enîşkê ra
- 46 Eva çara bike meşha serê xu lê di heddê ser  
Eva pêncê bişo linga heta gûyzik bikevne ber
- 47 Belê şertê şeşa tertîb bûye wacib di nava wan  
Ku wech û dest û meşha ser bişo linga tu zanî van

**BEHŞA SINNET Û ADABÊ DESMÊJÊ**

- 48 Pir in adabê desmêjê hetanî sêşedê zêde  
Ew ê sinnet ji me'r lazim beyan kirne di fiqhê de<sup>14</sup>

14 Ev daçek di vê nusxeyê de hin caran wek de; hin caran jî wek da hatiye nivîsîn.

- 49 Ji nava wan ez ê bêjim ew ê meşhûr bi 'ewni'l-lah  
Ku siwak û te'wîz û bismillah û hemdillah e
- 50 Bilind rûn ber bi qiblê de ne hişk bî ew ciyê ber te  
Ciyê av lê kevî nerm bî ji bo peşk ji neyê ser te
- 51 Berî e'zayê desmêjê bişo destê xu paqij ke  
Dev û pozê xu sê cara tu tê werd bêvilê fiş ke
- 52 Meshê ke tu tamamê ser ji pêş ve dest bibe paş ve  
.....<sup>15</sup>
- 53 .....<sup>16</sup>  
Temam bedena xu tu bişoyî bi avekî tahir
- 54 Bişo ewwel bi niyyet sew'etê xu yê li pêş û paş  
Mukemmel bigre desmêjê berê xeslê ew e ya baş
- 55 Bi ser xu'd berde hin avê bo yê qenc xu bifirkîne  
Tu rast û çep bi xu'd berde bi xuslê niyyetê bîne
- 56 Me niyyet kir ji ser xu ez hilînim vê cenabetê  
We ya ferza li mêja xu helal kim ez bi niyyetê

### **BEHSA XUSLÊ SUNNET**

- 57 Pir in xuslê sunnet yek jê ku xusulkî ji îne ra  
Yekê bimirî ew ê ku wî bişoyi sunnet e jê ra
- 58 Ji herdu 'id û baranê ku hîv û roj xera bû ye  
Yekê kafir musulman bî yekê dîn e rehet bû ye
- 59 Ji ihram û tawaf û se'y û çûna der Medîne ra  
Ji çûna Mekke ê recm û mebîta Muzdelifê ra

### **BEHSA ŞIKESTINA DESMÊJÊ**

- 60 Ew ê desmêjê dişkîne tu guh bidê çî û kî ne  
Çî tiştê ku ji pêş û paş derê desmêjê dişkîne

15 Ev beşên destxetê kêm bûn.

16 Ev beşên destxetê kêm bûn.

- 61 Ne ça mêmî ketî xew ya bi serxoş çû hişê wana  
Ew ê dîn ya bi dil iş ket hişê wan hat serê wana
- 62 Bi hindarî kef û tilya li pêş û paş ketî ya qenc  
Giha ‘ewretê insana ev e messa zêker û ferc
- 63 Ku mêm û jin ne meħrem bin ji hev ra cenbê herdu  
Ji hev desmêj ketin herdu ku cildê rût giħan hevdu
- 64 Çi mêm û jin giħan sal şeş ħeta hefta bes e jê ra  
Ku tazî ew giħan hevdu ev e lemsa jin û mêm
- 65 Ku bê perde giħan hevdû ew ê desmêjê bişkîne  
Ku biħê por û neynûka diran heştî qe naşkîne

### **BEĤSA TEYEMMUM**

- 66 Ku yek çû seferê av nîn e bû muħtacê desmêjê  
Ew ê çawa teyemmum bigrî wê çawa bikî limêjê
- 67 Li dora xu bike teftîş ji hevalê xu bike pirsê  
Ku hêvya te nema ji avê teyemmum bigre bê ħirsê
- 68 Li ser e‘zayê desmêjê cebîr e ger girêdaye  
Mesîħ ke ser cebîra xu bişo î Şaxlem ê maye
- 69 Teyemmum bigre bê ‘ewde limêj ke ger te ê Şaxlem  
Ne zêde ħacetî da ber cebîrî tu limêj ke tu bê ħem
- 70 Eger zêde ketî berde limêj ke lê bike ‘ewde  
Qeza ke ger te bê desmêj cebîre daye ser gewde
- 71 Ji yek ferz tu zêde yek teyemmumkî limêj nakî  
Çiqa sunnet limêj kî yek teyemmum jê re ħem nakî
- 72 Te av dît hê ne ketye nav limêja xu beħale ew  
Limêj kir du re av dît hem seħîħ e hem kemal e ew
- 73 Te av dî tu di‘l mêmê de dixwazî quħ neke‘lmêmê  
Dixwazî quħ bike hê nû bi avê bigre desmêjê

- 74 Ji tîrsê ya ji ber êş ê nikarî bigrî desmêjê  
Teyemmum bigre xem nakî tuyê ‘ewde bikî’lmêjê
- 75 Divê axek xubarî ya ciyê toza temîz rabî  
Bi ard û gils û qûm û hem nikar û me‘denê nabî
- 76 Li axê xe tu yek derbê mesîh ke pê tu wechê xuh  
Bi derbek dî mesîh ke herdu desta tev enîşkê xuh
- 77 Ew ê desmêjê dişkînê teyemmum tê şikandin jê  
Bi hin tîştê teyemmum tê şikandin xeyrê desmêjê
- 78 Ji ber ‘uzrê teyemmum girt rihet bû ew ji ‘uzra xuh  
Bi destê wî ketî av hê ne ket bû nav limêja xuh
- 79 Bi dev kir gotinê kufrê beçal bû ew teyemmum ger  
Bi istiḫfar vegerya ew divê bigrê teyemmum her

### BEḤŞA MESḤA XUFA

- 80 Dixwazî tu bikî meḤsha li ser xufa bike fikrî  
Divê xufa bikî linga heta ser gûzeka bigrî
- 81 Divê hîç av nekşînê xuh<sup>17</sup> ew xufek qewîn û baş bî  
Ne naylon û ne çerm û qûne gore paç û qelaş bî
- 82 Ne qulqulkî ne hûn dibê teng û çend qaṭî çênabî  
Bi îş û kar û barê xuh herî ew bê ne rizya bî
- 83 Tu karî wergirî xufê bi va şertê ku bên gotin  
.....<sup>18</sup>
- 84 Li heft sala ji eṭfalê xuh ra bêje limêj ke lê  
Li deh sala nekî limêjê lēxînî bihêdî lê
- 85 Li pazdeh ger nekî limêjê tu berde wî ji mala xuh  
Tu pê ra qeṭ nekî Şulhê ji bo nakî limêja xuh

17 Peyva xu hin ciyan wek “xuh” hatiye nivîsîn.

18 Ev rêzik di destxetê de tune bû.

- 86 Ji bo kirna limêja ferz hene çend ferz berê wî ne  
Di weqtê de divê limêj kî li qiblê bî berê wî ne
- 87 Libas û bedena wî hem ciyê limêjkî ku tahir bî  
Ji kabûkê heta navê libasê pir esatir bî
- 88 Divê jin nuxumandî bin ji xeyrê dest û wechê wan  
Ji por û bedenê tiştek xuya bî nabî limêjê wan
- 89 Heçî limêj î tu destpêkê li ser va hijde rukna ye  
Ewwel kirna ew ê limêja niyet jê ra girêdaye
- 90 Di dûv tekbîra îhramê gerek Ellahu Ekber bê  
Bike niyet bi qelbê xuh bi tekbîrê re hember bê
- 91 Eger karî se pê limêj ke ew e ruknê sisêya ye  
Eger na ew çawa karî çi rûniştî çi palda ye
- 92 Bixwîne fatihe hetta wele'ð-dallîn eva çara  
Eva pêncê rikû' e rast xuh deyne tu wekî kara
- 93 Di wê de wacib e seknê belê sunnet e hem kara  
Bi subhane rebbiye'l-'ezîm bî hemdîhî tu sê cara
- 94 We ya dî i'tidal e tu sepê rabe bike seknê  
Heta rasta guha destê xuh hilkive eya husnê
- 95 Semî'ellahu li men hemd rebbena leke'l-hermd  
Bi wê fikrê tu dunya ê bide paş xuh eya 'ebd
- 96 Here secdê du cara ew ji rukn e hem bike seknê  
Di nava wan de rûne wacib e seknê bikî beynê
- 97 Enî tazî bide 'erdê ku bêfil sunnet e pê ra  
Divê talî bilindtir bî ji piştê ew sitûyê mêra
- 98 Enîşk û destê xu hilgîv veke desta di secdê da  
Piyê xu herdu rake serê tiliya bi qiblê da

- 99 Heçî pîrek ne wek mêra ne weqtê ew herin secdê  
Ku bejnê xuh bidin rehna enîşka deynê ser 'erdê
- 100 Di secdê de bûye sinnet ji sê cara heta dehî  
Bibê subhane rebbîye'l-e'la digel bi hemdihî
- 101 Di nava herdu secda de tu rûniştî ev a wî ye  
Bi rebbî'xfîrlî we'rhemnî we 'afanî de'a wî ye
- 102 Ji rukna ettehiyyatu bixwîne hem tu pê de tê  
'Ibadillahi's-salihîne hem digel şehadetê
- 103 Şehadet bêje eşhedu enla ilahe illellah  
Digel wa eşhedu enne Muħemmede'r-resullullah
- 104 Selatu ser Muħemmed hem li alê wî ji rukna ye  
Selama ser milê rastê ji ruknê her limêjê ye
- 105 Evan sê ruknê talî tu bixwîne wan ku rûniştî  
Xudê çêtir dizanî pê ji her kesî hemî tiştî
- 106 Limêja ku bi cema'etê selam weh li ser hev bin  
Digel qeşda melaîket û ins û cinn û mu'min bin

### **BEHŞA SINNETÊ Û MUSTEHEBB Û MENDÛB Û HEY'ETÊ WÎ -LIMÊJA FERZ-**

- 107 Tu zanî ku me erkanê limêja ferz hemî gotin  
Heçî sinnet û mendub hey'etê wê pênsed û noç in
- 108 Hina ji wan sinnetê laîq ez ê bêjim ew ê zanim  
Ew ê meşhûr di mezheb da ew in ê ku ji me'r lazim
- 109 Ji her weqtê limêja ra mu'ekked sunnet e azan  
Di roja cum'ê berya xuþbê azan sunnet e ey can
- 110 Cema'et ku li cîkî çêbû azan sunnet e pê ra  
Cema'et ya bi tenê limêj kî îqame sunnet e jê ra
- 111 Ku azan da wekî wê bêj kelîmatê di azana  
Ji xeyrê hewqeleya tu nebêji vê wekî wana

- 112 Ji ber ve bêje la hewle wela quwwete bidîla wî  
Di teşwîba Şîbehê da tu bêje vê hedîşa wî
- 113 Sedeqa bi Resulullahi fi ma qal bêje hey  
Sedeqte we berirte bê we bi'l-heqqî neqepte ey
- 114 Xudê te ji bo sucûda xu diye laîq bike şukrê  
Ne xafil be di wê lehze ji wê pê ve neke fikrê
- 115 Li me'na xundin û kirna limêja xuh tu hişyar be  
Bi nişatê hîzura dil li erkâna tu guhdar be
- 116 Tu qewdê xu nehejîne ne ser deyne ne hilgive  
Tu ça'vê xuh nede cîkî ji ciyê mescidê xuh pê ve
- 117 Tu gavê xuh ji hev dur bik ne pir nêzik di hev de bî  
Nekî çarde santêma ne zêde'j bîst û heşta bî
- 118 Berê limêjê siwake lê li dûv tekbîrê wecehtû  
Li dûv elhemdê amîn lê hinek Qur'an bixwîne tu
- 119 E'uzu piştî wecehtu li pêşya besmele bêjî  
Eger ewwel e'uzu got tu wecehtu qe nabêjî
- 120 Me gotin ê riku' û i'tidal û secdê tesbîh in  
Li dûv kema Şelleyte pir di'a meqbûl û tercih in
- 121 Tehiyyata selam tê de turek sunnet e ji bo nê  
Piyê çep deyne bin rastê li ser alê çep rûnê
- 122 Ew ê sê rek'et û çar in tehiyyata ewwel sunnet  
Piyê rastê rake çep deyne li ser rûne ew e hey'et
- 123 Heta bighê Şelatê ser Muhammed bêje bes rabe  
Tu destê xuh heta guha rake ji adab e
- 124 Eger ku te jibîra kir tehiyyat rabûyî banê  
Ji ber ve her sicûda sehwe li berya selam danê

- 125 Selama ser milê çep sunnet e xitma limêja ye  
Li dûv limêja xuh bê tesbîh nehêle pir ku hêja ye
- 126 Bi elhemd ayetu'l-kursî şehidellahu amenerr  
Li dûv qulhu e'uzu ya sih û sê car tu bîne ser
- 127 Bi tesbîhan bi hemd Ellahu Ekber sih û çar in 'ed  
Eger tu la şerîke leh dizanî pê tamam ke Şed
- 128 Du'a ke lê ne xafil be ji Xudê xeyrê bixwaze tu  
Bi el hemdu Şelata ewwel û axir bibêje tu
- 129 Li dûv wan bêje la ilahe illellah deh car hem  
Şelata ser Muhemmed bid li al û enbiya bê xem
- 130 Bi ferzân re hene sunnet dibêjin sunnetê ratib  
Mu'ekked hin ji wan xeyrê muekked lê eya talib
- 131 Ji wana çar berê nîvro di dûv re çar rewabit in  
Berê 'esrê ne çar rek'et li dûv mexrib du rek'et in
- 132 Dido piştî 'îşa ne lê berî witra tu wan bîne  
Berê subhê du rek'et li pêş û paş zerer nîne
- 133 Li ser hev hijde rek'et in ji wan deh ê mu'ekked in  
Ema heşt ratibê dî sinnet in lê ne mu'ebbed in
- 134 Mu'ekked ê Muhemmed hem fikir hem Wî fikir emr e  
Ew ê xeyrê mu'ekked geh fikir geh ne digo xeyr e
- 135 Limêja ferz cema'et tê de sunnetek mu'ekked e  
Ku mumkun bî limêja bi cema'et qeş tu bernede
- 136 Muhemmed emrê me kirye bi cema'etê li ser maye  
Digo limêja bi cema'etê yeka wê bi bîst û hefta ye
- 137 Bikî qesda cema'etê Xudê hisab dikî jê ra  
Bi tekbîra îmam ra niyetê bînî diha xeyr a

- 138 Heçî sunnet du qism in hin cema'et tê de sunnet in  
Ji hinka re ne sunnet e welew hin jê mu'ekked in
- 139 Evan ê cema'et tê de sunnet in ev in ewwel  
Limêja herdu 'îda ye li dûv wan hîv û roj efşel
- 140 Li dûv baran wîtir in ê terawîha li dûv ratib  
Ji ber ku ev mu'ekked in mezahib tê de bûn raşib
- 141 Xu bê ratib nehêle ê mu'ekked hê bike mecbûr  
Tu sê rik'et ji wîtra bik berî razê ew in meşhûr
- 142 Di nava mexrib û weqtê 'îşa limêjê ewabîn in  
Dido ya çar û ya şeş lê heta bîsta hedîş tînin
- 143 Ku bîst rek'et terawîh pişt 'îşa hîva remezanê  
Li dûv pazda di wîtra de qunut sunnet e ey canê
- 144 Limêja ku cema'et tê de sunnet in tu wan zanê  
Wekî wîtrê remezanê limêja 'eyd û baranê
- 145 Limêja ne bi cema'et mutleq in hin jê muweqqet in  
Wekî ratib dûha desmêj tewaf û hem tehiyyet in
- 146 Şelata tesbîh bi rojî bin bi çar rek'eta bi hev ra  
Eger tu bişev bikî limêja dirêj dido dido pev ra
- 147 Şelata tesbîh di her rek'etekî heftê û pênc tesbîh  
Di heftê ya mehê carek di salê de bike teshîh
- 148 Di piştî niyyetê pazdeh di piştî fatîhehê deh in  
Ruku' û i'tidalê de di secdê de deh e deh in
- 149 Bira limêja duha sunnetkî xeyr e tu guh lê kî  
Ji piştî roj hilat heta berî weqtê ku nîvro bî
- 150 Tu dido bik ne xafilî tu çara bik tu muhsin î  
Ji duwazda zêdetir nabî tu xuh mehrûm neke jihnî

- 151 Bişev rabe bi sê witrê êvarê ra bike pazdeh  
Bira ew axirê limêjê şevê bin ey bira zade
- 152 Limêj mekrûh e ser tazî bi keb û ser tewandinê  
Li ser zibl û li nav qebra sikanê çûn û hatinê
- 153 Neke te'xîr limêja xu ku weqt hatî bike ewwel  
Di te'xîra 'işaê da hina gotî ew e efdeh
- 154 Dikî limêjê di dilda ku ez ê ibtal bikim ger yek  
Herî pan bî betal e ew limêja wî neha bê şek
- 155 Xewa piştî ketî weqtê berya limêjê neke heyra  
'İşa pê ve nekev lehwê ji xeyrê Şuḥbeta xeyra
- 156 Xewa puştê Şibê daîm dibî tengî ji rizqa ra  
Xewa puştê 'eŞrê nîne bereket qet ji 'umra ra

### **BEḤSA TEFŞÎLA BEṬALBÛNA LIMÊJÊ**

- 157 Bi yek derba ji hiç avêt we ya gavek mezin bavê  
Çi belxem bî çi xwarin bî ji dev qurpand û xwîn-avê
- 158 Bi desta ya bi linga sê neqil çê bû li nêzî hev  
Ruh bê çû ew bi yek neqlê limêja wî beṭale tev
- 159 Eger herfek dido derket ji dev bê me'ne xem nakî  
Kuxuk zorda bi ih ihê pê nikarî ew zêrer nakî
- 160 Ji sehwe ya nizanê derkirin gotin xera nabî  
Eger herfek bi me'ne got wekî ew limêj nabî
- 161 Di Qur'anê de çardeh ciyê ku ayatê sicûdê ne  
Ku hat xwendin sicûdek sunnetê wî xwendina wî ne
- 162 Ku ni'met hat bela çêbû ku hat mizginikî xeyrê  
Bike hemdê Xudê lê sunnet e yek secdeya şukrê

### **BEḤSA LIMÊJÊ HERDU 'ÎD Û XUṬBEYÊ WAN**

- 163 Limêjê herdu 'îda sunnet in ema mu'ekked in  
Ji bejneke roj hilat heta berî nivro muḥeded in

- 164 Di her yek ‘îdê du xutbe du rek‘et sunnetê wana  
Limêja ‘îdê ewwel bik bixwîn paşê du xutbana
- 165 Di ya ewwel berî fatihe tu heft cara bide tekbîr  
Ewa dî pênc e ya xutbê neh û heft in ev e tedbir

### **BEHSA MEWTÊ**

- 166 Ji ê nêzikê bîmrê bêje la ilahe illellah  
Kesê wî weqtê bêjî cennetî ye ew bi ‘ewni’l-lah
- 167 Ku mir çava bidin hev ber bi qiblê da berê wî her  
Bilez kin şuştinê sê kefenê tahîr ku bigernê ser
- 168 Ji bêhna xoş bidin ser kefen û ser bedena wîna  
Limêj piştî kefen kîrnê berî defnandîna wîna
- 169 Hinek pembû bidin ser ‘ewret û qullikê pê ra  
Limêj ser li ku bî caîz e mescid deha xêr e
- 170 Dîkim çar tekbîra ferzu kifaye lê bi niyyetê  
Limêj kim ez li ser vê meyyitê ya ser vê meytetê
- 171 Ewwel tekbîra îhram bixwîne fatihe dûv ra  
Li dûv didoya Şelat ser Muħemmed alê wî pê ra
- 172 Li dûv sisêya bê Ellahu’meħfir lehu werħemhu  
Li dûv çara bê Ellahumme la teftîna be‘dehu
- 173 We la terħemna ecrehu li piştî wan selam din hûn  
Xîtama vê risalê hat nekin meħrûm di‘a kin hûn

### **‘UZR XWESTINA JI BO TEMAM KIRINA RISALÊ**

- 174 Bîrayê min xeta ê min pîr in der van meqalê min  
Nekin lewmê bikin ‘efwê li vê wezna zîmanê min
- 175 Me ev çê kir ji bo zarwê nezan ê bûn hevalê min  
Ez û wezna xuh pîr kêmin bikin reħmê li ħalê min
- 176 Bî qasê neqte baranê dewama erd û ezmana  
Bî qasê me‘na Qur‘anê dewama cînn û insana

177 Şelat bîn ser Muhemmed hem li al û sehb û eþhara  
Li ezvac û li ewlad û li eþbab û li enŞara


178 Li enba' û li wanê ku 'emeldar in bi şer'a wî  
Dikim hemdê Xudê ku Heyderî di dûv terîqa wî

-temme-

### Çavkanî

- ACAR, Hayrullah, "Fîqhnameyeke Menzûm Di Edebiyata Kurdî De: Rîsaletu Sefînetu'l-Ekrah İla Sebîlî'r-Reşad/Sefîna Kurdan Ji Bo Ehlê Bajar û Gundan A Mela Ebdulcelîlê Botî", *e-Şarkiyat İlmî Araştırmalar Dergisi*, Nisan-2016 Cilt:8 Sayı:1 s.377
- ADAK, Adurrahman, *Teşeyên Nezmê- Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de- Weş. Nûbihar*, İstanbul 2019. r. 340
- AKÇAY, Ali İhsan, "Manzum İlmihaller", *Türk-Üslam Edebiyatı El Kitabı*, Edt. Ali Yılmaz, Weş. Grafiker, Ankara 2015. r. 270.
- AKÇAY, Halil, "Son Dönem Tasavvuf Âlimlerinden Şeyh Muhammed Emin el-Heyderî (Hayatı ve Eserleri)", *Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler, Uluslararası Sempozyumu*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, Bingöl 2013. r.392-404.
- EL-HAYDERÎ, Şeyh Muhammed Emin, *Tuhfetü'l Hayderî*, Seyda Yay. Diyarbakır, 2019.
- KARAMAN, Hayrettin "Fıkıh" TDV İslam Ansiklopedisi, Cild.13, İstanbul, 1996. r. 1-14.
- SÜSLÜ, Zahir, "Ali Efendi'nin Manzûm İlmihâli", *International Journal of Economics, Politics, Humanities & Social Sciences* Vol: 2 Issue: 3 Summer 2019. ss.165-183.

## Pêvek



Rûpela ewil a berhemê

بِقَاسِي نَقَطِ بَارَانِي دُوا مَا اَرْضُ وَا زَمَانَا  
 بِقَاسِي مَعْنَى قُرْآنِي دُوا مَا جِنُّ وَا إِنْسَانَا  
 صَلَاةَ بَيْنِ سِرِّ مُحَمَّدٍ هَمَّ لَالٍ وَصَبْحُ وَا ظَهَارَا  
 لِأَزْوَاجٍ وَا لِأَوْلَادِهِ وَا لِأَحْبَابِهِ وَا لِأَنْصَارَا  
 لِأَنْبِيَاءٍ وَا لِوَالِدَيْهِ كَمَا مَلَأَ رَيْنَ نَسْرَمَا وَا  
 رَكْمَ مُحَمَّدِي خُدْرِي كَمَا حَبَّرَ زِدْقَ طَبَقَا وَا  
 سَمْت

**ZAZAKİ DI BESTOĞI SADEYİ**

Ayetullah KARABEYSER İsmail SÖYLEMEZ

شیعر و رۆژنامه گهڕیی، به نمونهی شیعره کانی (هینمن موکریانى ۱۹۸۶ - ۱۹۲۱ ز):  
بارزان کانی طاهر

**HETÊ ŞIKIL, MUHTEWA U HUNERANÊ EDEBİYAN RA  
TEHLİLÊ MEWLİDİ NEBİ Ê MALA ABDULQADİRÊ MUŞEKİ**

Mehmet ARSLAN

**METN û DANASÎNA FİQHNAMEYA HEYDERÎ**

Muhammed İkbâl DENİZ